



**K. T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANS A BİLİND**

**DÎ HELBESTÊN HÊMÎN MUKİR YANÎ  
DE CÎVAKNASÎ**

**Hardi Hassan Mawlood AL- BAJALAN**

**WAN - 2017**

**K. T.**  
**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANS A BILIND**

**DÎ HELBESTÊN HÊMIN MUKIRYANÎ**  
**DE CÎVAKNASÎ**

**Amadekar**

**Hardi Hassan Mawlood AL- BAJALAN**

**Şewirmend**

**Doç. Dr. Kemal EROL**

**WAN - 2017**

**T.C**  
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**HÊMİN MUKRİYAN'NİN ŞİİRLERİNDE**  
**SOSYOLOJİ**

**HAZIRLAYAN**

**Hardi Hassan Mawlood AL- BAJALAN**

**DANIŞMAN**

**Doç. Dr. Kemal EROL**

**VAN – 20171**



T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

**Doç. Dr. Kemal EROL** danışmanlığında, Hardi Hasan Mawlood Al-BAJALAN tarafından hazırlanan “**Di Helbestên Mêmin Mukriyanî de Civaknasî**” adlı bu çalışma, **09/05/2017** tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Kemal EROL**

**ÜYE** : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

**ÜYE** : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ

**ÜYE** : .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....  
İmza: .....  
İmza: .....  
İmza: .....  
İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMREL  
Enstitü Müdürü

# NAVEROK

## Table of Contents

NAVEROK.....	I
KURTEK .....	V
ÖZET .....	VI
ABSTRACT .....	VII

### 1 BEŞA YEKEM:

#### TEORIYA CIVAKNASÎ

1.1 CIVAKNASÎ: .....	1
1.2 YEK JI PÊNASEYÊN VÊ FIKRÊ WIHA YE: .....	2
1.3 CORÊN CIVAKNASIYÊ: .....	4
1.3.1 Civaknasiya Erênî (Îcabî): .....	4
1.3.2 Civaknasiya Ravekarî: .....	5
1.3.3 Civaknasiya Rexnegirane: .....	6
1.3.4 Civaknasiya Post Modern: .....	7

### 2 BEŞA DUYEM:

#### PEYWENDIYA WÊJE Û CIVAK

2.1 PEYWENDIYÊN HELBESTVAN Û CIVAKÊ .....	9
2.2 JIYANA HÊMIN.....	10
2.3 HELBESTA NÎŞTÎMANÎ-SIYASÎ .....	13

### 3 BEŞA SIYEM

#### NAVEROKA HELBESTÊN HÊMIN

3.1 HÊMIN Û JIN .....	55
3.2 STATÎSTÎKA HELBESTÊN HÊMIN .....	56

3.3	AŞTÎXWAZÎ.....	65
3.3.1	<i>Dengvedana Ramana Netewî Kurdayetiyê di Helbestên Hêmin de.....</i>	66
3.3.2	<i>Helbesta Nîştîmanî.....</i>	76
3.3.3	<i>Xem û Nasorî û Soza Derûn Gilî û Soza Xerîbiyê: .....</i>	79
3.4	XEM Ê RONDİK.....	87
3.5	ŞÎN Ê ŞÎNGERÎ:.....	93
	<b>ENCAM.....</b>	<b>102</b>
	<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>104</b>

## PÊŞGOTIN

Dema tê ser mijara wêje, kelepûr, mîratê folklor û wêjeya Kurdî ya di nava sînorên siyasî yan jî şer ên hatine çêkirin de, timî navçetiyê liberçav digirin. Nikare bi ti awayekê hêmayê li ser dane û bixe di bin xeta paşguhxistinê de. Em Kurd dixwazin behsek û şîroveyeke vê serbilindiya di serwetên dîroka xwe de bikin, berî hemûyan Rojhilatê welatê me tê bîra mirov. Tevî hemû nexweşiyên derbas kirî, tenê bi parastinê razî nebûye; belkî pêşketîtir bûye. Di sedeya 20'an û bi taybet jî nîva dawiyê de, çend kes diyar dibin. Barê giran ê civakê digirin ser milê xwe. Divê demê de kesek ku heye û ew jî Hêmin, ew dixwaze emanetê berpirsyartiyê bigire ser xwe. Hêmin gelek bi nexweşiyên gelê xwe têşe. Dixwaze birîna wan derman bike. Xweziya wî dermankirina birîna gelê xwe ye. Bi can û giyanê xwe bac daye, ne ji bo destxweşiyê, belkî tenê ji bo gelê xwe kiriye.

Em dixwazin li vir behsa vî nivîskar û helbestvanî bikin ku çawa ji bo gel, xak û neteweya xwe qûrbaniyên zêde daye. Di vê tezê de aliyekî din jî ew e ku giringiya vî nivîskarî di warê zanista civakî de diyar bikin ku çend bi hûrî kariye behsa pirsgirêkên civakî bike. Piştê jî civakê li derdora nivîs û helbestên xwe bicivîne. Nivîskar di vî warî de bê hempa bû.

Teza me ji pêşgotin, kurte û dû beşên serekî pêk tê, her beşek çend bendan digire nava xwe. Piştê jî bi encam û listeya çavkaniyan bi dawî tê.

Rêbaza Tezê: Lêkolînek civakî, dîrokî, wesfî û pratîkî ya ji berhemê helbestên Hêmin ên civakiye. Me li vir hewl da ku hewara xwe bigihînin tekstên helbest û daxuyaniyên li gor çavkaniyên zanistî û şîrovekirina wan li gor liberçavgirtina dem û rewşê. Ew cih û jîngeha civakî û siyasî ya nivîskar ketî di nav de, di naveroka armanc û fikra helbestê de gelek bi hûrî cihê helbestvanan girtiye. Ew jî bi sûdwegirtina ji jîyan, bawerî û têgehiştina xwediyê berhem û serdema wî.

Lêkolînavan çend bi hûrî û bi biryar li ser lêkolînê kar bike, hê jî nikare xwe ji xwendekarê hûr û rexnegir rizgar bike. Vê teza me jî para xwe ji vê yekê girtiye. Bi mîsogerî çend sedem û pirsgirêkan wisa kiriye ku barê li ser milê me girantir bike. Ew

sedem jî vedigerin ji bo aloziyên rewşa jiyana nivîskar, beşdarbûna ligel siyasetê,  
herwiha berfirehiya nivîsên di aliyê helbest, çîrok û hwd...

Hardi Hassan Mawlood AL-BAJALAN

Wan - 2017





## KURTEK

Me di vê teza xwe ya di bin navê "Di Helbestên Hêmin Mukiryânî de Civaknasî " di nava civaka xwe û wêjeya Kurdî de diyar bikin ku çawa xwestiye civakek ji nexweşî, nexwendekarî û paşketinê agehdar û rizgar bike. Nivîsên Hêmin di piraniya warên civakî de hebûn û timî rêya xwe ya taybet a wêjeyî bernedaye. Bi taybet jî di warê ziman de gelek bi ciwanî bi peyvan dileyîze. Di warê vehûnandiyên rewanbêjîyê de karên gelek baş kiriye. Hêmin timî di xema ziman û civaka Kurdî de bû. Ev tişt bûn sedem ku ez vê teza xwe li ser wî amade bikim.

Ev teza me ji Pêşgotin, Kurtî, Pûxte (Soje) û piştî jî ji Naverokê pêktê. Naverok ji sê beşan pêk tê, her beşek ji çend bendan û her bendek jî ji çend sernavan pêk tê. Beşa Yekemîn, 'Civaknasiye' û ji du bendan pêk tê. Beşa Dûyemîn jî, 'Jiyan û Peywendiyên Helbestvan Ligel Civakê' ye. Beşa Duyemîn jî ji bi du bend û çend sernavan bi dawî dibe. Beşa Sêyemîn û dawî jî bi navê 'Rewşa Siyasî û Civakî ya Helbestvan' e û ev jî ji sê bendan pêktê. Piştî jî armanc û di dawiyê de jî lîsteya çavkaniyan heye.

## ÖZET

"Helbestên Hêmin Di Warê Civakî De" adlı tezimizde, edebiyatımızın, toplumu nasıl hastalıklardan, cahillikten ve gerilikten haberdar etmeye çalıştığı ve kurtarmaya çalıştığını ele almaya çalıştık. Hêmin'in yazıları toplumun bütün alanlarına ilişkindir ve kendi özel yolu olan edebiyattan ayrılmıyor. Özellikle, dil alanında kelimelerle bir cambaz gibi oynuyor. Bir dili dokumada güzel işler başarıyor. Kürt Dili ve toplumu Hêmin'in her zaman özel ilgi alanıdır Bütün bunlar, benim tezimi bu konuda hazırlamamın sebebidir.

Bunlar uğerine tezimin yazılmasına neden olan şeylerdir..Tezimiz "ön süz", "özet", "sonuç" ve "içindekilerden" meydana gelmektedir. İçindekiler üç bölümden oluşuyor, her bölüm birkaç paragraftan, her paragraf birkaç başlıktan oluşuyor. Birinci bölüm "Sosyoloji" iki paragraftan oluşuyor. İkinci bölüm "Şairin Hayatı ve Toplum ile İlgisi"dir. İkinci bölüm iki paragraf ve birkaç başlıktan meydana gelmektedir. Sonuncu ve üçüncü bölüm de "Şairin Siyasi ve Toplumsal Durumu" adıyladır ve bu da üç paragraftan oluşuyor. Ardından hedef ve sonda da kaynak listesi var.

## ABSTRACT

In this topic we indicate, under the title of "The social view of Hemin's poetry", in his own society and Kurdish literature to see how he wanted to keep his society conscious and salvage his people from hardship, illiteracy and regress. Hemin had writings of his own on most of the social respects. Hemin always had his own literary method and remained committed to his literary method particularly in regard of perfectly and beautifully playing with words and he has outstandingly unique works in the point of view of using rhetorical devices. Hemin has always been thoughtful of protecting the Kurdish language and society. These were the many important points that attracted us to do this piece of research upon "The Social view of Hemin's poetry".

Our thesis includes; preface, concise, summary, and then the content of the study. The content encompasses three chapters, each chapter contains of several sections, each section includes of several titles. The first chapter, 'Sociology' consists of two separate sections. Second Chapter 'Life and Communications of Poet with the Community'. Second Chapter consists of the two section and a few titles. Third and last chapter called 'Political and Social Situation of the Poet' it consists of the three sections. Then it aims (goals) of study, and in the end, the list of sources.

## 1 BEŞA YEKEM:

### TEORIYA CIVAKNASÎ

#### 1.1 Civaknasî:

Civaknasî (Komelnasî) yan jî fikra zanistî, nasîna çînen civakî û herwiha guftûgokirina yasayên li ser van tevgeran deshilatdar. Bi wateyekî din, 'Civaknasî' tê wateya xwendina jiyana hemû mirovan.<sup>1</sup>

Civaknasî giringiyê dide civakê. Herwiha 'Hewlên nasandina zanistî dide û encamên karê xwe derdixe holê. Ango pêwîste bikaranîna civaknasî li gor encamên li wî alî tîn bidestxistin, binirxîn.<sup>2</sup> Civaknasî zanista karûbarên civakiye û xwendina civaknasan, ji bilî dîtina rastiyên civakî û taybetmendiyên jiyana civakî, tekoşînê dike. Dîtin û têbiniyên zanistî yên mirovan ên derbarê civak û rewenda pêşveçûna civakê berfirehtir bike.

Lêkolînên civakî, ji bo nasîna beşên civakê û ji bo liberçavgirtina pirsgerêkên civakî, jîngehî (ekolojî), çarçoveya jiyana mirov û li ser bîngehê fikra zanistî karkirin heye. Lipeyçûna rastiyên civakî di nava rêxistinên civakî û herwiha bûyerên civakî de, xwendina civakî, dîroka cihê baweriyê, nasîna rêbazan, felsefeya civakî, întîgraflî û hwd... beşek ji karên vê zanistê ne.

Aliyê zanista civaknasî ber bi pirsgerêk û bûyerên civakî ve, civaknas naveroka bîngehî di pêngava yekemîn de "Rastiya Civakî" dizanin. Lewra civaknas, zanista jiyana civaka mirovayêtiyê û xwendina zanistî diyar dikin û rêxistinên civakî ne.<sup>3</sup> Civaknasî ji awayên cûr bi cûr ên raman û hizrên civakî sûd werdigirin. Hinek caran awayên cûr bi cûr fikir û ramanên gelek ji hev cûda hene ku cûrekê ji fikirinên

---

<sup>1</sup> -Elî Ekber Turabî, (1384). *Camia Şnasî û Edebiyat , Şair Nu, Hunerîder Peywend Batekamil Ectimaî*, Tebrêz , R4.

<sup>2</sup> -Menu Çehir Muhsini,(2007). *Komelnasî Giştî*, Bergî Yekem, Terceme, Muslih Erwanî, Çapî Dû, Kurdistan, R45.

<sup>3</sup> -Elî Ekberturabî,(1341).*Camia Şnasî U Heyat Ectimaî Ensan*, Nesir Danişkedey Edebiyat Tewrêz, R 6.

regezekê çavkaniyê wernagire. Bi vî rengî jî, dû taybetmendiyan pêşkêşî xalek di vî rengî de bi hev ve girê didin.

Taybetmendiya yekemîn ewe ku civaknasî tekoşînê dimeşîne, heta danêner (îcat) û rahênerê fikrekê be. Her fikrek civakî, tekoşîneke ji bo pêşvebirin û şîrovekirina çawaniya bertekên (reaksiyon) civakî.

## 1.2 Yek Ji Pênaseyên Vê Fikrê Wiha Ye:

"Hinek şîroveyên ku behsa peywendiyên dûalî yên tên gûhertin ên civakî di dîtina teng ya rûyê befireh a netewî, cîhanî û dîrokî şîrove dike. Di navbera van de peywendiyên sedem dibîne. Fikra civakî ji ber dîtina herî befireh a civakî bi cih dibe. Bi baweriya hinek civaknasan ya baş ew e ku rûyê vê fikrê, bi navê felsefeya civaknasî bê bi nav kirin.<sup>4</sup> Ew fikrên ku bawerî bi hûnerê ve hene, piştî xwe bi aliyên cûr bi cûr ên hûnerî yên wek afirandina hûnerî, wergirtin, dîrok û civakî ve girê didin. Herwiha li berhevkirina hûner a di çandên din û cûr bi cûr û fikrî yên ku girêdayî bingehe bûyerên wekhev û ji hev cûda, himbêz dike. Bi kurtî her beşek peywendî bi hûner û bi taybet bi wêjeyê (edebiyat) ve heye.

Di dîroka civakî de hûner û bi taybetî wêje, gelek wêne hene wê yekê nîşan didin ku tekoşîna dîroknasan ji bo pêkanîna peywendiyên navbera bûyerên civakî, cûr û serhildana rêxistin an jî dibistanek hûnerî ya giring. Yek ji alî û guhertinên herî navdar ê awayê wêjeyî, serhildana awayê Hindî yan jî bi wateyekî din Îsfehaniya di nava wêjeya Farisî de ye. Mirov dikare bêje, bandorên ji bo pêkanîna vî şeweyî, deshilatdariya Sefewiyên pêşve çû, befirehtir bû û gihişt bajarên mezin ên weke Îsfehan û Kaşan. Piraniya cotyar û xwediyên zeviyên, ji bo bidestxistina serwetên zêdetir berê xwe didin bajaran û ji bo jiyaneke baştir bidestbixin. Hêdî-hêdî çîneke nû ya bi navê 'Çîna Burjuwa' pêktînin.

Di teoriya Gozer (Derbasbûn) a ji civaka gund ber bi civaka bajar ve, di mijara vegûhestinê de gelek tişt nedihatî xwestin bi xwe re anî. Civaknasên weke, Durkhaym, Rîd Fîlld û Tonîs gihiştine wê baweriyê ku di vê vegûhestinê de

---

<sup>4</sup> -Alexandder ,(2003) *Victorîa Cl , Socîology Of Arts* . Crane , Dîana 1992 , The Production Of Cuit R602.

pêwendiyên şexsî (kesî) digire nava xwe. Di encamê de ev sîtem, civakê ber bi ji hev cûdabûnê ve dibe.<sup>5</sup>

Li aliyekê ev çîna nû zanist û kevneşopîya Arîstokratîyên kev winda dike û nikare tamê ji bermayên kevin û jêhatî wergirin. Li aliyekê dine pêwîstiya vê çîna nû bi bi wêjeyek sade û rewan heye. Lewra di vê demê de çîroknivîsîn destpê dike û pêş dikeve. Herwiha naveroka piraniya wan çîrokan wêjeya kevin û klasîk a bi ziman û formên wê demê dihatin hilgirtin. Bi awayek ku beşek ji wan helbestên wê demê, naveroka wan piranî exlaqî û îrfanên kevin ên bi zimanê sade û yê wê demê tên dîtin.<sup>6</sup> Lê tişta herî taybetmend a wê demê di wê yekê de ye ku civaknas bi awayekî din temaşeyî irf, edet, kevneşopî û taybetmendiyên wan dikin. Ango temaşeyî peywendiyên navbera kesayetiyên de dikin.

Civaknas mirovan ji peywendiyên navbera edet, kevneşopî, bingeş û çandê dixê jêr guftûgoyan û karê wî li ser cewherê ferdane. Heta cihê rûspiyan jî liberçav nayê girtin. Peywendiyên di navbera hûner-siyaset, huner-ol, hûner-îdeolojî, huner-alûgurên zanistî, huner ligel bingeşên çînî yê di nava civak û gelek tiştên din de. Vêca çî berfireh û bi awayekî teng û taybet, hemû bi awayekê dibin naveroka civaknasan.

Maks Wênbêr, Îmîl Durkîm û Karl Marks 'Bingeşê Danezanê' civaknasî û damezirînerên civakî ne. Bi bawerîya beşeke civaknasan Îmîl Durkîm û bi taybet jî bi lêkolînên xwe yê derbarê xwekuştin, civaknasiya erênî damezirandiye. Herwiha Maks Wêbbêr bi giringîdanê bûye sedemê civaknasiya tawîlî û ravekarî. Firkên Karl Marks ên derbarê dîbendiya navbera çînan de, bûye sedemê pêkanîna civaknasiya rexnegerî. Tevî ku ev hersê hevok nikarin bibin bersivê mezîniyê ji bo van hersê zanayan, lê wê rastiye nîşan dide ku ev awayê fikrîniyê; lêpîrsîneke ji bo eniya serekî ya civaknasî. Di çend salên borî de wiha di hat gotin, ev dîtin bi awayek aloz û nakok a di bawerîya civaknasên berê de çavkaniya xwe wergiriye. Li hemberî dîtinên din, bi taybet jî di bawerîya civaknasên erênî de xwe dibînin.<sup>7</sup>

<sup>5</sup> -Brus Kuhîn ,(2010). *Seretaîtek Bo Komelnasî*, Wergêr-Hemin Serf , R. 220.

<sup>6</sup> -Semîsa Sîrûs, (1376). *Sebik Şunasî Esir* , Capî Heftem –Enyîşarat Firdews, Tehran , R286.

<sup>7</sup> -Ramîn Elî (1389), *Mubaîti Camîie Şunasî Hinir* , Capa Didw ,Entîşarat Niya, Tehran, , R59.

Vîktorya Eliskandir di pirtûka 'Civaknasiya Hûneran' de ji bo gihiştina armanca şîrovekirî, civaknasiyê li ser çar beşan parve dike. Dîtinên Komî, yek ji van fikraneke ku ligel hevhatin û hevexistina ferzkiriyên giştî yan jî fikran, bi dîtina bingehîn temaşeyî diyardeyên civakê dike... "Tevû ku dîtin ligel fikran hevbeş bin, lê di dîtinên taybet ên derbarê naverokê de ji hev cûda ne. Dibe ku gelek caran dijê hev bin. "Herçendî li ser fikran de hevbeş bin, lê di fikrên taybet de li ser naverokê cûdahî hene û dibe ku gelek caran ligel ev dijber bin. Çar dîtinên erênî, ravegarî, rexnegirî û post modern.<sup>8</sup> Şîrovekirina kîjan ji vê dîtinê, pir kurt û netemam e. Lê tenê ji bo nasandina van hersê dîtinan, emê bi kurtî behs bikin.

### 1.3 Corên Civaknasiyê:

#### 1.3.1 Civaknasiya Erênî (Îcabî):

Civaknasiya Erênî, dîtina herî 'Zanistiye' û ji ber vê yekê wisa tê gotin ku çawa armancên erênî; 'erênî tê wateya model wergirtin ji rêbazên zanistî' û civaknasiyê bikin zanistek hûr û bandora wê hebe. "Dorkîm di rêya awayê civaknasiyê de, prensîbên pozîtîvîzmê heta wê radeya (ast) ligel civaknasan peywendî heye, destnîşan kir û ji bo giringiya takê kar, ezmûnên dîtin û herawiha ravekirina zanistên sedem, giring dibîne û li ser berdewam e."<sup>9</sup>

Pozîtîvîzm ravekariya fikir û xwe bi belgeyên ezmûnkirî qahîm û bihêz dikan.

Pozîtîvîzm bi formdayîna bi wê fikrê ku fikrek rûte, weke cihgerek taybet peywend dide, doz û pirsên wê teoriyê. Herî zêde lêkolîna çendayetî yek bingehên lêkolîna amara (statîstîk) bingehê civaka erênî (pozîtîv), tevayî û giştî, civakê wek beşek (koyek) ji guhertinan temaşê dikan. Ev yek jî di nava civaka mirovatîyê de wek peywendiyên sedem tê temaşekirin. Armanca civaknas komkirina beşek ji yasayên ku bikarin sedemê vekirina mirov bi awayê civakî bipişkînin. Fikrên erênî yan jî pozîtîv, herî zêde di xala 'Yasayên' Giştî û mantiqê navxwe, berî dîtina reftarê mirovan dike armanc.

Civaknasên erênî berî Ewrûpa, li Amerîka rewacî (tiştê gelek daxwaz li ser hebe) peyda kirin. Pozîtîvîzm herçendî ku bi kiryarî kiryarên giştî di nava fikrên wan

<sup>8</sup>- Alexandder *Victoria Cl*, *Sociology Of Arts*. R7.

<sup>9</sup>- Adurnw Tenudurw Digiran (1377), *Der Amedî Ber Camîe Sunasî Edebiyat*, We-Mehemed Ceifer Puînde, Tehran, Neqîş Cîhan.

de kar dikan, lê ne dîtin tekaneye. Lê piraniya wan derbarê komkirina par û tiştê didin wan, ji bo saz kirin an jî ezmûnkirina şertan, daxwaz li cihekê hatiye diyar kirin û xwediyê heman fikrê ne. Beşek ji fikrên erênî, fikrên tund ên erênî, xistine ber rexneyan. Lewra beşek ji başiyên lêkolînê, bi awayekî erênî li ber çav nehatiye girtin. Dîtinên civaknasan di vê rêbazê de, giringiyek zêde didin pêşvebirina civaknasiya hûnerî.

### 1.3.2 Civaknasiya Ravekarî:

Civaknasiya ravekarî zêdetir temaşeyî wateyê dike. Wate di sîstemên civakî de çawa hatiye afirandin û em dikarin çawa bihêlin bijî? Berhemekî taybetî ya hûnerî bi baldarîdan bi taybetmendiyên derve, dibe ku çi wateyê wê hebe?, Civaknasên erênî li ser wê yekê hemfikirin ku bersiva van pirsyanan bidin. Ji bo bigihin armancê ku bi rêya berdevk û lêkolîna ligel kesayetiyan din derbarê em çawa bifikirin yan jî bi awayekî hûr û bi babetek ferhengî û çandî, heta digihin armanca xwe.

Dîroka civaknasiya erênî digihe sedsala 19'mîn a zayînî û çavkaniya wê Hêrmonotîke. Tekstek dikare gelek tiştên ku wateyê bigre nava xwe, weke; pirtûk, dînamek yan jî berhemekê hatî wênekirin û heta tabloyeke ragihandinê jî. Yan diyalog û hevdiştin, yan reftarên dû kesana a ligel heve.

Fikra Wate ya Makis Wêbber (1946) "Ango îstiare yan xwesteka Paleyê Şemendefirê." Bi jivak nasî dihête hejmartin Baweriya Wêbber bi vê wateyê hebû. Ango mirov di hildibijartin û liberçavgirtina qezenc û sûdê kesayetiyan xwe, gelek bi mantikî kar dike. Lê çawaniya qezenc kes û nasîna wî, peywendî bi çand, bawerî û ferhengî ve nîne. Wêbber wisa difikire ku 'Ferheng zêdetir weke rêya şemendefire: Tenê dîtinên belkî ev qezencên maddî û armancên fikrek zanistî, reftar û tevgerên mirov hildibijêre. Bi vî awayî jî armancên serwet di fikrê mirov de bi vî awayî baskê rêya şemendefirê zêdetir vê rêgayê hildibijêre. Têvgerkirina mirovan bi baldayîn, qezenca xwe û bi keyfî. Lewra xwendina 'Wate' me ji bo nasandina armancên mirov dibe alîkar, bi awayê ku bikarîna tevgerên xwe şîrove bikin.<sup>10</sup>

Şîrovekar di dîtina fikir de zêdetir dixwazin rewşên taybet şîrove bikin. Ew ti pêwîstiyekê nabînin ku ku fikrên wan xwediyê giringiyên werin texmînkirin bin. Di

<sup>10</sup> -Binton , (1384). *Felsefe Ilum Ictimaiy* – Biniyadhaî Felsefî Tefekîr Ictimaiy , We-Sehnaz Musema Perist , Mehmed Mutehid, Tehran , R28.



lêkolîna dawî de herî zêde li ser wê fikrê ne ku rastî bingehê civakê ye. Bi wateyekî din wisa difikirin ku bi awayê temaşeyî cîhanê dikin, zêdetir sedem fikirîna me ye û ev fikirîn jî çavkaniya xwe ji civakê digire ku em di nav de dijîn. Erênîyek (Pozîtîvek) dibêje: (Diyare, çavkaniyê bibîne. Lê şîrovekarek dibêje, 'Bingehê dîtîne baweriye.' Civaknasên şîroverkar, bêşik ji di civaknasiya hûnerî de cihek giring hebûn. Berhemên hûnerî û nasîna ku çawa mirov nikare 'Wate' di vê berhemê de bixûliqîne. Bi wateyekî din û di xwendîna xwendekar û nasîna berhemên hûnerî, bi giringîdana bi taybetmendiyên derve de, hûr bûne û lewra rêya şîroverkariyê gelek bi wate ye.<sup>11</sup>

### 1.3.3 Civaknasiya Rexnegirane:

Karl Marks di derbarê gûhertina civakî de, di teoriya xwe de hinek beşên teoriyên dewlimend bikartîne. Yên herî giring jî; (Hizra hilberîner, çîna civakî, xerîbî, sererd û binerd.) Mark di şîrovekîna proseya vegûhestina civaka Ewrûpî û Rojavayî, ji 'qonaxa feodalî' ber bi "Qonaxa Sermayedariya Nû" ve weke Emîl Durkhaym û Marks Vîbber kar kiriye. Taybetmendiyên qonaxa feodaliyê şîrove nekiriye, lê dest bi şîrovekîna qonaxa sermayedariya nû kiriye. Behsa sedemên serhildana vê qonaxê kiriye. Herwiha taybetmendiyên bingehîn ên berfirehbûna wê eşkere kiriye û pêşbîniya derbarê siberojê de pêşkêş kiriye.) (33) Civaknasiya rexnegirane zêdetir giringiyê dide xebata bîneyetî û herwiha balê dikişîne ser cihê rewşenbîran ê li ser kesên asayî. Vê yekê hem di warê fikrî û hem jî di warê keresteyan de. Civaknasiya rexnegirane ligel serhildana xwe yanî Karl Mark peywendiyek nehatî qut kirin heye. Marks giringiyek zêde dide peywendiyên navbera çînên jêr û sermayedar de.

Rolê wesfî û vegûhestina Marks nakokiyên navbera çînên civakê yê weke çîna jêr, navîn û deshilatdar de kêmkirîye. Dîtînen Marks zêdetir bi navê 'Civaknasiya Dijberî û Nakokî' di nava pirtûkên dibistanên civaknasiyê de cih girtiye. Lê pêwîste ev xal liberçavan were girtin ku civaknasî nakokî ne civaknasiya Marksîsiye. Bi baweriya fîlozof û teoriyên nakokî, sedemê nakokiyên qezence kesayetiye. Fikrên Marks cûdahî di qezenc û berjewendî li gor çînan liberçav digire. Lê civaknasên rexnegir nakokiyên di qezencê de bi awayek giştî peywendî bi

---

<sup>11</sup> -Ramîn Elî ,(1389). *Mubaîi Camiie Şunaîi Hinir* , Çapa Didw , Tehran-Nî, R64.

deshilat û deshilatdariyê ve dibînin. Lewra zêdetir bala xwe didin ser deshilat, neberamberî, milmilanê, miştemirbûn û dijberî.

(Li gor vê dîtinê civak pêkhateyeke û di çînen cûda de her kes li pey qezenca xwe ya taybet digere. Lewra qezenca cûda di vê wateyê de lêhatî û guncaw, herwiha nîşan dide ku timî komên diyarkirî ji yên din zêdetir qezenc dikin.) (333)Marks dibêje: sermayedar û burjuva dixwazin û dikarin çîrokên rewa rêya xwe bi başî bixûliqênin. Herwiha Marks dibêje, rewşenbîr û bijardeyên di nava civakê de di berdewamiya dîrokê de endîşeyên wisa xulûqandine û bihêzkirina deshilatdaran li pey xwe aniyê. Yek ji hevokên navdar ên Mark eve; "Endîşeyên çîna deshilatdar di her serdemekê de endîşeyên deshilatê bû."

Ev fikrane berê ji laiye Marks ve li ser kontrolkirina ferheng û çanda civakê hatiye gotin. Çawa sermayedar (Rêveberên Rêxistinên) dikarin karkeran wisa bixemlênin ku tevgerên karkeran di berjewendiyên burjuwan de bin. Herwiha burjûwa dizanin çawa awayên hûnerî weke amrazek ji bo kontrolkirin û çavdêrîkirina civakê bikarbênin. Diyare ev rêbaz ango civaknasiya rexnegirî ya Marksîstî di şîroveya çînyatî de çavkaniya xwe wergirtiye, çand û ferheng li pey tê. (Çînen cûr be cûr ên civakê her yek bi awayekê sûd ji hûnerê werdigirin.<sup>12</sup>

#### 1.3.4 Civaknasiya Post Modern:

Rêbaza post modern berevajî hersê rêbaz û awayên berê, temeneke wê yê kurt heye. Rabirdûyek kêr û kurt ya vê rêbazê heye. Lê post modernîzm weke awayek cûda di derbarê fikirîna civakê, dema xwe nîşan da ku gelek alogurên xwe ji modernîte ber bi post modernîzmê ve destpê kiriye. Lewra rêbaza 'Post Modern' hem temaşeyî Post Modern (Yanî serdema ku em niha di nav de dijîn) û hem jî rêyeke ji bo nasîna 'Îrfet û Zanist' ku bi taybetî hinek civaknas baweriya xwe pê tînin.

Modernîzm û fikrên modîrnîteyê hemû jî bi awayekê di bin bandora fikirîna de ne û çavkaniya wan nehatiye diyar kirin. Awazxwazek dibêje: Civak ber bi başbûn û pêvçûnê ve diçe. Zanist jî bê aliye û dikare kodaynş çêke..

Israra post modernîzmê li ser rêjeya hebûn û nebûna rastiye, çavkaniya xwe ji bingehê fikra filozofê Fransî Mîşil Foko werdigire. Foko fikra hêz-zanist derxistiye.

<sup>12</sup> - Ramîn Elî , *Mubaiî Camiie Şunaiî Hinir*, R66-67.

Wateya ku hêz ligel zanistiyê girêda û li gor wî hêz û zanist nikare ji hev were cûda kirin. Dibe ku modernîstek bêje, hûner zaniste; lê piştî bingehxwazek hêza berê ji zanistê giringtir dibîne û nû dibîne ku zanist ti demê nikare bê alî be. Hêze zanistê ava dike, ji bo di xizmeta hêz û deshilatê de be. Bi eşkere û zelal ji me re dernakeve holê. Rêbazên postmodernîzmê bi hêviya fikrên xwe, dixwazin tiştêkê bi navê civaknasiya erênî bikarin bibin xwedî hebûn. (Bila ji bîra me neçe, postmodern zanista erênî dixê bin berpirsyartiyê û giring wernagire.) Baweriya Post modernîstan bi hebûna zanistan heye û bi aweriya wan nabe hemû tiştêk bêyî şert û merc bê pejirandin.

(Hinek ji postmodernîteyan navberek pir baş ligel lêkolînkirina ezmûnkariyê nîne. Her vê demê civaknasên din li ser wê yekê hemfikirin ku bi amrazên post modernîzmê bi komkirina zanistê ve mijûl bin. Xala herî giring a lêkolîna post modernîzmê ewe ku lêkolîna wan, lêkolînek dúbare fikirîne. Dema dibêjin dúbare fikirîn, tê wateya dîsa xwe berçav re derbas kirin. Ji bo bandora lêkolînê li ser projeyê, li ser soje û naverokê bê nirxandin<sup>13</sup>.

---

<sup>13</sup> -Riterz Corc ,(1377). *Nezeriye Hay Camîe Sunasî Der Dewran Muasir (Ba Efwzden Dw Fesil Saze ) We-Muhsin Silasî* , Entisarat Elmî Danisgahî , Tehran , R569.

## 2 BEŞA DUYEM:

### PEYWENDIYA WÊJE Û CIVAK

#### 2.1 Peywendiyên Helbestvan û Civakê

Eger di jiyane de berhemên wêjeyî (edebî) bi awayekî giştî nîşandana helwesta xwediyê berhem be, wê demê helbest weke rezezeke serekî ya wêje û amrazeke nîşandanê, vê helwestê nîşan dide. Çendî ligel reftar û kiryara xwediyê helbestê rêkûpêk û cot bî, ewqas giringî û bandora wê ya di nava civakê de ber bi pêş ve diçe, hê zêdetir ligel xelkê dibe cihê baldarî û giringiyê. Di her rewşekê de jî helbest hestê cîhana helbestvan e. Lewra helbest çend rast, resen, çavnetirs û hunermend be, ewqas jî navdare û serê helbestê bilindtir dibe. Helbestvan kurê civaka xwe ye, endamekî jîr, çav vekirî û şareza ye. Di nava şert û merc û rewşên jiyane de ji dayîk dibe û serî hildide. Li vê xaka pîroz serê xwe radike, di vê rewşê de mezin dibe. Di civaka ku himbêz dike de mezin dibe. Ang rewşa qonaxa dîrokî, taybetiya jiyana û civakê, helbestvan diafirîne û dixê ber peyamek pîroz.<sup>14</sup> Di peyamên xwe de temaşeyî rewşa ku di nav de jiyana kirî dike. Xweşî û nexweşiyên hunera xwe tevî giyanê (rihê) civakê dike, ji bo ew yekîtiya zindî di nava wêje û jiyane berfireh dibe. Kar li ser wê yekê dike ew dîtin me ber bi wê yekê ve dibe ku bêjîn, helbest û hunera resen û rast, jiyana ligel kûrahî û berfirehiyê, bi xweşî û nexweşî, serkeftin û şikestin, bi hemû nakokî, mîlmilanê û dahênanan ve rastiyê derdixe holê.

Ligel me jî di rexneya Kurdî de helbest û wêje heta niha jî di wateya herfî sade de weke neynika jiyane tê danî. Weke wê ronahiyê tê temaşekirin ku xwe weke karwanê bi civak û gel ve girêdayî û rê li pêşiya wan ronî dike. Helbestvanên Kurd di berhemên xwe de rengê jiyana û rihê mirovê Kurd bireng dikin û ji rihê serdemî jî nehatine qut kirin. Vêca dema mirov ji vî alî ve temaşe bike, berhemên helbestvan Hêmin teji hestên bi gul, moral, teji bandora jiyana taybet û giştî, bi awayek hişyar hîlbijartina jiyane, bandora jiyana taybet û giştî bi awayek hişyarî hîlbijartiyê. Di warê huner û ciwanîyê ve ligel fikir û jiyane tevlihev kiriye, xistine ser şanoya jiyana û serkeftinê.<sup>15</sup>

---

<sup>14</sup> -Gerdî, 1973, R 6.

<sup>15</sup> -Resûl, 1985, R 202.

## 2.2 Jiyana Hêmin

Hêmin kurê Seyd Hesênê Mukrî û ji binemala Mele Caî Çorî bû. Navê dayîka wî Zeynebe, ew jî keça Şêxê Burhan bû û niha malbateke mezin a Mukiryan in. Hêmin li bihara sala 1300'a koçî li gundê Laçînê yê girêdayî bajarê Mihabadê ji dayîk bûye. Dema Hêmin ji dayîk bû, şîrê dayîka wê namîne û bi şîrê jinek din mezin dibe. Piştê jî dayîka wî nexweş dibe. Hêmin di demekê de ji dayîk bû ku Reza Xan deshilatdariya hikûmetê bû û texlîdê Atatürk dikir. Cilûbergên Kurdî bi temamî hatibûn qedexe kirin û qasî ji destê wî dihat, bêrêzî li hemberî xelkê dikir, şeqpe û darbûqe anîbû nava bazarê de. Hêmin di vê rewşê de ji dayîk dibe. Koletiya mirov weke xwînê di mejî, demar, hestî û çermê wî de digeriya û dibe sedemeke giring a jiyana wî. Di dema zarokatiyê guhdariya çîrokên Dayka Mirot dikir. Ew pîrejînek dinya dîtî bû û fêrî gelek tiştên binîrx bû. Ligel Seîdê Nakam fêrî elfûbêyê (ABD) dibe û berî fêrî elfûbêyê bike, çîrokên 'Biznûke û Mernûke' jêre dixwend. Hêmin wan çîrokan ji ber dike. Herwiha fêrî helbestên Şêx Reza û gelek tiştên din dibe. Piştê ji bo berdewamiya xwendinê, dişîne Mihab,adê û li dibistana Seadetî ya wî bajarî dest bi xwendinê dike. Hêminek gundî, ji bilî zimanê Kurdî ti tiştêk din nedizanî û li wê dibistanê jî ti kesê nedikarî bi Kurdî baxive. Zarokan heneg pê dikir û jêre digotin, kirmanc. Ji ber ku wê demê li Mihabadê ji xelkê gundan re di gotin, 'Kirmanc.' Hêmin wê salê xwendin bi serkeftî mezin bi dawî dike. Havînê vedigere gundê xwe û ligel melayê gund û bavê xwe dersê dixwîne. Fêrî nivîsana destî dibe. Dema bavê wî dizane destxetên Hêmin ciwan bû, wisa dike ku dest ji xwendinê berde û dibêje; here dersa melatiyê bixwîne. Hêmin ti carî ti xweşî ji mela nedîtîye. Rastî taliyê dibe û çar salan li xaneqaya (Cihê xwendina feqeyan) Şêxê Burhan dixwîne. Lê ti sûdê wê xwendinê jêre çênabe. Ji ber ku wan çar salan bi henegî derbas dike. Li xaneqaya Şêxê Bûrhan 8-9 kes bûn, ji bilî Hejar, Hêmin, xwarzî, kûrmet û kûr xalet. Piştê diçe gel mamosta Fewzî û rêya jiyane nîşa wî dike. Sal û nîvekê ligel wî dersê dixwîne.

Hejar di despêka dîwana 'Seyfûlqizat' de bi vî awayî behsa xwe û Hêmin dike: Ez û Hêmin du zarokên feqîr û hejar bûn, di temenê 10-12 saliyê de bûyîn û em li xaneqayê gihiştibûn hev. Me ne bi xêrî ders dixwend, xwendina çi? Dû gêjên beredayî. Di cihekê de em ligel du mamostayan hatin damezirandin. Yek rihê wî dirêj bû, erebiya wî baş bû û destxetên wî ne ciwan bû. Yê din jî gerdel, Farisî dizane

û xetên wî xweş bûn. Vêca were şeq û lêdanê bixwe! Ji xwe mirov nikare behsa dijûnan bike. Sonda ti kesê li ser min nîne, eger ez bêjim em fêrî peyvekê jî nebûn. Qasî misqalekê jî derew di nav de nîne, mafê min heye ku tiriyê di nava rez de bidizim, tane (teelîq) lê dida. Ji rawa dûpişk, spih, kêç, çûçik, herî lêdan û hêk ji hêlînê derdixist. Ti kesê ne dikarî vî karê me bike. Ji bo bextreşiya Hêmin û helbestê hatibû, timî dikir hawar. Car caran helbestek nîvçe û nîvî divîsand, bi pozbilindî nîşanî min dida. Ango were min nas bike! Ez çime! Ezê feqîr min nedikarî ti tiştêkê jî binivîsim.

Bi vî awayî Hêmin li xaneqayê dest bi nivîsandina helbestan kir. Li gundê Kulîçe û ligel Seyd Ewllay Seyd Mîne yê mirovek ne xwendekar bû, lê gelek zana û têgehiştî bû. Demekê dersê dixwîne û weke mamostayê herî mezin ê Hêmin dihat binav kirin. Hêmin mezin dibe, ji bo cara desêkê û dawî li gundê Kulîçe evîndar dibe. Evîndariyek paqij, lê ev evîndar zêde dirêj nake û ji hev cûda dibin. Her li wî gundî fêrî siwarî, teqle û nêçîra kêvroşkan dibe. Li sala 1317'an koçî û dikeve bihara temenê xwe yê 17 saliyê de. Mamostayê wî ji gundê Kulîçe diçe û ew jî (Hêmin) vedigere gundê xwe. Ango mala wan çûbû Şîlanawe, dest bi kar dike. Rojê karê çandiniyê dike, şevan jî bi xwendin û nivîsandina helbestan ve mijûl dibe. Bavê wî vê yekê hîn dibe, deftera helbestên wî dişewitîne.

Navê Hêmin vedigere dema komeleya J.K. û Komara Kurdistanê, weke pêşmergeyekê xizmeta neteweya xwe dike û di nava tekoşerên wê demê de her yekê navê wan ê nehênî (veşartî) hebûn. Wek Hêmin dihat naskirin û weke Hêmin bi xwe dibêje: “Min tiştêk ji Pêşmergetiyê fêhm nekir û min ti sûdek jê wernegirt. Tenê ew xêr ji bo min hebû, ew jî ew navê dirêj ji piştî min bir. Li 2'ê Gulana 1321 koçî li bajarê Mihabadê Komeleya J.K. ji aliyê Rehmanê Zebîhî û çend kesên din ve tê damezirandin. Hêmin dibe endamê wê komeleyê. Fikra wî şev û roj li ser wê yekê bû çî ji wê komeleyê re bike ku karê rizgarkirina Kurdistanê be. Hêmin di wê komeleyê de dibe desteya nivîskarên Govara Nîştîman û piştî jî govara Awat. Li sala 1324'a zayîni li ser bingehê J.K. Partiya Demokratî Kurdîstanê bi rêbertiya Qazî Mihemed tê damezirandin. Hêmin cara yekemîn li mizgefta Sor a Mihabadê ligel pêşberî xelkê helbestê dixwîne. Hêmin dibe sekreterê Heyyet Reîsê Millî Demokrat û piştî di komîsyona teblîxata wê partiyê de dest bi kar dike. Di wê komarê de ji bo

nivîsandina pirtûkên Kurdî û ji bo dibistanên Kurdistanê kar kiriye. Di govarên wê demê yên hizbî yên weke Kurdistan, Hawarî Kurd, Hawarî Nîştîman, Girûgallî Mindalan û Hellalle de helbest û gotar nivîsandiye. Pêşewa Qazî Mihemed di Komara Kurdistanê de şanzî bi Hêmin kiriye û ragihandiye ku helbestên wî gelek biwatene û divê hemû endamên partiyê jiber bikin û bikin bernameya tekoşîna xwe.

Hêmin her di pileya yekemîn a tekoşînê de weke helbestvanek netewî û civakî, bû cihê baweriya xelkê. Ji ber ku helbestên wî di rastiyê de bibûn neynika dilê civakê, derbirîna fikir û hêviyên gel. Hêmin her di roja yekemîn a tekoşîna hunera xwe de ji bo paqijkirin û pêşvebirina zimanê dayîkê têdikoşiya. Helbestên xwe bi zimanekî sade dinivîsand û bi zimanê gel diaxivî. Ji ber vê yekê jî Pêşewa (Qazî Mihemed) ew spart ku ji bo gelek peyvên Farisî û Erebi di xebata xwe ya siyasî de bikardianîn. Spasiya wî dikir. Digot, gotinên Kurdî yên sade bibînin û bikarbênin. Hêmin bû serokê komîsyonek ji bo wî karî hatî amadekirin. Lê piştî demek kurt xemek pir giran Komara hildiweşe û Hêmin dibêje:

Ev bûyer diltezêne û vê karesatê her Kurdek bi şefer xemgîn dike û dixê di nava şînê de. Li sala 1325'ê koçî dayîka wî zextê lê dike û jêre dibêje: "Divê tû jin bênî!" Lê Hêmin naxwaze jin bêne. Bi her awayî be dayîka wî Hêmin razî dike ku jin bêne. Daxwaza keç xala wî dike ku Hêmin bi ti awayî nedîtibû û bi vî awayî 25'ê Xezelwelî 1325'ê koçî jin têne. Hejar di şahiya wî de govendê digêre. Piştî jî kurekê Hêmin ê bi navê Selah ji dayîk dibe. Li sala 1327'ê koçî hişkesalî çêdibe û ew jî weke kesên din rastî hejar û feqîriyê tê. Ev hejarî û feqîrî li tevayî Îran û Rojhilatê Kurdistanê belav dibe. Gelek kes ji birsan dimirin û xelk wê demê nanê garis û ce dixwin.

Li 25'ê Gulana 1332'ê koçî civînek li meydana bajarê Mihabadê tê lidarxistin. Hêmin helbesta 'De biro ey şahî xayîn, Bexda nîwey rêt bê-Here ey şahê xayîn, Bexda nîva rêya te be' dixwîne. Di dawiya 28'ê gulana heman salê Hêmin bi temamî qeçax dibe, demek dirêj li çiyayayan dimîne. Li sala 1344'ê koçî bavê wî koça dawî dike û Hêmin dibêje: "Derdê mirina bav gelek girane. Di her temenekê de eger bavê mirov bimire, hest bi êtîmiyê dike." Du sal piştî bavê wî, dayîka wî jî koça dawî dike. Ev bûyerane bi temamî Hêmin pîr dikin. Carekî din hewayî nivîsandina govaran ligel peyda dibe. Bihara sala 1364'ê koçî berê bingehîn ê govara 'Sirwe' li bajarê Urmiye

datîne. Hêjmara yekemîn a vê govarê despêka havînê gihişt destê xelkê. Hêmin dibêje: “Hêvîdarim ev Sirwe her bimêne û di dilan de bimîne. Hemû gulan bipişkivîne û dilê Kurdan xweş bike.

### 2.3 Helbesta Nîştîmanî-Siyasî

Eger em bixwazin behsa qonaxa helbesta nîştîmanî û siyasî ya wê parçeya Kurdistanê yanî Mûkiryan baxivin, em neçar in rewşa civakî û siyasî ya serdemê liberçav bigirin. Bi taybet jî ew diyaryên li Kurdistanê di bin destê Îranê de hatine dîtin. Weke tê zanîn heta berî şerê cîhanê yê yekemîn, Rojhilatê Kurdistanê tevî ku gelek tevgerên cûr ber cûr ên civakî û siyasî hebûn, lê di ti ji wan de ne tenê hestê netewî û helbesta netewî ligel hestê dînî, ayîn û eşîrî deng veneda bû. Belkî cihek din li ser eniya rewşenbîrî û helbesta civakî ya gel daniye. Lewra ji ber vê yekê helbesta nîştîmanî serî hilda. Diyare vê yekê jî zêdetir peywendî bi rewşa civakî û nizimbûna asta xwedekariya wê demê ve hebû. Ji bilî vê yekê jî tiştek nedihat texmîn kirin.

Hevdem ligel destpêkirina şerê yekemîn ê cîhanê û dagirkirina Kurdistanê ji aliyê hêzên Rûs û Osmanîyan ve, giraniya şer dikeve ser milê xelkên hejar, bê çek û dest teng ên Kurd. Di vê derfeta nazik de beşek ji şêx û serok eşîrên Kurdan dibin pêşengên îslamîxwazên Osmanî. Li cihê ku xelkê bê alî bihêlin, li dijî artêşa Rûsya radiwestin û bi vî awayî piraniya welatên Kurd ji serokeşîran bigire heta çîn û beşên cûda yên li bajaran tevî şerekî nexwestî dibin. Ji bilî malwêranî, kuştin û şewitandinê, ti berjewendiyek di warê civakî û siyasî de ji bo gelê Kurd bidestnaxin. Heta gelek kesên navdar ên bê alî yên wê serdemê ji ber alîgirtiya vî alî û aliyê din, ji aliyê hêzên dagirker ên Rûsya û Osmanîyan ve tên kuştin û darvekirin.<sup>16</sup>

Di encama wan şer û nexweşîyan de, li Kurdistanê malwarên û giranî destpê dike. Rewş giha wê astê ku malbat neçar bibin ji birsan zarokên xwe bixwin.<sup>17</sup>

Bi vî awayî çarçoveya eniya asayî ya civaka Kurdewarî bi temamî ji hev cûda dibe. Lewra di vê qonaxê de zanyariyên di derbarê çalakîyên ferhengî û edebî (helbest û helbestvanî) de ne gelek zelal û eşkere ne. Diyare li vir armanc wêje û nivîs in, herçendî Kurd di wê demê de di warê wêje û helbestên folklorî de bi heman awayê nexwendewariyê ye û bi heman awayî jî dewlimend e. Heta wê asta ku

<sup>16</sup> -Cemal Nebez, (1985). Govara Nîştîman, Navenda Çapemeniya Azad, Swêd , R2-3.

<sup>17</sup> -Çavkaniya Berî , R114,



agehdariya min jê hebe û ne şerte wisa jî be, di wê qonaxê de ji bilî çend helbestên Kurdî, berhemeke me yê helbestî nemaye ku em bikarin qonaxa çalakiyên wêjeyî û helbestî pê derbixin. Yek ji wan helbestên ku weke diyarî mane, heta astekê bûyer û karesatên şer derdixin, helbesteke ya 'Elî Begê Heyderî' (1972-1956) ya di derbarê kuştin û talaniya ku ji aliyê Rûsan ve li navçeya Mûkiryan û bi taybet jî li Sablax hatî kirin, hatiye gotin:

*Lew demey taqim le dîdarî ezîzanî weten*

*Daîma çûtim legel xem, hemdemî xuzîn û mîhen*

*Tozî xakî hermîlî to sûrmeyî çawî dille*

*Awî serçawey zullalî şerbetî rûh û beden*

*Hûbibî to dînî mine, ayîn min, îmanî min*

*Yad û fikrî û xelkit şûxill û wêrdî min weten*

*Kullbinî golzarekey to bû ke cêy qumrî û hezar*

*Aşyaney cuxde êsta bote cêy zax û zexen*

*Şar û bazarit dellên serpakî û wêran û xerab*

*Mulk û asarit hemû pamall û xallî û bê seken*

*Kûçe û şarit ke pîrr ahûy xuten bû bê xeta*

*Cumle wêran û xerabin, pir le segbab û le sen*

*Heyfa wa, bê qutbe qîblet bê sefa baxî wefa*

*Seyre wa, bê seyre pir û golekey Qazî HEsen*

*Mînber û mizgewtî Sûr û hûcrekan û hewşekey*

*Pakî cê destey qîşûn û pakî cê weezî qeşen*

*Dillberanit bûne yexsîr, çûne qeftaz û sibîr*

*Newcewananî hemû kujran û nêjran bê kefen*

*Heşre wawelaye ewro Kerbelaye şarî me*

*Kuştine, talane, yexsîriye, kewa dên û debîn*

*Rencî Mûslîm bê hîsabe, rehmetê ya mûstefa*

*Zollmî kafîr bê jimare xezzebî, ya zulmînen*

*Ey xûda her Kurd yexsîrî hemû mîllet bûwe*

*Dey! "Elî" ta çak efewtawe, billê fikrê biken*<sup>18</sup>

Herçendî ku Elî Begî Heyderî di vê helbestê de bi awayekî pir ciwan û bi hestek paqij beşek ji bûyer û karesatên wê serdemê ji me re tomar kiriye. Lê ji ber ku bi xwe yek ji helbestvanên girêdayî Xaneqaya Burhan bû, bûyerên wî zêdetir li ser dîtina cîhanî ya mezhebîne û ji ya nîştîmanî zêdetir e. Raste kuştin û talaniya Rûsan a çend salan ya li Kurdistanê bêhempa bû, lê zilm, serwerî û hovîtiya Osmaniyan jî ne ji vana kêmtir bûn. Tişta rast, li Kurdistana Mûkiryar despêka helbesta nîştîmanî û siyasî ya ji bo armanc û vejandina hestê neteweyî, hevdem ligel destpêkirina şerê cîhanê yê yekemîn ji ber Dr. Mistefa Şewqî (Mistefa Qazî yê weke Qazî Zade tê bi nav kirin) destpê kiriye û li sala 1896'an li Sablaxê (Mihabad) ji dayîk bûye û li sala 1950'an koça dawî kiriye. Ew ji malbata Qazî Mehabadiye, pismamê Qazî Elî (Bavê Pêşewa Qazî Mihemed) û kurê Qazî Letîfe.<sup>19</sup>

Li gor helbestên liberdest, eger Mistefa Şewqî xwediyê van helbestane be û di despêka ciwaniya xwe de nivîsandî, bi berhev ligel wê yekê ye ku li sala 1950'an koça dawî kiriye. Dibe ku gelek berhemên ji van zêdetir li pey xwe hiştibin. Mistefa Şewqî yek ji wan helbestvaneyaneye ku li ser helbestên klasîk ên Kurdî, li ser heman rûxsar û awayî nivîsandiyê. Tevî ku di despêka ciwaniya xwe de li xaneqaya Burhan xwendibû û li wir mezin bibû, dîtînen wî ji yên Rûsan zêdetir nêzî Osmaniyan bû. Lê bi çî awayî be, weke nûnerê nû yê çîna rewşenbîriya wê serdemê, hewl daye kûr û civaka Kurd ber bi fikir û armancên pêşketinxwaz ve pal bide, hestê neteweyî û

<sup>18</sup> -Çavkaniya Berî , R. 19.

<sup>19</sup> -Çavkaniya Berî , R 19-48.

Kurdîniyê pêşbixe. Bi taybet jî piştî ku Mistefa Şewqî bi armanca xwendinê ji welat derdikeve, Komeleya Azadîxwazên derveyê welat li Stenbolê nas dike.<sup>20</sup>

Hem di warê cîhanî de û hem jî di warê fikir û dîtinên nîştîmanî de gelek tê gûhertin. Li ser meseleya Kurdan zêdetir dibe xwedî fikir û ramanên cûdatir. Lewra naveroka helbestên wî li gor wê demê, behsa hestekî Kurdewarî û nîştîmanperweriyê dike. Tevî ku Mistefa Şewqî derd, xemên civakû û paşketina civaka Kurdewarî çî bi helbest û çî jî bi nivîskî behs dikir, heta asta ku karî sedem û rêyên çareseriyê eşkere dikir. Di helbesteke xwe de behsa komkûjiya Sablaxê ya ji aliyê Rûsan ve hatî kirin dike û dibêje:

*Cebîn mînayî zêw, Kurdî huma, xall mişkî Tatarî*

*Şedeşil, çaw bi kel, rû sûre goll, terrar û eyyarî*

*Were ta şerhî ehwalî dillî xomit le bo bêjim*

*Were ta min be firmêskim bişom bot perdeyî tarî*

*Elîmûllah le paş teşrîf û çûnî to le (Sablaxê)*

*Weten wêran û mall sûtaw û kîjî bê lawe û xwên barî...*

*De nêw mêrgolekanda sûştî zerd û hellaley sûr...<sup>21</sup>*

yan

*Le bax û baxçeykanda bulbulî şeyda û pasarî*

*Be zulim û cewrî duşmin bû, beharyan zerde payîzêk*

*Le bê rehmî û dill sextî be baryan bar le lêw barî*

*Le axayan û şeraf û melayan kes nema ewro*

*Le ser enqazî mallyan xo dexwênin kund û bê arî*

*Lewey pêş min ke demgot ey birayan exletu be bê!*

<sup>20</sup> -Çavkaniya Berî , R 10-32.

<sup>21</sup> - Çavkaniya Berî , R. 21 Û 22/ 116 Û 117.

*Cefat fermû witeenet da ke Şewqî pûçe bazarî?*

*Ewê wextê eto hest û xirûrî husin û an bûwî...*

*Eto şa û min cewanêkî feqîr bûm rû beşir, şarî .<sup>22</sup>*

*Le tîjî agirî îşqî to zêhnim hênde mudrîk buwa*

*Ke ew ehwallekanim yek be yek dîbû be bêdarî.<sup>23</sup>*

Weke em dizanin di şerê yekemîn ê cîhanê gelek eşîret û malbatên Kurdistanê ketin di nava agirê şerek nedihat xwestin û neçarî de. Civaka Kurdî ya wê demê li ser sê eniyên cûda hatibû parvekirin. Eniyekê alîgirtiya Rûsya, aliyekê piştgiriya Osmaniyên hevpeymanê Elmanya dikirin û eniyek din jî li dijî herdu aliyan bû. Ango hem li dijî Rûs û hem jî li dijî Elmaniyan bû. Hinek şêx û xelîfeyên girêdayî rêbaza Nexşebendî, mînak; Şêx Hîsamedîn (Tewêle), Mewlana Mihemed Sadiqî Merzîng (Xelîfe û serpereştyarê xaneqaya Bûrhan piştî wefata Şêx)<sup>24</sup>

Eniya yekemîn ji hev xwaziya ligel Îslam û alîgirtiya ji bo Osmaniyên a li dijî hêzên dagirkeriya Rûsya fetwaya cîhadê didin, pêktê. Piraniya eşîret û malbatên girêdayî xaneqaya li Mûkiryan, tevlî şer û bûyeran dibin. Eniya duyemîn jî ango alîgirtiya Rûsya û li dijî Osmaniyên ji aliyê xaneqaya Şemzînan a bi rêbertiya Şêx Ebdûlqadirê Şemzînan ve.<sup>25</sup>

Eniya sêyemîn jî beşek ji serok eşîr, malbat û hakimên Mûkiryan bûn, yek ji navdartirîn serdarê wan şeran Qazî Fetahî Şehîde ku ji bo parastina bajarê Sablaxê, di şerekê de ji aliyê Rûsya ve tê kuştin. Beşek ji xizim û malbata wî jî dîl tên girtin.<sup>26</sup>

Elî Begê Heyderî di helbestekê de behsa vê yekê kiriye. Elbet di cihê xwe de ye ew yek jî bê gotin ku şer û rû bi rûbûna gelê Kurdistanê, çî di asta hêzên Rûs û çî

<sup>22</sup>- Hejar, *Allekok*, 1945 (1324 Hicrî). Çapxaney Tewrêz, R. 7-12.

<sup>23</sup>- Hejar, (1988). *Bo Kurdistan*, Çapa Çaremîn, Swêd, R. 314.

<sup>24</sup>-Cemal Nebez, Govara Nîştîman, R 22-79.

<sup>25</sup>-Hejar, (1988). *Bo Kurdistan*, Çapa Çaremîn, Swêd, R. 310-312.

<sup>26</sup>-Birwane: Cemal Nebez, Govara Nîştîman, R 23/80.

jî li asta hêza Osmaniyan, helwestek rast û nîştîmanperwerane bûn. Ji ber ku mirov çawa şîrove bike, şer, ev berxwedan û rû bi rûbûn ji bo parastina şeref, namûs, nasname û welat bû. Tevî ku ligel rewşa wê demê, eger eniyêke hevgerî û rêkûpêk çêbibûye; dibe ku telefûn kêmtir bûya û Tirkên Osmanî jî nekarîbûna bi vî awayî bi hêsanî ji hestê Îslamî yê gelê Kurd sîd wergire. Ji vê jî rûspiyên Mukiryên ên weke; Heme Xanî bAne, Mihemed Hûsên Xanî Serdar, Seyfedîn Xanî Sediz û Şêx Baba Seîdî Xewsabat (Bi xwe helbestvan bû) bigire û bi hêsanî wan darve bike.<sup>27</sup>

Armanc ji şîrovekirina vê behsê, destnîşan kirina wê xalê bû ku Mistefa Şewqî weke rewşenbîreke xwînger ê wê serdemê, gelek fikir û dîtinên wî yên derbarê şer û parastinê de hebin. Lê ev mirovê mezin ê di helbestê de bûyî armanc, zêdetir fikra min ji bo aliyê Qazî Fetah, guh nedaye yê. Piştî derketiye holê ku pêşbîniyên (texmînî) wî rast derketine. Li gor parçe helbestên liberdest, piraniya wan wê yekê îspat dikin ku Şewqî ji despêka destpêkirina şerê yekê li welat bû û piştî jî ber derve çûye. Heta li wî cihê ku bi zimanê Xezelî jî diaxive, soza nîştîman û wêneyên trajedîk bi çavê xwe dîtiye, kar li ser kiriye. Ji bilî yek-du helbestên wî, dibe ku hemû li derve hatibin nivîsandin. Ew di helbesteke 'Hesabî Hal Dekel Weten' de wiha dibêje:

*Xemlîwe le ser qebrî cewanan gull u lalle?*

*Ya sûrî xwêne ke billêy rengê alle*

*Pêş tabşî xurşîd, felek weqtî beharan,*

*Wek çaw le firmêskî mine, qereyî zalle*

*Ey badî seba, heste guzer ke be weten da*

*Pexşan bike ser erzî weten bonî gullalle!*

*Ba bêt û be teesîrî fisûnî nefesî to*

*Wek xunçe bipişkiwê demî ew Kurde ke lalle*

---

<sup>27</sup> -Birwane: Cemal Nebez, Govara Nîştîman, R 72-77

*Ba bê t û sibeynan elem u derdî şewî hecir*  
*Bêjê, ke lewey paş xewî me, mehzî weballe!*  
*Qehrî felek u cewrî reqîb u sitemî dost*  
*Ser nasyeyî pir şikenî kird be qeballe*  
*Çarit niye ewroke eto deste şikawî*  
*Bed mestiyî mey bû ke şika cam u piyalle*  
*Şewqî were lew xurbete maîl be weten be*  
*Bê xakî weten îzzetî to mehzî xeyalle..*  
*Bew kakollî reş rene! Kewa bozî fîraqe*  
*Ba ram bê le bot fezil u huner çûnke hellale*<sup>28</sup>

Eger mirov temaşe bike ev xezela Şewqî yek ji xezelên Kurdî yên herî ciwan û tejjî naveroke. Di heman demê de helbesta nîştîmanî ya herî giring e. Ez dikarim bi eşkere bêjim ku Şewqî bi wê helbestê û bi taybet bi gotina 'Beyta Çaremîn' hemû kol û valehiyên ku di warê helbesta nîştîmanî heta vê qonaxê tê dîtin tê dagirtin. Şewqî di helbetek din de bi hûrî sedema vê 'Lalî' û 'Dest şikestinê' ango nexwendina rewşa demê ye. Herwiha 'Şikandîna cam û piyaleyan' di çavê wan kesan de dibîne ku 'Dijminî' û 'Nîfaq' nehiştiye:

*Zimanî ême şîrene, hewarî ême rengîne*  
*Bella çûnke hemûman dujminîn zor seebe îdrakî*  
*Îfaqî me gunahêkî ezîme ca oballî wî*  
*Be gerden şêx u axa u mela u dest u mîswakî*<sup>29</sup>

<sup>28</sup> -Birwane: Beşa Yekem a Wê Behsê, Giringî Jimare 13, R 64.

<sup>29</sup> -Dîwanî Sîv El-Qidat, *Girdewkoyî*, Qazî Ehmedî, R 69.

Eger mirov bixwaze di derbarê helbest û pileya helbestvan Şewqî de li gor rewşa civakî, civaka Kurdewarî gotina dawiyê bike û bigihin encamek baş, divê mirov bibêje ku Şewqî yek ji kesên qonaxa rewşenbiriye. Zilm û zordariya dagirker û dijminên Kurd li aliyekê, paşketin û nexwendekariya civakê li aliyekî din li ser xebitiye. Lewra fikir û dîtinên neteweyî di hemû helbestên wî de tê dîtin. Ew di derbarê helbestê de ne tenê armancxwaze, belkî di pratîkê de jî zilamekî kar û tekoşer e. Şewqî berevajî helbestvanên Desteya Yekemîn a Mukiryar (Qonaxa Sofîgerî) xwediyê dengê resen ê serdama xwe ye. Bi zimanê rexneyî, serkonekirin û paldana hestê neteweyî dixwaze gelê xwe ber bi rêyek şaristanî, azadî û bexteweriyê ve bibe. Hinek caran dîrok jî berevajî proseya yasayên civakî, li dijî eniya xwe ya asayî derdike û ti kes di wê qonaxê de serederiyê lê nake.

Eger şaşitiyek nekêrhatî nebe, bê guman dîtinê berjewendîxwaze e. Dewletên nûjen di encama proseyek yasyên civakê de pêktê. Di nava de 'Mafê Jiyan', 'Mafê Welatiyan', hemû çîn û beşên cûr bi cûr ên civakî, li gor yasayan li berçav were girtin û mafê ti kesê nebe van diyardeyan bînpê bike. Vêca em bizanin gelo bi rastî hestê 'Îrangerî' û ew dewletên nûjen çavkaniya xwe ji kûderê girtin, çawa di dawiyê de rakirina Reza Şah li ser deshilatê nema? Weke eşereye piştî bi dawîbûna şer û bi taybet jî serkeftina Şoreşa Oktoberê û vekişîna hêzên Rûsya (Berî bi dawîhatina şer), hemû çarenivîsa Îranê ket destê dewleta Înglîstanê. Diyare Emrîka jî di bin re alîkar û berjewendîparêzê siyaseta İnglîstanê bû. Di vê yekê de guman nîne: "Nerazîbûnê ji bê enerjîtiya welat a di navbera salên 1919-21'an de, alîgirtiya li pêkhatina hikûmetek bihêz a navendî û li ser daxwaza reforman, Brîtaniyan zêdetir piştgiriya vê hevahengiyê kirin." Ew yek jî nayê înkâr kirin ku her weke "Jîrînskî li ser nexşeya giringiya enerjîya mûxtarê Brîtanya Sir Percy Lorain di derbarê anîna Rezaxan û hêskirina karî wî de, dibêje; ev Lorain bû îspat kir ku Brîtanya dest ji piştgiriya Şêx Xezelî berde, deshilata Rezaxan li ser bisepêne; ew Lorain bû Rezaxan têgihand ku serê nepejîrîne ligel hilweşîna qacaran û damezirandina malbatek nû nab.<sup>30</sup>

---

<sup>30</sup> -Şêx Xezelî, (1945 1324ê Hicrî). Hejar, *Allekok*, Çapxaneya Tewrêz, R. 7-12.

Ji ber ku "Li gor rewşa hundir û derve ya Îranê di wê serdemê de, divê mirov wisa dane ku tevî çî kesek wezîrê Mûxtarê Brîtanya li Tehranê bû, rayedarên Inglîstanê bi hêsanî nekarîn kesek weke Rezaxan bibînin ku bikare deshilat îspatkirî ya Îranê aram bikin. Gefê li berjewendiyên Inglîstanê nexwe, dewleta wî astengek be di navbera împeratoriya Inglîstan û Sovyetê de be, astengek be li ser rêya pêşveçûna Bulşevîzmê.<sup>31</sup>

Demekê Rezaxan li sala 1925'an bi navê 'Pehlewî' paşatiya Îranê jêre hat mîsoger kirin, ji bilî Teverga Simko ku çend salan dirêj bû, tevgerê giring û cihê tirsê nemabû bi alîkariya Inglîstanê nehatibe jinav birin. Lewra yek ji pêngavên giring ên ku pêwîst bû ji bo damezirandina 'Îrana Nû' û aramnca 'Referoman' bê avêtin, bihêzkirina artêş û xortkirina hizir, eşîr û neteweyên ne Faris. Reza Paşa bi sîdwergirtina ji qezenca nehatî ya petrol û behrewergirtina ji siyaset û amojgariyên Brîtaniyan karî hikûmet li tevayî Îranê û bi taybet jî li Kurdistanê ava bike. Diyarê "di vê derbarê de Reza Şah ji aliyê beşek zêde ya rewşenbîrên xwediyê nasnameya Iraqî ku di wê baweriyê de bûn hêz û eşîrên ji nijadê (Ne Faris) li ser nişê nû astengîn û piştgiriya wan kir. Ligel vê yekê jî Reza Şah ji despêkê ve ji bo jinavbirina hinek eşîrên xwediyê deshilat ji hêza leşkerî ya eşîrtiyê alîkarî wergirt, lê di demek kurt de hemû hatin tunekirin. Yan serokê wan winda kirin, girtin an jî tunekirin. Hinek çekdar kirin û hinek jî bi neçarî bi rêya amojgariyên 'Fêrkirin û barkirin' nasnameya borokratîk (îdarî) bi birana leşkeriya neçarî, guhertina ziman û cilûbergan hewl da ku wan bike beşek ji civaka Faris.<sup>32</sup>)

Bi kurtî her wekî nivîskar û lêkolînavê Îranê Şahrux Miskub dibêje: "Tenê rêyek ku hemû zanayên Îranî ji bo dermanê perîşaniyê li Îraê dîtine, dû rêyên tevlihev û yekalî bûn:

-Nasyonazîm di bîrdoziyê (îdeolojî) de;

-Dewletek bihêz û navendî, di meydana kiryarê de.<sup>33</sup>

---

<sup>31</sup> - Govara Kurdistan,(1324). 15'ê Sermayeza, (6'ê Dîsembera 1964) .

<sup>32</sup> - Rojnameya Kurdistan: Hêjmar 20, 8'ê Reşemiya 1324 (1964).

<sup>33</sup> - Rojnameya Kurdistan: Hêjmar 11,17'ê Rêbendanê 1324 (1964).



Dema guncandina naveroka herdu xalên vê siyasetê di peywendiyên ligel Kurdistanê de ji bilî zordariya civakî-siyasî û netewî-ferhengî (çandî) dijminiyek eşkere bû ji bo bi yekcarî neteweya kurd di nava ‘Hêvênê neteweya Îranî’ de bihelêne. Tevî ku Reza Şa di peywendiya ligel xala duyemîn de karî bi hikmê serdestî û hêza leşkerî aramiyek weke goristanê li Kurdistanê çêbike. Lê derbarê xala yekemîn de û tevî propagandiyek zêde ya bîrdozî, siyasî û ferhengî, nekarî Kurdan di çarçoveya ‘Hêvênê neteweya Îranî’ de bihelêne. Wekî rûspiyên kevin ên Mukiryar vedigêrin û dibêjin: “Kel be mû bend bû.” Kur û civaka Kurdistanê nekû serê xwe ji bo îdeolojiya nasyonalîzman Îrangerî ya şovenî û xwediye dewleta navendî şor (nizim) nekir, belkî derbarê hişyariya civakî û hestê netewî ve jî zêdetir pêşve çûn.

Tiştê peywendî bi helbest û helbestvan hebe, divê em bêjin tevî ku di wê qonaxê de bi awayek fermî zimanê Kurdî tê qedexekirin, helbesta Kurdî ya ku hem derbirîn li fikir û dîtinên nîştîmanî dikir, hem jî derbirîna nerazîbûna li dijî siyaseta jinavbirina ferhengî û zimanê Kurdî be, li ser helbestên helbestvanên Desteya Yekemîn a Mukiryarî (Qonaxa Sofîgerî) li ser rêya xwe berdewam kir. Bi eşkereyî mirov dikare bêje yek ji eniyên ku zimanê Kurdî heta astekê ji tunebûnê parastî, helbest bû. Di heman demê de çeka herî baş û hêsan a tekoşînê bû ji bo xelkên din jî bikarin bixwînin. Ev di demekê de ye ku li ser dergehê hemû dibistanan û rêveberiyar hatibû nivîsandin ku divê hûn bi Farisî (Mebest Kurdî qedexekirî) baxivin.<sup>34</sup>

Diyare di nava çîn û beşên Kurdistanê de çî bi neçarî û çî jî bi zorî, hinek kes hebûn piştê xwe dan ziman, wêje û helbesta Kurdî. Bi vî awayî hinekê heskirina ferhengî, heskirina ji bo helbest û wêjeya Kurdî kêmbû. Lê qonaxa damezirandina ‘Îrana Nû’ û hestê nasyonalîsta neteweya serdest a li ser hesabê tunekirina gelên ne Farisî, şiddet dihat bikaranîn. Bi heman awayî hestê netewiya Kurd jî weke polaya di nava xweliyê de agirê helbesta Kurdî geş dikir. Di sala 1313 (1934’ê zayînî) cejna hezar salî ya bi navê ‘Fîrdewsî’ damezirînerê Şahname, li Tehranê hat lidarxistin. Li Kurdistanê tevî deshilatdariya polîsan, ji aliyê hestiyar, helbestvan û welatparêzên Kurdistanê ve di mizgeft, xaneqa, dîwanxane û qehwexaneyên Kurdistanê de helbestên Kurdî dihatin xwendin. Bi vî awayî jî wêjeya Kurdî di nava gelê Kurd de

<sup>34</sup> - Govara Hellale, Hêjmar 1, Reşeme 1324, Çapxaneya Bokan, R 18.

pêşdikeve. Li vir jî di cihê xwe de ye ku li hinek cih û navendên ku di warê pêşvebirina helbest û zimanê Kurdî de nexşeyek berbiçav hebin û nehiştiye ev agir bê vemirandin. Em destnîşan bikin û hinekan weke mînak bênin:

Xaneqaya Şemsî Burhan

Xaneqaya Şemzînan li Mihabadê

Xaneqaya Zembîl

Dîwana Elîxanê Emîrî

Dîwana Mîrza Rehmetî Şafî li Mihabadê

Dadgeh û dîwanxaneya Qazî Elî û Qazî Mihemed

Tevî ku wê demê jî piraniya helbestvanên girêdayî van navendên civakî yên ayînî, her li ser şêwe û derbirîna kevin, helbest di gotin. Piştî deshilatdariya malbata Pehlewî, bi cih bûna dewleta navendî û propagandaya ji bo bîrdoziya Îranî û ‘Hêvênê netewiya Îranî’, di helbest û wêjeya Kurdî de jî kêr-zêde gelek awayên helwest, mûxalîfet û nerazîbûnên di çend bînpêkirinên mafê netewî û çandî, derdikevin. Hêdî-hêdî rêya ber bi awayek din ku heta duh piraniya helbestên qonaxa sofişgeriyê xwe jê diveşartin, tê xweş kirin. Bi vî awayî di wê serdema ku dengê azadiyê di qirikê de mabû, di helbestê Mûkiryana de bi ser xwe ve hat, dîtî û ramanên pêşketî û hestên netewî yên ji avê hatibûn bêpar kirin, di civaka Kurdî de cihê xwe digirin. Bi kurtî mirov dikare bêje, helbesta Mûkiryana weke awayê xwe berdewama heman şêwaza berê bû. Lê di warê kakil û naveroka xwe de hinek taybetmendiyên berbiçav di nav de dihatin dîtî ku mirov dikare di xalên jê de bigre ber çavan:

-Derbirîna sedemê paşketin, nexwendekarî û bindestiya gelê Kurd.

-Niwandin (temsîl) û derxistina zilm û tevî hikûmeta navendî, siyaseta dîrûyî û dijberiya Kurdî.

-Dengvedana bûyerên girîng ên Kurdistanê, weke dûbare vegûhestina hinek êl û eşîrên Kurd bi zorê, qedexekirina zimanê Kurdî, gûhertina awayê cilûbergên Kurdî, ferzîkirina şebqeya Pehlewî û hwd...

-Paldana civaka Kurdewarî, vejandin û rakêşana wan a jib o armancên netewî, azadî û serxwebûnê.

-Lome û serkûnekirina serok eşîr û taximên destçûyî (cerdevan, çaş) yên girêdayî dewleta navendî.

-Her bi vî awayî rexneyên tund û dijwar ên di kar û encamên dizî û neciwaniyên civakî dibin sedemê bextreşî, hevrikî û malwêranîyê...

Diyare helbest weke fenomeke civakî, peywendiyên rasterast lige asta xwendekarî, pileya şaristanî û eniya ber bi pêşveçûna civakê heye. Lewra helbesta Mukiryani wê demê jî dengê rewşa civaka xwe bû. Egera heta dûh helbesta Kurdî derbirîna awayê fikir û dîtinên îrfanî û îdealîstî (Xwedaxwazî û Însanewazî) giştî û pîralî bû. Ji vir û pê ve derbarê qonaxa realîstî, taybetî û yekaliye ku hem rewşa netewî di navde diyar dibe û hem jî çînî. Di nava helbestên Mûkiryani de, mînak mirov dikare di nava dû helbestên navdar û mezin ên weke, Mela Marfî Kokeyî (1945), mela û gotar xwênê mizgefta Şah Derwêşî yê bajarê Mihabadê. Herwiha Ebûlhesenî Seyfî Qazî (1944) yê weke Seyf El-Qidat, mamostayê helbestên Mûkiryani, herdu jî weke mafê cemsêrî aliyê çînî û netewî ya helbestên Mûkiryani. Mele Marfî Kokeyî tevî ku di gotina helbesta civakî û rexneyî xwediyê destek bilind bû, bi başî civaka Kurdî jî nas dikir. Sedemê paşketin, nexwendekarî û çavlideriya gelê Kurdî bi awayek şarezayî destnîşan kiriye. Mele Marfî di helbestekê de vê armancê bi zelalî derdixe hole û wiha dibêje:

*Ey milletî mezlum û feqîr û destwestan*

*Bê ilim û mearîf wekû enfalî debistan*

*Ey bê beş û bê behre le azadî û şadî*

*Mehrum û eqet kewtû wekû kiwêr û nequstan*

*Bo bêxeberin dewrî cehalet superî bû*

*Bênûre çiray camîetyî badeperistan...*

*Şaîr were qurbanî qerîhe û qelemînim bim*

*Bînûse le bo Akre û Amêd û Loristan*

*"Bawendî" û "Sencabî" û afaqî cinûbî*

*Bo Kurdî perakende le germên û le kiwêstan*

*Bo mîlletî bêçareyî bê sahîb û serdar*

*Be xisus tebeqey Kurdî Êraq û Ecemistan*

*Bo atye fikrêkî biken fîrset ewro*

*Ta key debne çaw le ber u aletî destan*<sup>35</sup>

Ma heta kengê kîn û nerazîbûna li dijî dijminên Kurd demekê zêdetir bilind dibe. Kureke Mela Marif yê bi nave Mele Elî li sala 1942'an di şerekî ligel cendirmeyên girêdayî Reza Xan li navçeya Bokan tê kuştin.<sup>36</sup>

Herweke di helbestên Kokeyî de derdikeve, kariye bi çeka ziman û helbestê li hemberî zilm û serweriya rayedarên derve û xwemalî yên li derdora Reza Şah bibe. Her weke em dizanin Reza Şah piştî li sala 1925'an tê li ser textê padîşahiyê, qanûna sicîl werdigire. Bi çûyîna leşkeriya neçarî û piştî jî li sala 1927'an yasaya cil gûherînê bi çavlêkirina li welatên Ewropa û hevsengiya ligel siyaseta Mistefa Kemal Atatürk li Tirkîyê, ji bi bi cih anîna vê fermanê derdixe. Rayedarên girêdayî rejîmê li tevayî Kurdistanê, bi awayek pir zordarî tevî xem û nexweşiyên netewî yên ligel gelê Kurd reftar dike. Kar digihe wê astê ku 'Mendîla melayan, şedeya lawan, kefiya jinan û pantolê li ber wan dişewitand...' Eger bê gotin Hêmin ji despêkê ve ji dergehê helbestê çûye di nava cîhana siyasî de. Yan jî ji dergehê siyasî hatiye di nava cîhana helbest û wêjeyê de. Dîtinê wî li ser herdû aliyan çêdibe. Ji ber ku helbest ji despêkê ve hest, heskirin, huner, karîna helbestvanan, giyanê netewî û nîştîmanî pêşve buriye. Despêkê li ser destê heval û mamostayên xwe, piştî jî ji ber civak û rêxistinên siyasî yên di nav de bûyî endam, jîyan û çalakiya xwe jêre veqetandiye. Ji ber vê yekê jî ne tiştek seyre (ecêb) ku armanc û naveroka siyasî bibe navik û naveroka seretayî ya piraniya helbest û berhemên helbestvan. Li vir pirsyarek

<sup>35</sup>- Rojnameya Kurdistan, Hêjmar 20, 8'ê Reşemey, 1324 (1946).

<sup>36</sup>- Rojnameya Kurdistan, Hêjmar 20, 8'ê Remeşiyê, 1946 .

peyda dibe, ew jî eve; gelo helbestvan di çêkiirna helbestên ku naveroka wan siyasî, heta çî astê serkeftin bidestxistiye? Eger mirov bi kûrtî li bersiva vê pirsê bigere, divê balê bikişînin li ser hinek rexnegirên di vê derbarê de. Hinek di wê baweriyê de Hêmin di encama tevlîhevkirina helbest û siyasî de, di afirandina berhemên baş de ne serkeftî bû.<sup>37</sup>

Di dû dîtînen cûda û dijî hev de jî hinek dîtînen wekhev hene. Ya yekemîn dibêje, sedema serekî ya paşketin û serneketina helbestvan di wê yekê de ye ku nekariye huner û siyasetê ji hev cûda bike. Dîtina duyemîn jî di wê baweriyê de ye ku helbestvan nekariye bi başî hûner û siyasetê têkelfî hev bike! Ji bo şîrovekirina vê meseleyê, pêwîste berî her tiştê balê bikişînin ser wê astê ku helbest hest, heskirin, xurûş û manek mirovahiyê ye; di mejî û derûniya mirovek hest nazik û di rewşek taybet de belav dibe. Ji ber vê yekê jî asayîye ku hemû helbest û berhemên helbestvanekê, herwiha her helbestvanek ne di heman ast û pileyê de bin. Ango nizmî û bilindî, hêz û bêhêziya asta dahênan dibin tişt (eşya), dibin berhemek ji bo helbest û berhemên helbestvanan. Ji ber ku helbest ne ew tiştê ku ji kargehekê derbikeve, weke hev bin û bi heman çawaniyên bîna nivîsandin. Lewra helbest û berhemên helbestvanên me bi taybet jî helbestên ku naveroka wan siyasî ne, para xwe ji van yasayan digirin. Heta Hêmin bi xwe jî li ser wê rastiyê mikûr hatiye ku ji hinek helbestên siyasî bi gazind û neraziye.<sup>38</sup>

Bi taybet jî yên di serdema ciwanî û yên nû dest bi nivîsandina helbestan dikin, heta yên li pişt xwe jê bê hesab kirin û nexistine di nava dîwan û pirtûkên çapkirî de.<sup>39</sup>

Hêmin di encama ezmûnek dûr û dirêj de gihişt wê baweriyê ku dema helbestek siyasî dinivîsîne, fikrê hizbayetî û bîrdozî jî di nava berhemên wî de cihê xwe digire. Ev zererê digihîne berhemên hûnerî û lewaz dike.<sup>40</sup>

---

<sup>37</sup>- Emîr Hesênûr, (1987) *Nameyek*, Govara Mamostayê Kurd, Hêjmar: 5/4, Zivistana, R 39.

<sup>38</sup> -Hêmin. (1977)*Ezmûnî Şairim*, Paşkoy Rojnamey Iraq, Hêjmar 10, Bexda, R 4.

<sup>39</sup>- Hêriş, (30.08.2000 ) *Nameyekî Taybetî*, Swêd:

<sup>40</sup> - Osman Îbrahîm Ranyeyî, (28, 05.06.1997). *Yadek Le Bîrewerî Mamosta Hêmin*, Roj. Birayetî Paşgoy Huner û Edeb, Hêjmar:.

Bi vî awayî îtirafê bi vê rastiyê nake ku helbestên Hêmin hemû ne weke hev in, bilindî û nizmî di nav de heye... Hinek helbestên wê demê yên Hêmin heta astekê weke dirûşmeyan in.<sup>41</sup>

Lê bihaneyên vê jî hene. Ji ber ku derfet, şert û mercên wê demê ew yek dihat xwestin û erkê helbestvan paldana giyanê xebat û şoreşgerên ciwan ên neteweya xwe bûn. Ligel vê yekê jî di helbestên Hêmin de berhemên ciwan û bihêz hene ku tam û giringiya huner û fikrê xwe piştî bi dehan sal parastiye û di dîroka wêjeya Kurdî de weke nemir mane. Li vir tîrêjên ronahiyê ber bi aliyekê biriqîna helbestên Hêmin ve digire û îspat dike ku taybetmendiyê wê wêjeyê ku helbestê di nav de serkeftin bidestxistiyê û pê navdar jî bûye. Ev mijara helbestê ku weke firkek siyasî tê bi nav kirin, hunerê helbest, ciwanî, dilgiranî û nazikiya xeyala helbestvan ligel bawerî, fikir û baldariya siyasî heye. “Hêmin di helbestê de xwediyê şêweyê xwe yê tayet e. Weke em dizanin cara yekemîn di wêjeya Farisî de Senayî Xeznewî û Ciwacey Kirmanî awayên arifaneya evîndariyê nivîsandine. Hafizê li ser şopa wan diçû, bi tevîkirina heskirin û îrfan şêwazeke xwe yê taybet pêktîne. Di nava Kurdan de jî Hêmin karek bi vî awayî dike. Berî Hêmin hem helbestên me yên siyasî û hem jî yên evîndariyê hebûn. Lê mamosta Hêmin herdu diyarde bi hev ve girêda û awayê xwe yê taybet afirand.<sup>42</sup>

Hêmin ciwanî, heskirin û evîniya mirov ji evîna nîştîman û neteweya xwe cûda nake. Lewra em dibînin di despêka hemû helbestên wî de, bi dildarî û hestê germ ê heskirinê destpê dike. Hêdî-hêdî ber bi naverok û dawiyê ve, naverokek nîştîmanî û şoreşgerî heye.<sup>43</sup>

Hêmin bi vî karî kariye ku vehunadiya lîrika Kurdî di çarçoveya romantîkî de tenê wijdanê derbas bike û awayek nû yê tejî heskirina siyasî, nîştîmanî, netewî û civakî ya realîzmê pê bexşîye. Vêca bi tevîhevîkirina hestê nîştîmanperwerî û

---

<sup>41</sup> - Yunis Rezayî. *Hêmin Şairêk Le Meydanî Sûtan û Herman de*, Kengire Bizirgedaşit... R877.

<sup>42</sup> - Yûnis Reayî, Çavkaniya Berê, R. 179 .

<sup>43</sup> - Mistefa Merufî, (1998). *Yadêk Le Mamosta Hêmin*, Rojnameya Kurdistan, Hêjmar, 258, R21.

ciwanperestiya di helbestê de weke coreke xezela siyasî tê danîn. Mirov dikare bêje, ev hûnerê û li gor bejna wî hatiye danîn.<sup>44</sup>

Ev diyarde bi awayekî din ji aliyê hinek helbestvanên Kurd vet ê dîtin. Mînak; Goran, Pîremêrd û Dildar hatine, soz û heskirina nîştîman û neteweya xwe dîrî mînaqîşeyan wesfê xweza û dîmenên ciwan ên Kurdistanê di helbestên xwe de vegotine.<sup>45</sup>

Ji bo ronîkirina vê armancê, di cihê xwe de ye Hêmin ji bo çend mînakên di helbesta lîrîkî ya siyasî yên Hêmin behs bikin: Hêmin di helbesta ‘Şewgarî Tenyayî’ de wiha dibêje:

*Stem karî minî dîr xistotewe lewyare şîrînem*

*Îtir min çon rîqî zorim le azar û sitem nabê*

*Ewê ser berze lem wêrane da tûşî xem û derde*

*Çiyay serkeş bibîte qet serî bê hewir û tem nabê*

*(Tarîk û Rûn 218)*

Li vir armanca stemkariyê, zilm û zordariya rejîma paşatiya Pehlewiye bûye sedemê qutbûna Hêminê helbestvan ê dil nasik, mirov ji yar û dilxwaza xwe. Weke Şîrîna xwe û di wêneyê Ferhad de çiya kûn kiriye. Êdî Hêmin çawa li hemberî zordar û stemkaran ranabe? Li aliyê din jî dikeve dava derdê dîrî û qutbûna ji warê bav û kalên xwe, yar û heskiriyan xwe. Ji vir û pê ve nûqî mij û dûkela şewitîn û qirçeqirçê dibe. Piştî her bi peywendiya ligel vê manewiya ku helbestvan di cihekî din de dibêje:

<sup>44</sup> - Hesenî Danîşqer (Hêwir), *Le Yadi Çiwardemîn Salî Koçî Diwayî Hêmenê Şair De*, Rojnameya Birayetî, Paşgoya Edeb û Hûner, Hêjmar: 173, 21.04.2000.

<sup>45</sup> -Kiwêstanî Cemal Sela, Çavkaniya Berê, R. 296.

*Ciyabûnewet derde, bellam toş dezanî tamî niye*

*Ziwan û şew rawî dillardarî, raz û niyazî be dilî*

*(Tarîk û Rûn, R. 168)*

Ev dibe kevneşopiyek û helbestvan di nava çarçoveya behsek heskirî de, nîştîman û gelê xwe naxe di nav de. Timî li ber dergehê xeyalî de amade ne. Ligel her dîmenekê dillardarî, heskirin û evîniyê de, dîmenekî xebat û fedekarî têne bîra xwe. Mûjangê (Birjang) tîj ê dîlbera xwe, serê rima dijmin tine bîra xwe. Di helbesta ‘Yadgarî Şîrîn’ de wiha behs tê kirin:

*Çawekem çawî reşî to afetî giyanî mine*

*Giyaneke birjangê tîjit nûke rimbê dujmine*

*Şîrî destî şêrî allaye biro rakşaweket*

*Cergê lawêkê hejarê Kurdî wird pê bincine*

*Berjenet sêdareye ke ziyet tenafe zûbe dey*

*Bîxe estoy min ke Kurdim Kurd beşî xinkandine*

*(Tarîk û Rûn, R. 69)*

“Dema Hêmin bejna heskiriya xwe dişibîne sêdareyê û pirça wê jî dişîne tayê (benê) sêdareyê. Heta niha kîjan helbestvanî şibandinek bi vî awayî kiriye? Bi



baweriya min ev şibandina mamosta di wê yekê de ye ku di dîroka neteweya me de ben, sêdare û xeniqandin rolê xwe leyîstiyê.<sup>46</sup>

Mijara wijdan û heskirin gelek caran ligel Hêmin di dem û cihekê de li ser heman vehûnandiyekê, dû wêneyên wê yên cûda hene. Weke dû cîhanên ji hev cûda ne. Lê şewitîna herduyan jî tevî ku wêne û serpehatî cûda jî bin, li vir di vehûnandiya ‘Mû Napisênim’ de emê ji hemû gulên wî gûlekê hilibijêrin:

*Eger çî royî, qet naçê le dayim*

*Dekem yadit be yadî towe şadim*

*Ke barget bo hewartêk na ezîzim*

*Şikar estûndegî tawilî miradim*

*(Tarîk û Rûn, R. 129)*

Rûyê derve yê vê vehûnandiyê soza bêhempayî ya hest û wijdana helbestvan astengiyan nîşan dide. Heta niha jî ji ber bîranîna wê zindî maye, naverok û amajeya rast a wê vehûnandiyê vedigere ji bo bûyerekê. Ji bo karaset û bûyerên nexweş ên siyasiya Kurde. Ew ji rûxana Komara Kurdistanê ya li sala 1946’an a bi darvekirina Pêşengê wê ye. Ji ber wê yekê jî koçka hêviyên helbestvan dimire û weke tabûteke mirinê lê tê. Ew hêvî pîroz û mezin e, di derûn û wijdana helbestvan de timî zindiye. Helbesta wî jî weke hestê paqij û bi soz a helbestvan, rastbêj û rewan derdikeve.

Di vehûnandiya ‘Sinûr’ de helbestvan behsa meseleyek siyasî dike. Ew jî sînorê ji aliyê dijminan ve hatî kişandin, weke sûraya Çînê ji her aliyekê ve welatê wan hatiye parçe parçe kirin. Helbestvan vê meseleya siyasî dike sedem û bingehê serhildan û dirûstbûna rewşek mirovî ku aramî ji bîr kiribû:

*Ey ew kesey detperestim û lêm winî*

---

<sup>46</sup> -Burhan Şasiwar, (31.05.1975). *Hêminî Mehabadî Şaire Nawarderekey Kurdistan*, Rojnameya Hawkarî, Hêjmar: 220,.

*To xuda nî to xoşewîstî minî*

*LE asman nî tawêt ranega destim*

*Le Qaf nî kalley asinit bo helbestim*

*Toy le min win kird û minî le to dûr*

*Ew bistokey dujmin nawî na sinûr*

*(Tarîk û Rûn, R. 184)*

Vêca em bizanin gotina Kurdiya şîrîn a timî li ser lêvên Hêmin, ev jî reyeke Kurdayetiyê ye. Vêca bi berhevî ligel lêvên şekir û nazdar ên yaran, gelo kîjan zêdetir dilgir û şîrîn in.

*Bellê to kîjî, nazdarî, lebarî*

*Minîş pîrêkê zurhan û dizêwim*

*Bellam şîrîntire lew şekre lêwe*

*Wişey Kurdî ke hell derê le lêwim*

*(Tarîk û Rûn, R. 193)*

Heta ezmûnên helbestvan ber bi pêş ve diçe û derfetên wê çêbibe, heta derbas dibe asta şewitîn û hejandina helbestvan bi agirê van herdû evîndaran ve ber bi pêş ve diçe. “Dildarî û siyasî, di cihekê bi coş dike û bi hev ve diguncî... Gelek caran jin û heskirin dike mijar û mijarê jî dibe ser heskirinê. Cihê wan digûherîne, heta herdu dibin yek û bi tundî bi hev ve tîr girêdan.”<sup>47</sup>

Helbestvan gelek caran di helbestên xwe di beşdarîkirina di nerm û hişkiyê de, heskirin û fikra siyasî, heskirin û dilgiriya xebat, heskirina jin û xweşiya azadiyê..

---

<sup>47</sup> - Mihemed Ferîq Hisên, *Hêmin û Bunî Xerîbî, Beşa Yekemîn*, Govara Beyan, Hêjmar 65, Tebaxa 1980, R12.

Sembolek afirandiye, ev simbol di huner û jiyana helbestvan a di çarçoveya 'Heskirin û Azadiyê' de hev digire. Dema mirov temaşeyî vê simbol û heskirina helbestvan dike, mirov ji du aliyên ve dibîne. Ji aliyekê ve hest bi hest bi dildarî, xweşî, xwesteka nazik û rast dike; li aliyê din jî fikrek bilind û pîroz a mirov dostî tê dît. Divê ew yek jî bê gotin ku rengvêdana awayê siyasetê di wêjeyê de nabe bi ti awayekî di wê wateyê de bi hişkî werbigire ku ligel piraniya xelkê wisa be. Gelek encamên nayên pejirandin ên weke derew, fêl û bê barî; belkî berevajî siyaset di wê meydana de hêmayeke ji bo gelek nîrx û bihayên pîroz ên mirovayê. Ew jî rûmet û serweriye di warê parastina azadî û serbestiya mirov, rizgarbûna gel, netewe û nîştîmanê ji çewisandinê... Ango aliyekî erênî yê meseleya me ji bo gihiştina armanca aliyê nîştîmanxwazî, gelperwerî û fedekariyê. Vêca ji bo kesek ku bi sedan sale welatê wî parçe bûyî û hatî dagir kirin, hevxiwîn û hevniştîmanên wî dîl, bîndest û girtî bin, ji her mafekî xwezayî û azadiya siyasî, aborî, civakî û ferhengî bê par be... Alîgirî û siyaset bi çî kiriyarekê be, xwediyê çî fikir û ramanê be, çî bi xwestek û hêvî bin, ew ne karek kêrhatiyê belkî erkek mirovî yê pîroz û pêwîst e. Tû bêjî kesek hebe, nemaze ew kes helbestvan, rewşenbîr û ciwanek bi wefa be. Herçendî di asta meseleyên xak, gel û avhewayê nîştîman û nexweşiyên gelê xwe bê minet be? Piştî jî eger "Dîroknaş û rexnegirên lîberal ên weje li Rojava li beramberî zaraveyê helbesta siyasî aloziyek hebin, ligel wan armanca siyasî, fikra bîrdozî û bernameya hizbî li ser aliyên bîngê wêjeyê de ku ew jî estetîk e deshilat be... Ew jî ji ber wê yekê bû pîrgirêkên maf û çarenivîsa netewî nebûn. Eger hebe jî, di wêneyê mijarên netewî li Rojhilata Navîn bi giştî û bi taybet jî ji aliyê gelê Kurd ve nebû."<sup>48</sup>

Piştî ji bo meseleya temaşekirina siyaseta helbestvan û rewşenbîrên Kurd jî di berhemê wan ê wêjeyî de, em rayeya Markîz tînin û bi başî behsa rewşa ligel me ye. Bi taybet jî dema dibêje: "Ne tiştek hêsanê dema li Amerîkaya Latîn bijî û berevajî siyasetê bî. Ji ber ku rastî û siyaset bi hev ve girêdayîne. Dema piştigiriya te dike,

---

<sup>48</sup> - Dr. Marûf Xeznedar(1999), *Karîgerî Bîrî Neteweyî Le Geşesendî Kurte Çîrokî Kurdî Kurdistaniîraq* (Pêşekî). Ebdûllah Ezîz Xalid, Çapa Yekem: Çapxaneya Zankoy Selahedîn, Hewlêr, R4-5.

nekû ji bo îltizamî û hizbayetî, belkî 33-ji bo beşdarîkirina bi awayek ji awayan. Herwiha siyaset timî nayê wateya îltîzamiya hizbayetiyê! <sup>49)</sup>

Helbestvanê me Hêmin jî di dîtina vê rastî û mîratiya dîroka neteweya xwe heman rêbaza siyasetê bikaraniye, vêca bi kiryarî, bi fikir, bi helbest, jiyan û hest ve çûye himbêza siyasetê. Siyasetek ku qedera çend û çûyîna yek bi yek a ciwanên gelê xwe ya bi berdewamiya vê sedeyê ye. Ji bo li ser şopa vê rêbazê keda Ferhad kêşaye. Penaberî û derbiderî dîtiye, rastî bi hezaran belayên nexweş hatiye. Hêmin ji bo gelê Kurd cihê serbilindiyê ye. Di rêza helbestvanên navdar ên wê serdemê yên weke; Nazim Hîkmet, Lorkan, Eragon û Bablo de dihat hêjmartin... Ti tiştêk ji wan kêmtir nîne. “Mafê Hêmin bû, bi heq û rêbazek rast û rewan a xwe dîtibû. Helbestvan û nivîskarê neteweyek ku di dawiya sedsala 20’an de, ji hemû mafek neteweyî hatibe bêpar hiştin;, helbestvanê neteweya wî di bin stema neteweyetî û metirsiya jinavçûnê de be, çawa dikare... Di cîhana bê fikir, bêbawerî û was wasiyê de bigere û eger bixwe?<sup>50</sup>

Tevî vê yekê jî Hêmin bi başî peyama hûner, helbest û wêjeyê fêhm kiriye ku ew jî bingehê îstatîstîkê ye. Lê dema dûkelek tejî, bablîsokek cîhan û derdora xwe girtibe û ji bo pêşî lê bigirin, neçar dibe helbestê bike hewar, bang û bike amraza parastin û rû bi rû bûnê. Ji vir û pê ve li ber çavan eşkere ye ku bi dû dîtinên cûda temaşeyî peyama helbest û hunerê kiriye. Reng dayeyê û helbestvan û vehûnandiya ‘Perî Şîr’ de wiha gotiye:

*Şîrêk wek xunawey baran*

*Şîrêk wek sirtey dildaran*

*Wek areqey henyey ciwanan*

*Wek dille xurpey cê jiwanan*

*Le awî kanî rewşantir*

---

<sup>49</sup>- Kemal Mistefa Marûf, (1998). *Siyaset Le Hunrawey Niwê da*, Govara Nûserî Niwê, Gorava Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Liqê Hewlêr, Hêjmar 2: Adara, R 4.

<sup>50</sup>- Kerîmî Hisabî, (1987). *Yadî Hêmin*, Le Blawkirawekanî (Serdemî Niwê), Swêd, R14.

*Le pelke zêrîne ciwantir*  
*Şîrêk wek sêberî birjang*  
*Wekû xermaney dewrî mang*  
*Rêktir le gerî reşbelek*  
*Xoştir le xizmijînî kirmek*  
*Le kuşînî destî do xoştir*  
*Le Meke û Eyero xoştir*  
*Wek nîglî çawî xewallû*  
*Belşan dabênê tezû*  
*Wek şerab bigerê le xwên*  
*Xem rewên bê û neşe bizwîn*  
*Şîrêk weke deryay bê bin*  
*Germtir le bawêşî jin!*  
*(Tarîk û Rûn, R. 158)*

Ji bo ciwanekî Kurd ê vê serdemê, weke pêla rûbarê Zê ku bi xûre xûr tê û bêheddar bû, peyama helbestvan her di vê çarçoveyê de teng namîne. Tevlî pêlên jiyana û meydanên xebat û tekoşînê dibe. Ew jî dibe ev helbest;

*Şeerêk sirûdî şadî bî*  
*Şeerêk dengî azadî bê*  
*Şeerêk mizgênî necat bê*  
*Şewçeley korî xebat bê*  
*Şeerêk req bê, riq bê, qîn bê*  
*Gir bê, billêse bê tîn bê*

*Bilêsey gulley helmet bê*

*Şepollî riqî millet bê*

*Bişkênî derkî bastîlan*

*Azad bika koyle û dîlan*

*Nirkey sîngî kirêkar bê*

*Alay şorişî cotyar bê*

*Her wek girrî agirî newroz*

*Remzî azadî bê û pîroz*

*Şeerêk hem tund bê hem wirdbê*

*Yanî şeerî ew roy Kurd bê*

*(TaArîk û Rûn, R. 159)*

Hêmin erkê helbestvan û nivîskarên wê demê wisa destnîşan kiriye ku ‘Di xebata rizgarîxwaziya gelan de timî helbestvan, nivîskar, rewşenbîr, pêşeng û nexşekî giring û berçav hebû. Erkekî mezin û pîroz bi cih anîn... Yekem hawara rizgariya neteweya me, di gewriya helbestvanek mezin de derketiye derve û hatiye nav, li çiyayên bilind û zehmet ên Kurdistan deng vedaye... Helbestvan û nivîskarên me yê welatparêz di qonaxa me ya îro de, ji bo vê erka pîroz bi cih bînin dive di nava gel de bijîn... Ji berê de agehdariya wan ji rewşa jîyan û xebata wan hebe. Hest bi xem û nexweşiyên wan bike. Îlhamê ji jiyana wan a rojane werbigirin. Ligel ezmûn û zanistên xwe beşdar bibin. Bikin cihê nivîs û helbestên xwe.’<sup>51</sup>

Hêmin di wê peyam û dîtinê de temaşeyî helbest, helbestvan û nivîskarên Kurd kiriye. Bi xwe jî ji gihandina vê erk û peyamê dûr neketiye.

---

<sup>51</sup>- Hêmin, (1974). *Erkî Netewayetî Îmroy Şaîr û Nûserekeman*, Rojnamey Kurdistan, Organî Komîtey Navendî HDK, Desember, R30 .

Helbestên ‘Nasorî Teşena’ weke ji navê jî diyare helbestek cûdabûn, tarîkbûna Hêmin e. Wek bi xwe ji ‘Kûderê ber bi kûderê ve’ bale dikişîne ser. Ev helbest berhemê salan ê dilsozî û nexweşiyên piştî derbeya ewlekariya namzedkirina Hizba Demokrat û xanenişînbûna (teqawîtbûn) wê li sala 1338’an. Mirina hevlekî wê yê nêzî li derve 1342’an, mirina bavê wî li sala 1344’an û koça dawî ya dayîka wî li sala 1346’an. Lê di vê navberê de wefata bavê wî weke Hêmin bi xwe dibêje, bandorekî pir mezin li ser dihêle. Weke Hêmin di vê pexşanê de wiha behsa bavê xwe dike: “Dema xebera mirina bavê min dan min, ez nikarim behsa bandora wê yekê li ser hestên xwe behs bikim... Ez tenê dikarim vê yekê bêjim, mirina bav derdekî giran e. Ger mirov di her temenekê de bavê wî bimire, hest bi êtîmiyê dike.” Piştî jî dema digihe wefata dayîka wî, dîsa emê vegere astengiyên li pêşiya wefata bavê xwe û wiha dinivîsîne: “Bavê min zilamek li ser xwe û zalim bû. Qet rû nedida zarokên xwe... Lê ji min re pir ecêbe mirina bavê min gelek zêde bandor li min kir û ez hîn zêdetir perîşan kirim.”<sup>52</sup>

Di rastiya xwe de mirina bav ji bo Hêmin ne tenê mirina bavê wî yê rast û babolojîk e. Belkî mirina bavê wî sembolîke, di heman de hêmaya xesana wî ye. Ew pile û cihek taybet heye. Yan jî weke zana dibêjin, bav bi amadebûna peywendiyên dûalî yê dayîk û zarok, zarok ji zextê hesûdî û rewşa derûnî rizgar dike. Ji bo cîhanek ber bi civakî ve rê xweş dike. Bi vî awayî bav dibe nûnerê civakê.<sup>53</sup>

Ango kombûna van nexweşiyane û ji hemûyan girîngtir jî wefata bavê wî, Hêmin ji rastiya tekûziya civakî dûr dixê û pal dide bikeve di nava tecrîtê de: “Hêmin ji jiyana rast direve, naxwaze nexweşiyên ku rastî wî hatine bipejirîne û tehemûla wan nake. Hêza wê yekê nîne jiyana xwe bigûherîne û ti rê nîne xwe dûr bixe. Dixwaze xwe ji vê yekê dûr bixe. Bi alîkarî û vexwarina meyê berê xwe bide cîhanek xeyalî.” (Hêmin, 444) Ev dîtînen nivîskarê gotara ‘Helbestvanê Gel’ a derbarê helbesta ‘Nasorî Teşena’ ku corekî fikirandinê ye. Xwediyê heman taybetiyane ku Norotrop Firay weke taybetmendiya trajediya dûr ketin (terikandin) û xwe dizîna ji

<sup>52</sup> - Hêmin , 59 .

<sup>53</sup>- Unis Dîlin. *Ferhenga Miqedemat Îstîlahat Riwanawîlakanî*, Werger: Mehdî Parsa Û Mehdî Refîe, Tehran: Gam Nû. 1386, R171-172.

tekûzî mijarê jê werdigire. Ango ya di vê helbestê de derdikeve hole, dengê kesayetiyekî opozisyoniye ku hewldan û şoreşa xwe weke têkçûyê dibîne. Di nebûna dema niha, nikare cihekê ji bo dema borî û siberojê diyar bike. Vê rewşê weke fezayek dojehê têne ber çavê xwe. Şahideke ji bo deshilatdarbûna li ser xwezayî, li ser çarenivîs û ketina di nav demboriyek bê vejer de:

*Çon nebem bo mey u meyxane pena tê geyyum*

*Lew wilate hemû şit zore, benî adem kem*<sup>54</sup>

Ji vir û pêve hewara xwe digihîne mey û meyxaneyê. Xwe dûr girtina helbestvanek ku xwe bi pîr dibîne, sûd jê hatiye wertin. Ev rewşa îrfanî/rojaneye ku Lokac dibêje, corekî revîna ji mirin, tirsandin, nerastîbûna mirin û bi heman awayî dûrketina ji wê yekê ku agehdariya wî ji wî nemîne.<sup>55</sup>

Ango ev bihaneya ku bi nîşandana xwe ya weke kalîtiyê û di heman demê de weke tekane firsenda tekoşîna zexta çarenivîs û destgirtîbûna li hemberî xwezayê tê ber çavê wî. Bi wateya awayek ‘Bezandin-Li hemberî kesekê serkeftin’ û ‘Xiyamet’ ligel sûjeya trajediyê tê ku li gor gotina Fraw weke paradoya trajediya tekûziyê rol dileyîze.<sup>56</sup>

An jî bi wateyekî din êsîrbûna sûje di fantaziya xal, xet û ciwaniyê de digihe encama êsîrbûnek dû qatî zivistanê ku tekane derfeta xwe derbazkirina ji sûje zevt dike. Ev jî di demekê de rûyê pîrî, xwe weke bi xebatê ve mijûl kiriye, sûje hatiye û sûje xwe di wan fantaziyan de veşartîye:

*Êste bo çarî xemim goşeyî meyxaneye cêm*

*Min ke rojêk demwîst mîlletekem bê xem kem*<sup>57</sup>

Êdî sûje hest bi çalakî û kiryanan nake:

---

<sup>54</sup>- (Hêmin , R174 .

<sup>55</sup>- Parkînsun, *Feslnameya Erxinûn*, , Werger: Hale Lacurdî, Locak û Camie Şinasî Edebiyat , Jimare 9 Û 20, Cî, 1375, R 226.

<sup>56</sup>-Firaw, Eblahan Zima: *Sîrî Dir Trajedyaya Wilyam Şekspîr*, Werger: Helen Ewliya Niya, Esfehan: Firda , 1388, R 121.

<sup>57</sup> - *Hêmin* , R 174 .



*Ta nerûxawe, billa pir bê le xoşî û mestî*

*Taze pêy nawêemin hodeyî xom mehkem kem (Heman)*

Tiştêk nekirin” tê wateya destjêberdana ji kiryar û ne ‘Karê şaşkirinê’ bi awayekî bibîrbêne ‘Tawanê despêk.’<sup>58</sup>

Weke Fray dibêje: “Ti tiştêk ji wê yekê cûdatir nîne ku jiyana mirov tevli rewşekî ayronîk û hewlên herî mezin ên ji bo wefadarî û qehremaniyê tenê ew rewş ji ayronîk (îronîk) ji bo trajediyê berz dike.”<sup>59</sup>

Lê eger rewşa mirovatiyê bi awayê rewşek bê dawî di îronîk û trajediyê de bînîn ber çavê xwe, wê demê ev jiyana wê weke ‘Jiyaneke dojhê derbikeve û di nav kesayetiyên xiyaneke nêzî ferdan dibin.’ Ev jî heman nêzîkbûne ku di beyta dawî ya vê helbestê de weke daxwaza hevaltiya dînan û hewara xwe gihandina ber çiyayê zehmet. Lê li wir jî corekî tirsê yê xwezayê astenge ji bo agehdarî, bi xiyaneke û zêdetir wek hêviyekê xwe li ser îspat dike:

*Şerebaye le çiyakan û hewa tûşe dena*

*Wekû şêtan demwîst rû le çiyay astem kem (Hêmin: 174)*

Bi awayekê giştî ev helwest wêneyekî tarî yê helbestvan Hêmin e. Hevdem ligel bêhêvîbûnên dinava civak û dil lerizîna helbestan bi awayekî xwe wêrankirin û dengê helbestvan heta astekî ferd nizim dibe. Ferdek xwe serkeftî nîşan dide û xayîn. Êvareke payîzê ji despêkê ve wêneyê wê coreke ji hev qûtbûn û bê exlaqîya şikandina keçîniya bûkek nû û berhemê salên derbideriya Hêmin li Bexda. Weke bi xwe di hevdişînek ligel Ferhad Şakelî de wê yekê îtiraf dike ku yek ji helbestên ku ‘Bêhna xerîbiyê bi temamî li ser bûyî deshilatdar.’ (Hêmin: 748) Behsa nebûna hevzimanê wî, bêzarî û hewl nedana ji bo fêrbûna zimanê Erebi û bi berdewam bi awayekî nostalojî xerîbi girê dide. Bi bîranînên netew, bîranînek weke hewlek ji bo

<sup>58</sup>- Orjinal Sin Firay. Eblahan Ziman: *Sîrî Dr Trajedyay Willyam Şekspîr*, Werger: Hellen Ewliya Niya, Esfahan: Firda, , Nurtrup, 1388, R 111.

<sup>59</sup>- Orjinal Sin Firay. Eblahan Ziman: *Sîrî Dr Trajedyay Willyam Şekspîr*, Werger: Hellen Ewliya Niya, Esfahan: Firda, Nurtrup, 1388 , R 111.

derbazbûna demên borî têne ber çavê xwe. Ev xerîbî û nostalgî di heman demê de tê wateya jihevtenegihiştin û ‘Keda xwesteka bê encamîbûnê’ ku Kondra weke wateyek diyar û nostalgîjî derdixe.<sup>60</sup>

Di rastiye de amadebûna herdu beşên bîranîn û dengê navxwe yê di vê helbestê de tê wateya derbasbûna helbesta Hêmin ji tarîkbûna ji bo qonaxek kiryaritir û nêzîkbûna rihê ji tekûziyê. Lê di wê demê de jî xerîbî û diltengiyên weke astengek li pêşiya çarenivîsa helbestvan tê ber çavan. Giraniyê pêşkêşî xwezayekê dike ku di beşên despêkê yên vê helbestê wesfa wê hatiye kirin. Li gor wateya Fray, em dikarin weke “Derketina Yasa” bi wateya “Yasaya Xwezayî” û xerîbiya xwezayê ku ji derveyî vîna (îrade) mirove, bi hev ve girê bidîn. Ev jî weke Fray dibêje, şîroveya qonaxa drama û piştî hilweşîna qehreman.<sup>61</sup> Di heman demê de cihê nebûna yasaya tekuzî pexşîna bav digire:

*Pelle hewrêkî çillkine*

*Girtî sêçêkî asman*

*Gellay zerdî darêk werî*

*Ziryan birdî bere û neman*

Yan

*Pasarî serdarî kollan*

*Fire û cîkyan lê bira*

*Qel firî.. firî.. Ta win bû*

*Her rûreşî xoy pê bira (Hêmin: 262)*

Xwezaya deshilatdar, nehevseng û aciz, di berdewamiyê de weke rastiya jiyane rût derdikeve ku dijwariya derûnî di her parçeyeke helbestê de, ji wan jî

<sup>60</sup> - Kondra, *Cehalet*, Werger, Ariş Hicarî, Tehran: Karwan, Milan. 1380, R 14-16.

<sup>61</sup> - Parkînon, *Lukaç û Camie Şanasî Edebiyat*, Werger: Hale Lacurdî, Fisişname-Erxinun, Jimare: 9-10, C. 1375, R 87.

dilwariya kolber (Kesên bi ser milê xwe karê bazirganiyê dikin) û Mam Hacıyê nimêjker, Nazdarê Çarşew Beser, Rûteley Bedfer, qijîn û hwd... Îspatkirina hewldanek ji bo hevgirtina tiştên nehevseng û di wê rêyê de çêkirina diyalogan ligel çarenivîsek eşkere ye.

Lê berî destpêkirina vê diyalogê, bi xwe hevsengî bi rêya çûna di nava şer heta asta dengê derûnî û bêzariyê dadikeve xwar û dengê vê carê ji yê takeksî zêdetir be. Dengê teji tirs, helbestane û her ev yek jî wisa dike ku ev helbest ji tarîfî û dûrperestiya helbestvan dûr bixe. Vegotina vê helbestê her ji destpêkê ve li pey coreke tekûziya di xwezayê de digere. Lê dema em dibînin ku deshilata xwezayê ji çarenivîsê wê mezintir be, heware xwe digihîne bîranîn û bi rêya derbaskirina dema borî cihekê ji bo hevgirtina bîranîn û çaverêtiyê rûdine:

*Çawim le asman birî*

*Dillim hîndey dîke gîra*

*Gelêk bîrewerî konim*

*Le pîr hatnewe be bîra (Hêmin: 264)*

Tevî ku di heman demê de qehreman hewla herî kêr û mûmkîn ji bo sazkirina gerdûna tekûziya şitekan dide, tenê bi bê exlaqîya tiştan ve girê dide. Bi pîlanî çarenivîs ku bi awayek berhemê reqabeta navbera wefaya ferdî û wefaya bi kom a li hemberî kesan û cîhana hawêz:

*Nana narom, meley dekem*

*Le nêw deryay mendî xeyall*

*Dahênzaw rû girj, tûre*

*Dil pîr tase, mêşk betal (Hêmin: 265)*

Li heman milmilanê hinek caran ji zexta trajediyê derdikeve û vegotinek ayronîk li derdora hest û fikir de digre nava xwe. Li vir ‘Hes û Fikirîn’ weke Frayd dibêje, dibin hevrikiyên hev ên serekî. Katarsîsî jî zalbûnê li ser trajediyê, tekûzî û di heman demê de dijminên vî awayî di trajediyê ne.<sup>62</sup>

Bi vî awayî trajediya tolhildanê li cihê kiryarê zêdetir hewara xwe digihêne ziman, gotin û ji bo kamilbûnê pêwîstî bi dengê ye ku di vê helbestê weke dengê ha ha ha û hevdem lerizîn û nerim li pişt serê wî (Dû wêneyên diwariya deng) bersiva pirsyarên helbestvan ên derbarê ‘Çima?’ de dide. Di derbarê çalakkirinê de jî ev cor di hilibijartina ziman û deng de, weke yek ji taybetmendiyên trajediya tolvekirinê, zêdetir weke gelek kupleyen kar pê tê kirin. Ew jî di nava xwe de dewlimend in û di rastiya xwe de hatine pêşbînîkirin, weke aliyê çaverêkirî vegêrandî. Ev taybetmendiye li gor gotina Nîçe di rêya şîngêrana Loreasay Dînososî gav avêtiye di nava trajediya Yûnanî de. Di vê helbestê de fezayek (valehî, boşayî) ji bo dûrxistina helbest ji fantaziya takekesî û derfeteke xemilandinê diafirîne, ji bo dema borî bi dema niha ve girê bide. Di heman demê de amadebûna di vê helbestê de weke vegêrandin û bersivekê derdikeve. Ev jî di kiryarê de bi pirsan ji bo encamên kar rê xweş dike û hestê daxwazek bîrdozî (îdeolojî) ku zêdetir di warê dramatîk de çûye:

*Gotim: “Kewabû, aşna!*

*Beşî ême le nêw çûne”*

*Gotî: “Na, na, dûr binware...”*

*Dûr binware.. Aso rûne...” (Hêmin: 269)*

Helbesta ‘Bargey Yaran-Hêlîna Evîndaran’ wek mînak ji bo trajediya tekûzî bi awayek helbesta malavayiya Hêmin û ghiştina encama qehremaniya helbestê ye. Di vê helbestê de Mîtosî trajîk pêngavê ber bi romans û ayroniyê ve diavêje. Dîtina

---

<sup>62</sup> -Fray, Nurtrup. *Tehlîl Neqil*, Tercume, Salih His3enî, Tehran: Nîlofer, 1377, R 79.

ayronî ji bo mergê ya di vê helbestê de hevsenga dîtina romantîk a di qehremanxwazî û deshilatdarbûna li ser merge. Helbestvan bi alîkariya dîtina yekem, gav bi gav cewherê trajîk û hest dibe. Di heman demê de bi xwe girêdana bi dîtina duyemîn, ‘Romantîkbûn’ qehreman di bin ronahiya sehirbaziya bi cîhana derve, dibe navbeynkarek ji bo taqetanîna cîhanê ya di rêya pejirandina çarenivîsa rû bi rûbûna ligel merg di fezayek bi kom de:

*Bargeyan têkewe pêça û berê bûn yaran*

*Le dinê wa be tenê paşî ewan min çîbkem? (Hêmin: 341)*

Ev xal biriqîna ji xwesteka aliyê romantîk û ayronî di vê helbestê de weke xweza û çarenivîs an jî bîranî û çaverêkirin. Heman xal pêngav avêtina ber bi nava trajediya tekuziye ku weke hatî gotin ku di encama berxwedan, nirxandina biryar û vîna ‘Hebûna ji ziman’ fêm kiriye. Zarok bi devê pîrî ve girê dide û li wir jî bi neslê bi kom ve girê dide:

*Aw nebû ew demî Hêmin melewanî Kurd bû*

*Aw şukir zore werin zû melewan min çîbkem? (Hêmin: 341)*

Karîn wergirtina ji vê redîfa helbestê weke dest şuştina ji hewl û ‘Nekirina ti karekê’ di derbarê mana berevajî ‘Ne tiştêkirina’ trajediya tarîk bûnê ye. Ango li vir tiştê nekirin tê wateya xwe derbaskirina ji karê zêdeyiyê tê û bi awayekê îlhameke ji ‘Karê pêwîst hatiye kirin’ û yê din jî ne mecaziya qehreman an jî vegêrand. Pêwîste kesek din li cihê wî rûne û milê xwe bide ber astengiyên dahatûyê û di heman demê rêzgirtina li ziman weke pênaseya trajediyêye. Ev mijar dema ciwantir derdikeve ku name guhertinên wan salên Hêmin ligel Hejarê Helbestvan dixwîne. Hêmin li wir Hejar bi wê yekê lome dike ku çaverêkirinek ne jîre li neteweyên hatine serê wan eye û jêre dibêje: “Ew netew zilm lê hatiye kirin û her ewqas ji dest tê. Lê eger karîban wê her tişt kiriban.. Kê ez û tû neçar kirin ku em bibin helbestvan? Me bi xwe ev yek kiriye..” (Hêmin: 375) Ev agehdarî diyonosoyiye bi awayek ku bang dide ji bo vegehan xweza û deshilatdarbûna li ser îradeyê ye. Xemilandina wê hêviyê ye ku jiyan bi piştgiriya îradeyê dikare rewşek ber bi ronahiyê ve biafirîne:

*Sirweat xençe gullî baxî edeb pişkûtin*

*Ba xewanî gere ke taze cewan min çîbkem? (Hêmin: 341)*

Di vê helbestê de êdî şikestin û merg (mirin) ne tromaya helbestvan in. Belkî hinek bûyerin ku li cihê bûyerên din ên rojane û bi heman awayî xweza nekû li pêşiyê dibe asteng, belkî hewldaneke ji bo xizmetkirina hêzên ji bo îradeya qehremaniyê. Ev cîhana nû ku mirov dikare weke cîhana keyfxweşiya diyonososî bi nav bike.

## 2-2-2- AŞTÎXWAZÎ Û BIRAYETÎ

Hêmin gelek ji neteweya xwe hez dikir, ji wê yekê zêdetir jî neteweya xwe diparast. Lê kîna wî li hemberî ti neteweyekê jî nebû. Di hemû dîwanên Hêmin de helbestek ku behsa neteweyek din bi xirabî bike, yan jî Kurd ji neteweyek din mezintir nîşan bike, nîne. Diyardeyek ku mixabin li dîwana gelek helbestvanên Kurd de derdikeve berçavan. Nekû her ewe, belkî mirov dostî yek ji xwezaya taybetmendiyên helbesta Hêmin e. Hêmin gelên din ên Îranê weke dostê gelê Kurd dibîne, di xebat û tekoşînê de weke dost bi nav dike. Di helbesta ‘Kurd û Azerbeycanê’ de wiha dibêje:

*Kurd û Azerbeycanî herdu dawayan rewaye*

*Her bijîn û payedarbê yekyetî em dû biraye*

Yan

*Taku nesrîtewe firmêskî hetubarî hejar*

*Ta hetîw lêwî weku xunce nepişkwîn, degrîm*

*(Tarîk Û Rûn: 80)*

### 2-2-3- PÊŞEWA QAZÎ

Hêmin gelek caran behsa Pêşewa Qazî (Qazî Mihemed) dike. Di helbestên wî de diyare ku çend bi nirx ji gelê Kurd hez dike. Gelek ji Pêşewa hez dike, ji ber ku:

*Zana bû Kurdperwer bû Pêşewa bû, Raber bû*

Lewra Pêşewa mezin dibîne, ji ber ku:

*Her Kurd nebû beşer bû Xemî xellkî leber bû*

Di rêbendana sala 1324 hizcîr (1947) ku Komara Kurdistanê hat damezirandin, Hêmin wiha got: “Ew sal behare bo ême zistan” Yan jî di helbesta ‘Rojî Xoşî-Roja Xweşiyê’ de dibêje:

*Ger çî zistane befir dapoşî ewro gişt willat*

*Xakî pakî ême xemlîwe wekû baxî êrem*

Lê temenê Komara Kurdistanê kêmtirî salekê bû. Tevgera gelê Kurd li Îranê her weke tevgera seranserî Îranê şok bû. Hêmin di helbesta ‘Roja Reş’ de rastî bê hêvîbûnê tê, weke ku civaka gelê Kurdistanê rastî bêhêvîbûnê hatî.

*Be fîro çû xebatman*

*Dagîr kirawe willatman*

*Têperî rojî hatman*

*Rûxa koşkî awatman*

*Le piyawî aza û serkeş*

*Le zehmetkêşî bê beş*

*Axnirawe kunereş*

*Nabînî kesî rû geş*

Bi taybet Hêmin bi şehîdbûna Pêşewa Qazî Mihemed dax kir. Hem dost û mamostayê xwe wîndî kir û hem jî Pêşewayê serokomar.

*Le çîwarçîray Mehabad*

*Le kangay bîrî azad*

*Destî reşî îstîbdat*

*Çeqandî darî bêdad*

*Le katî nîweşew da*

*Le cengey şîrin xew da*

*Kira karî narewa*

*Le da dira Pêşewa*

Her di wan salan de Hêmin ji ber xebatên xwe yên borî rastî nexweşî û xeman dibe. Ji bo demekê ji welat derdikeve. Diyare rewşa siyasî bandor li helbestên Hemin kiriye. Di helbesta ‘Babirdelle’ de wiha dibêje:

*Bizane to ewî ehlî huer bê*

*Debê ya des be ser, ya derbeder bê*

*Hunermî û jîyanî xoş mehalle*

*Hunermend renceroye, jînî talle*

*Minîş babirdelley ber gêjelûkem*

*Demêk lew qûllke tawêk lew çilûkem*

*Minîş zordarî pirzey lê birîwim*

*Minîş bedkarî biwarî lê tenîwim*

Yan jî di ‘Firmêska Geş-Rondika Geş’ de li gor gotina wî, di rewşek pir xirab û ne xweş de nivîsandiye û wiha dibêje:

*Kuştîmî û şeş xanî ommêdî le min girtin herîf*

*More heldawêm û bêhûde be hîway dû şeşim*



#### 2-2-4- AXA Û REÎD

Hêmin ji despêkê ve di nava neteweya xwe de bi çavekê temaşeyî hemû çîn û pêkhateyan nekiriye û nake jî. Di helbesta xwe ya navdar bi navê ‘Deylêm û Bê bakim-Ezê bêjim û bê minetim’ de wiha dibêje:

*Ewey axa bê bêkare*

*Cebûn û qels û lasare*

*Dizî û rêgirtinî kare*

*Emin deylêm û bê bakim*

*Le şerm û şûreyî mirdim*

*Be xom min çon billêm Kurd im*

*Ke axa abrûyî birdim*

*Emin deyllêm û bê bakim*

*Hêmin di helbesta ‘Areq û Tîn’ de bi awayek ciwan û bi zimanê cotyaran behsa nixê karê cotyaran ê ji bo civakê dike. Çewisandina cotyaran nîşan dide û derdixe holê ku mirovê zehmetkêş li gel wî gelek dihat heskirin:*

*Min cûtyarim, min cûtyarim*

*Min legell hetaw hawkarim*

*Min be areq û ew be tîn*

*Daman riştûwe binaxey jîn*

*Baskî min û tîşkî newî*

*Bijîw destênîn le zewî*

*Ger cûtyar areq nerêjê*

*Ger hetaw tîşk nawêjê*

*Daniştûy naw koşk û qella*

*Dexon nanî gellagella?*

Di helbestên wî de bi hêsanî derdikeve holê ku Hêmin şarezaiyekî zêde li ser jiyana zehmetkêşên Kurdistanê û bi taybet jî ya cotyaran heye. Ji wê yekê zêdetir jî xwe heta astekê beşdarî vê jiyane bûye. Bi xwe wiha dibêje: “Min bi başî karê kasibkariyê dikir û zû fêrî çandiniyê bûm.”

Felsefeya jiyana Hêmin ne ewe ku rûne, ji dûr ve temaşeyî jiyana û xebata gel bike, ji bo xwe yan jî ji bo gel helbestan bêje. Hêmin ewe yek pejirandiyê ku erkê helbesta helbestvanek ku zilm lê hatibe kirin lihev bide, ne tenê vehûnandiyên xweza û ciwanîyê. Helbestvan berî her tiştî mirove, miroveke xwediyê hestek nazîke û zû dixê tevgerê. Çawa helbestvan bi wateya rast û gotinê dikare li beramberî hejarî, kûrbûn û bê beşîya gelê xwe bê alî be? Di navbera rastî û derewan de, di navbera Ahuremezda û Ehrîman de, di navbera heq û neheqiyê de rastiya hilnebijêre, di aliyê Ehrîman de neçe û heqiyê neparêze?

Lewra Hêmin temaşeyî tiştê nake û nikare weke temaşevan bimîne. Bi hemû hêza xwe, bi helbest û nivîsîna pêngavan derbasî nava meydana xebatê dibe û ji bo ber bi asoyek zelal ve biçe. Heta rizgarbûnê alîkariya gelê xwe dike. Hêminê helbestvan ji aramiya xebatkar nayê cûdakirin.

*Rolley Kurdîm fêrî hewraz û lêjim*

*Ta zor birom, ziyatir areq birêjim*

*Kurt tir debê rêgay dûre û dirêjim*

*Derom berew aso, berew asoy rûn*

*Derom derom, ta tiropkî rizgar bûn*

Ceribandina salên dirêj ên xebata Hêmin îspat kir ku xebat dût û dirêje, evrazî û nişîviyên wî hene, serkeftin û şikestin di nav de hene. Lê Hêmin berxwedêr e.

*Min perwerdey bin sêberî eşkewtim*

*Gelêk caran le çallawî reş kewtim*

*Hatme derê, hedam neda, nesrewtim*

*Derom berew aso, berew asoy rûn*

*Derom derom, ta tiropkî rizgarbûn*

Evrazî û nişîviyên jiyân û xebata gel di helbestên Hêmin de gelek bi ciwanî diyar dibin. Ji dema dest bi nivîsandin û gotina helbestan kirî heta niha, helbestên Hêmin neynika dibistanên gelê Kurd e. Li sala 1945'an Hêmin pêşwaziyê li Partiya Demokrata Kurdistanê dîke û dibêje:

*Le sayey Hizbî Dêmkatî xoman*

*Le baldarî têperî ewroke pêro*

*Nema dax û pejare û matem û xem*

*Zemanî helperîn û bezme îmro*

Gelek helbestên din jî yê weke 'Giryana Nîweşew' û 'Arezuy Firîn' her nîşana bêhêvîbûna helbestvan û reva ji rastiya jiyana tehle. Li sala 1325 heta 1330'ê hicrî, di serdama paşvekişîna tevgera gelê Kurd û hemû gelên Îranê ye. Li sala 1332'ê hicrî dema asoya xebatê zelaltir bû, Hêmin di helbesta 'Awatî Berz-Hêviya Bilind' de carek din tê meydana xebatê. Hêviya ji bo xebata gel zêdetir dibe û dixwaze bi helbesta xwe tevlî vê xebatê bibe:

*Fêrî zor dersî bekelk û başî kirdîn têşkan*

*Ca bibîne raperîn û şorişî emcarî Kurd*

*Wa girîngî beyanî ciwanî azadî beşer*

*Rojî rûnake nemawe zulmetî şewgarî Kurd*

*Ew zemanê şîrney ême perey degraêtewe*

*Nadrê çîdî kitêb û defterî eşaarî Kurd*

Qonaxek nû di jiyana gele û helbestvan de destpê dike. Dema paşvekişînê bi dawî dibe û gelê Kurd xwe ji bo xebata siberojê amade dike. Nasnameya Hizba Demokrata Kurdistanê ku bi awayek veşartî têdikoşiya, roj bi roj di nava civaka gelê Kurdistanê de zêdetir dibe. Tevger kirina ber bi evraz çûyînê ve heta rojên gelawêja 1332'an berdewam dibin. Ji 25'ê gelawêjê heta roja nexweş a 28'ê gelawêjê gel li bajarê Mihabadê deshilatdariyê dike. Ji roja 25'ê gelawêjê ve gelê Mihabadê ligel biçûk û mezinan ligel Hêmin ji bo cara yekemîn çend sal di civînek çend hezar kesî de helbestekê dibêje û dike hewar:

*Biro ey şahî xayîn Bexda nîwey rêyet bê*

Wê demê, serdema nîv demokrasiyê jî zêde berdewam nake. Dewrana reş a piştî derbeyê destpê dike û Hêminê helbestvan carek din rastî bêhêvîbûnê dibe. Di helbesta 'Tûreyî-Acizbûn' de wiha dibêje:

*Lew willate kesêk le xew rabê*

*Beşî çarereşî û xem û şîne*

*Têgeyîştinim îlacî derdî min*

*Mestî û şêtî û nezanîne*

Yan jî di helbesta 'Çarenûsî Şaîr' de wiha dibêje:

*Dezanî boçî min hênde perêşan û xefetbarim*

*Le bazarî jiyana xeyrî huner nîme çî sermaye*

*Legel çarereşî û dûrebeşî û negbet debê hellkem*

*Le mêje çarenûsî şaîranî Kurd herwaye*

Ew acizbûn û reşiya çarenivîsa helbestvan di helbestên din de derdikeve ber çavan û heta sala 1340 (1959'ê zayînî) her wiha berdewam e. Di helbesta 'Gilêney Şaîr' de wiha dibêje:

*Eger xemanî umrim êstekane pakî ba bîba*

*Be ergî to mûçurkîşim bedilldaneye, ba bîba*

*Hemû umrî ebed têyda niye xoşî demêk mestî*

*Xidir awî heyatî bo çî bû? Fêrî şerabî ba*

Di helbesta ‘Nasorî Teşan’ de reva ji jiyana rastî, ji wê rastiya tehl a ku helbestvan tûş bûyî û nawaze bipejirîne, bi temamî diyare ku hêza wê yekê nîne bikare jiyane bigûherîne. Rê nîne ku xwe dûr bixe, dixwaze bireve û bi rêya meyê (meşrûb) berê xwe bide cîhanek xeyalî:

*Çon nebem bo mey û meyxane pena, têgeyum*

*Lew willae hemû şit zore benî adem kem*

*Şerebaye le çiyakan û hewa tûşe denya*

*Wekû şêtan demwîst rû le çiyay estem kem*

Di navbera salên 1366-47’ê hicrî ku raperîna çekdarî li Kurdistana Îranê serî hilda de, herçendî Hêmin beşdar nebûye; lê ligel wê raperînê dijiya. Baweriya wî bi xebata gel dihat û baweriya wî bihêztir e. Ji bo şehîdên wê raperîn û serhildanê digiriya. Lê helbestên wî tejjî hêvî û daxwazên ji bo serkeftin û nîştîmanperweriyê ne, wan ji bo tekoşînê pal dide. Hêmin bixwaze nexwaze, dîsan û vê carê ji bo heta dawiyê di nava meydana xebatê de ye:

*Bo şehîdek ke gewzîwe le nêw xwên degrîm*

*Bo hevalêkî ke çû bêserû bê şiwên degrîm*

*Ta be destî perî azadî le ser gorê şehîd*

*Gulle şillêre le gişt layekî eroyên degrîm*

Êdî bêhna bêhêvîbûnê ji helbestên Hêmin nayên. Çend sale li Kurdistan Îranê qonaxekî din di xebata gelê Kurdistanê de destpê kiriye, qonaxek ku cihê hêviya gelê Kurd e. Hêmin jî helbestvanê biwefa yê gelê Kurd, hem di pêkanî û hem jî di derbirîna wê hêviyê de beşdar bûye. Di helbestên ‘Meterêzî Şeref’, ‘Şengebêrî’,

‘Amêzî Jin’, Tiropkî Rizgarî’, ‘Şepolî Tolle’, ‘Şew û Şeytan’, ‘Gaw û Gerdûn’, ‘Karwanî Xebat’ û di ‘Deskewtî Xebat’ de helbestên civakî û şoreşgerî çî di warê awa de gihandiyê pileyek bilind ku gelek kê helbestvanên Kurd ghiştineyê. Hêmin amadeye ji bo ghiştina vê hêviyê xwe jî feda bike:

*Xom desûtênim heta bezmî xelk roşin bikem*

*Kê lerêy xela wekû şair desûtê, şem nebê?*

Despêkê helbestên Hêmin di bin bandora du eniyên wêjeyî (edebî) de bûn. Weke hemû helbestên helbestvanên Kurdî yên di serdema 30-40 salên berî niha, bandora wêjeya Farisî di van helbestan de diyar e. Piraniya helbestên wî helbestên erûzîne, giranî û qafiyeya wan ligel destûra helbesta Farisiye. Li aliyekî din jî helbestên helbestvanên Kurd ên weke Nalî ku bi xwe di bin bandora helbestên klasîk ên Farisî de bû, bandor li helbestên Hêmin jî kiriye. Lewa despêkê Hêmin helbestên xwe bi awayê xezel, qesîde û hinek caran jî bi awayê dû beytî û yên din nivîsandiyê. Hêmin niha jî car caran vedigere ser awayê klasîkî û hinek helbestên wî yên nû jî her bi wî awayî hatine nivîsandin. Ji wan jî yên weke; ‘Awatî Berz’, ‘Gillêney Şair’, ‘Deskewtî Xebat’ û hwd... Hêmin di van helbestan de destekî bilind ye. Helbestên wî hêsanin, bi zimanek ciwan û bi wateya xwe dewlimend in.

Piştî demek ku despêka helbest gotinê, Hêmin hêdî-hêdî vedigere ser awayê wêjeya orjînal a Kurdî. Xwe ji qafiye û giraniya helbestên klasîkî rizgar dike û helbestên wî weke besteyên Kurdî ne. Di wê besteya ku helbestvan hemû rojê li gund dibihîse, besteyek ku çarçoveya wê ji bo dariştina helbesta Kurdî zêdetir destdayiye. Zimanê Kurdî ji tengbûn û nexweşiyên rizgar dike, weke rûbarekê lê dike ku ber bi deryayek bê sinor ve diçe. Gelek caran dema mirov helbestên Hêmin dixwîne, stran tê bîra mirov. Wisa diyare ku di hilibijartina helbestên bi vî awayî tê gotin de Hêmin bê bandor nehiştiye. Di van helbestên ku Hêmin digihe gimika (lutke) wejeya Kurdî, bi rastî wêjeya Kurdî pêşdixe.

Hêmin helbestvanek realîste, realîzma rexnegirtinê di naveroka helbestên Hêmin de bi awayek baş derdikeve holê. Hêmin barê herî giring û bingehe xweza, jiyana û mirovatiyê bi çavekî rexnegirane behs dike û civakê ji bo ber bi pêşveçûnê bal dide. Hêmin gelek caran di hinek helbestên xwe de nêzî naturalîzmê dibe, tişt

dibîne behs dike, bi çavê rexnegirî temaşeyî xweza yan jî civakê nake. Herwisa bizane ku dixwaze tabloyekî xwezayê bikêşe û bixe ber çavan. Lê helbestên wisa kêm in, wisa diyare ku agehdariya wî jî jê heye ku ji realîzmê dûr ketiye. Zû natûralîzmê ber dide û vedigere li ser realîzmê ku bingehê naveroka helbestên wî ye. Ew natûralîzm bi taybetî di ‘Bihara Kurdistan’, ‘Lebîrim Meke’ û çend helbestên din de behsa xwe dike. Di helbestên Hêmin de rolekî giring ê jinê heye. Ciwaniya jinê îlhamê dide helbestvan. Tevayî dîwana wî wê rastiyê derdixe ku tevî xweza, jiyana û xebata gel, jina Hêmin wî helbest gotinê pal dide. Helbestên Hêmin li ser jinê mînaka helbesta bilind a Kurdî ne. Di helbesta ‘Kîjî Ladê-Keça Gundî’ de wiha ji keça Kurd re dibêje:

*Lacangit wekû gizîngî tawê*

*Her bo xoy ciwane tîf tîfey nawê*

*Kolmeket wekû gulaley geşe*

*Bê sûrmeş çawe mesteket reşe*

*Wekû firmêskî aşiq rûnakî*

*Wekû awingî beyanî pakî*

Ew tabloya ku ‘Le bîrim meke-Mîn ji bîr neke’ de wêneyê jinê xîz dike, bi rastî gelek ciwan û bedewe. Herwiha di ‘Perî Şêir’, ‘Şengebêrî’ û gelek helbestên din de Hêmin mamostayê xwe di vehûnandiyana de ji bo jinê îspat dike. Lê jin ji bo Hêmin ne tenê çavkaniya îlhamê ye. Hêmin ji bo rizgariya jina Kurd xebatê dimeşîne. Di ‘Yadgarî Şîrîn’ de wiha dibêje:

*Lade çarşewî reşit ba derkewê kulmey geşit*

*Çu le qernî bîstema zor eybe ew rû girtine*

Hêmin dixwaze ji berî her tiştê xwediyê mafên xwe yê mirovî be û gelek caran jî li dijî zordarî û bêrêziya li hemberî jinê dengê xwe bilind dike. Hêmin gelek ji jinê hez dike, pîroz di dît û weke nirxê hemû ciwaniyên xwezayê dibîne. Lê ligel

Hêmin xebata ji bo rizgariya gel, ji bo azadiya civakên gel ji jinê heskirîtir e. Di helbesta ‘Amêzî Jin-Himbêza Jinê’ de wiha dibêje:

*Belê sexte, yekcar sexte*

*Dûrî le jin, namiradî*

*Bellam le jn xoşewîsttir*

*Le lay in etoyî azadî*

Zimanê Hêmin Kurdiyêk sade û ciwan e. Peyvên biyanî pir kêr in û peyvên çêkirî di nav de hene. Zimane wî zimanê civakên gelê Kurdistanê ye, lê Hêmin ê bi xwe ji Mûkiryana, teesûbî bikarnaniye. Li gor zaraveyê Mukiryana helbestan nabêje. Bi taybet jî di van çend salên dawiyê de zimanê Hêmin mînaka bilind a zimanê wêjeya Kurdî ye û bandora wî li ser zimanê standartê Kurdî hebû. Zimanê Hêmin gelek sade û zelale, hem wêje û hem jî nivîsîna Kurdî jêre gelek xweş bû û hemû kesên nexwendekar jî be jê fêr dibe.

*Hezar xozgem be xot şiwane*

*Ke bew mange şewe ciwane*

*Daniştûy le rijd û helldêr*

*Pence, debzêwî le bilwêr*

*Degel tebîet hawdemî*

*Şadî, bekeyfî, bê xemî*

Beharî Kurdistan’ ferhengêk biçûk a zimanê Kurdiye. Bi taybet ji bo kesên timî li bajar jiyana e û agehdariya wan zêde li ser jiyana gundan neyîn. Tabloyek rast a bi zimanekî dewlimend û bêhempa dixê ber çavan. Ew helbest û gelek helbestên din behsa xweza û jiyana gund dikan. Ji bo şaristaniyê gelek gotinên nehatine bihîstin di nav de heye, gelek caran xwendekar pê matmayî dimînin. Neçar dibin ku dibêje zimanê Kurdî çend dewlimende û mixabin xizmeta wê nehatiye kirin. Dîwana Hêmin helbestên weke; ‘Beharî Kurdistan’ bi rastî jî ferhengêk dewlimend a Kurdiye.



*Şeerî Hêmin le teşbîhî ciwan axinrawe*

*Xoşewîstî goşekey teyayî her ejnokeme*

*Boye roj û şew weha girtûmete nêw bawêşim*

Di 'Şengebêrî' de encama helbestê eve:

*Zorî nemawe bêteber, nemamî hewll û xebatim*

*Le dagîrker pak bibêtewe xakî pîrozî willatim*

*Çek dadenêm, goçanekey caranim hell degrimewe*

*To her bêrîbe min her şîwan, firîştey tase û awatim*

Helbesta Hêmin gihiştîye pileya herî bilind a wêjeya Kurdî. Yek ji wan jî helbesta 'Karwanî Xebat' e. Em bibînin çawa behsa şehîdbûna rewşenbîrek xebatkar dike:

*Her çar tenîştî gîrabûwe*

*Le sengerêkî da betenê*

*Ew lawey bellênî dabû*

*Heta mirdin çek danene*

*Rûnakbîrêkî ta emro*

*Deçû berew asogî rûn*

*Êsta hîway bebûlêl bû*

*Bo le gemaro derbaz bûn*

Bi rastî ya Hêmin li ser Goran dibêje, li ser xwe jî îspat dike: Kesên weke wî ciwan pir kêr in, wîşiyê di destê wî de weke mêwê ye, dil nazîke, xwedî xeyalek xweş e û nasîkbîre. Bi hûnere, şareze û xwedî gotin e.

### 3 BEŞA SIYEM

#### NAVEROKA HELBESTÊN HÊMIN

##### 3.1 Hêmin û Jin

Jin di helbestên Hêmin de xwedî rolekî giring e. Ciwaniya jinê îlhama seranserî dîwanên Hêmin wê rastiye derdixe holê ku xweza, jiyana, xebata gel û jinê Hêmin ji bo nivîsandina helbestê pal daye.

Ew tabloya ciwan a ku Hêmin ji bo jinê xîz dike, bi rastî ciwan û bêhempane. Jin ji bo Hêmin ne tenê çavkaniya îlhamêye, Hêmin ji bo rizgariya jinê helbestan dinivîsîne. Xebatê dike û dixwaze jin berî her tiştê xwediyê mafên xwe yê mirovî be. Gelek caran jî li dijî zordarî û zilma li ser jinê dengê xwe bilind kiriye. Helbestên Hêmin ên li ser jinê mînaka bilind a helbesta Kurdî ne. Di gelek helbestan de weke ‘Şenge Bîrî’ û ‘Perî Şiir’ û di gelek helbestên din de mamostatiya xwe îspat dike. Ji wan jî di helbesta bi navê ‘Yadgarî Şîrîn’ de wiha dibêje:

*Lade çarşîwî reşit ba derke wî kulmî geşit*

*Çun le qernîbîste ma zur eybe ew rûgirtine*

Hêmin gelek ji jinê hez dike, lê ligel Hêmin xebata ji bo rizgariya gel, ji bo azadiya gelan ji jinê heskirîtir e. Di helbesta ‘Amêzî Jin’ de wiha dibêje:

*Belî sextet yekcar sex, dûrî le jin, namiradî*

*Belam le le jin xuşewîsttir lay min etoyî azadî.*

*Kanî wek dîdey awaran pir coş*

*Şine wek pişûy nazdaran bon xoş<sup>7r</sup>*

(Tarîk Ê Rûn: 104)

---

<sup>63</sup> - Tarîk Ê Rûn , R 104 .

### 3.2 Statîstîka Helbestên Hêmin

Helbestên Hêmin di warê ciwaniya wêjeyî de helbestek pir û tejiye. Helbestek teji gotinên ciwan û zelal e. Zimanê Hêmin ê di helbestan de, zimanek asayî, di vî warî de jî Hêmin ji bo wê yekê têdikoşe ku netewe û kevneşopiyên civaka xwe ti carî ji bîr neke. Lewra sûd ji hemû gotinên bi sûd û ciwan werdigirt. Hêmin û berhemên wî, bi taybet jî berhemên helbestên wî, ji wan coreyên helbestanin ku xwediyê ritim, aheng û mûzîkek ciwan in. Vê taybetmendiye jî wisa kiriye ku lez û di cih de bikeve di nava dilan de, ligel giyan (can), xwendekar û guhdaran peywendiyekî kûr çêkir. Ziman di helbestên Hêmin de xwemalî, sade, bê girê û weke gûlê ye, bi taybet piştî Kûçka Baban û bi taybet jî li dibistana helbestan a Mûkiryana yek ji wan kesane ku mil bi mil ligel Hejar hem di nûbûna helbesta Kurdî de û hem jî di lezkirina zimanê wêjeya Kurdî de rol û bandorek berçav heye. Cihê tiliyên wan wê heta hetayê bimîne. nivîsên Hêmin Mûkiryani di warê ziman de ewqas dewlimendin, mirov dikare bi awayek hêsan ji bo zimanek standart ê Kurdî sûd jê wergire.

Mamosta Hêmin bi awek ciwan di berhemên xwe de rexneyan digire, wisa behsa pîrsgirêkan dike ku behsa hemûyan dike. Rexneyên wî giştîne û ligel balkişandina li ser pîrsgirêkan, behsa çareserîya wan jî dike. Fikir û ramanekê dixûliqîne ku kêma helbestvanan kariye di wê demê de wan tiştan bike. Wî bi berhemên xwe îspat kiriye ku helbest ne tenê ji bo dilê helbestvan bi xwe ye û peyama çaksaziyan (reform) ligel heye.

Eger mirov di warê rûyê (rûxsar) helbest an jî heman dîtinê de behs bike, weke hemû berhemê helbestvanên klasiye, hemû jî hevaheng in. Lê ya Hêmin ji helbestvanên dema xwe cûdakirî, naverok, hêvênê helbestan, bikaranîna zimanê sade û xelkî bû. Herwiha em wê yekê jî ji bîr nekin ku tenê bi nivîsê neketiye di nava xelkê de û bi kiryarî jî ew yek îspat kiriye û heskiriye neteweya xwe be.

Lihevçûnî (Tişbiye)

*Serî kullmit geşe her wek gulî kwêstanî Kurdistan*

*Le ber bejnî de bêser danwênêxelfî şimşadî*

(Tarîk û Rûn: 38)

Şibandiye serê memikê, şibandiye hev, gulên zozanê jî şibandiye pêşveçûn û rûxsar û sîmayî:

Serê ber çavê wê ‘Şibandiye’ weke edata

*Bijet nayête ser lêw û be zet naye be xallim da*

*Egerçî zor le mêj salle le dûrit dexşîm weke saye*

(Tarîk û Rûn: 61)

“Helbestvan şibandiye weke

‘Şêx’ şibandiye ‘Tarîtiyê’ û ti tişteke wan diyar nîne.

(Bi kom wergirtiye)

Helbestvan çend gotinên weke, “Mêrg, qontara çiya û deşt’ şibandiye ‘Biheştê.’

*Behar bû dîsan xemlî wek beheşt*

*Mêrg û lapall û benden û pêdeşt*

(Tarîk û Rûn: 103)

Şibandinek pir zêde (Teşbîh belîx)

Mîjeng şibandiye tîrê:

*Dilî sed aşîqt kird nîşaney tîrî mûjganit*

*Kiçê Kurdî le tîr awêtna mewlûme ostadî*

(Tarîk û Rûn: 38)

Dû ebro be şuphanderawe

*Be şimşêrî dû ebort cergî xelk let dekey diyare*

*Dezanî çek le kar bînî, kişîş bî toremey madî*

(Tarîk û Rûn: 38)

Bê meylî û cefa be tîx şubhanderawe

*Tîxî bê meylî û cefaî dew nazenîne dilreqe*

*Cergî let kirdim be carêk encînîwye sîneşim*

(Tarîk û Rûn: 48)

Jiyan şibandiye bazarê:

*Dezanî bo çî min hênde perîşan û xehfbarim*

*Le bazarî jiyan xeyrî huner nîme çî sermaye*

(Tarîk û Rûn: 61)

*Bi sed dîktor û derman û perestar nakrê çarey*

*Kesêk tîrî mijollî ew kiçe Kurdey le dill racê*

(Tarîk û Rûn: 62)

*Zanîm gullî hîwa pişkût Beyanî azadî engût*

(Tarîk û Rûn: 66)

“Gullî Hîwa” û ‘Beyanî Azadî’ ev jî yek ji wan helbestaneye ku gelek şibandiye hev.  
Di vê hevokê de ‘Xeyal’ şibandiye ‘Neynika Jeng girtî’ :

*Miştumallî dewê awêneyî jengawî xeyall*

*Mest û gêjim ke, heta galle be camî xem kem*

(Tarîk û Rûn: 77)

*Gîra, rûxa, xapûr bû qellay sextî*

*Weber pêlaqan dra tac û textî*

(Tarîk û Rûn: 82)

“Qellay Sextî-Kelha Giran’ gelek şibandiye.

*Willat bê hest û pê bê denge*

*Goristanî xamoşe şar*

(Tarîk û Rûn: 90)

"Bajar" şibandiye "Goristanek xamoş"

“Şar” şibandiye ‘Goristanek Bêdeng’

*Şadî û azadî denêjê*

*Dasî merg û neman deswê*

(Tarîk û Rûn: 91)

“Perdey Bêdengî-Perdeya Bêdengiye”

*Perdey bêdengî dadrand*

*Xewallûy le xew raperand*

(Tarîk û Rûn: 91)

“Ferşê (Mehfûr) Wenewşe”

*Le ber tawê le ser pişt rakşawim*

*Ledem coge le ser ferşî weneşan*

(Tarîk û Rûn: 98)

Şibandina Esnadî (اسنادى تشبيهه)

*Dinya deryay bê şepole*

*Law damawe, cêjwan çole*

(Tarîk û Rûn: 90)

"Dinya-cîhan şipandiye deryayek bê pêl.

Şibandiya Muzemer (موزمه ر تشبيهه)

*Henasem ladede çarşêw û rûbendî reşit axir*

*Hewr herçende pîr bê kiwa herîfî qudretî babe?*

*(Tarîk û Rûn: 60)*

Di vê hevokê de "Çarşêw û rûbendî reş" şibandiye "Ewir" û "Hewa" yê. Dava reş li ser berfê nayê bikaranîn.

*Le ser kollmet edî bo dilgire ew biske tataye?*

*(Tarîk û Rûn: 61)*

Di vê beytê de jî, 'Biska ta ta (Yek bi yek)' şibandiye "Dava Reş" û 'Ber çavê wê jî' şibandiye 'Befrê'

*Berîşî bozewe sucdey debem min bo cemallî to*

*Edî boçî deyangot dar ke pîr bû taze danaye?*

*(Tarîk û Rûn: 61)*

Di vê hevokê de helbestvan xwe şibandiye darê

Di vê hevokê de jî helbestvan xwe şibandiye darê, "Xwe çemandin" jî şibandiye "Sûcdekirinê"

Xiwaze (Îstiqare)

Xiwazey muserrehe

*Kullim heldestê ew care û le ber derdim denalênim*

*Heta awrîdilim dekujêtewe ewrîn debarênim*

*(Tarîk û Rûn: 49)*

Di hevokê de 'Esrîn' cihê rondikê digire.

Ser danwênanî xelfî şimşadî, îstiqare

*Serî kullmit geşe her wek gulî kiwêstanî Kurdistan*

*Le ber bejnî debêser danwênêxelfî şîmşadî*

*(Tarîk û Rûn, 38)*

Di vê hevokê de destê pîrozkirinê .....

*Herweha destî bê bezey teqdîr*

*Nayellê çûk û gewre, ciwan û pîr*

*(Tarîk û Rûn: 38)*

*Ke zorî bo dehînam derd û meynet*

*Deçûme raw û amêzî tebîet*

*(Tarîk û Rûn: 71)*

*Şenge bîza besirweba sujdey debird ber bejnî*

*Axir etuş heway kiwêstanî ew Kurdistanet helldemişit*

*(Tarîk û Rûn: 83)*

*Daman riştûwe binaxey jîn Baskî min û tîşkî ewî*

*(Tarîk û Rûn: 95)*

‘Jîn’ şibandiye tişteke ku bingehê wê hebe.

*Şewî hawîn le naw estêrekanda Gelawêjim dedî pirşingî dawî*

*(Tarîk û Rûn: 98)*

*Mang le ast heney şermezar bowe Biroy dî hîlal xoy le bîr çowe*

*(Tarîk û Rûn: 103)*

Di vê hevokê de peyva ‘Ting’ dû wateyên wê hene. Ya yekem ewir û xem, ya duyemîn jî hişk bûn û xirab bûn:

*Dillim hênde tenge her cêy to debê û bes*



*Etoş mehkûmî hepsî îfradî*

*(Tarîk û Rûn: 58)*

*Le swêyyanint weha dêwane bûm çawmestî xwên Şîrin*

*Le qernî bîstema renga reşaw kem karî Ferhadî*

*(Tarîk û Rûn: 38)*

*Besirwe hatne sema*

*Weyşûme û sema nema*

*(Tarîk û Rûn: 40)*

*Helyan mallêwe bask*

*Baskî qelew û nasik*

*Ke deken taske task*

*Rewektirin le ask*

*(Tarîk û Rûn: 43)*

*ŞEwane hawnîşînî camî badem*

*Be bade ba pejare û xem be badem*

*(Tarîk û Rûn: 59)*

*Ke mallit bê kemallit boçiyê lew şare wêrane*

*Ke Malî dewlemendî dî, gullim neywîst kemall min*

*(Tarîk û Rûn: 63)*

*Feru fikî ewe girtî hemû man*

*Le daxanî debû bigrin hemû man*

*(Tarîk û Rûn: 70)*

*Pisandt bazne û pawane*

*Destit da tifeng piyawane*

*(Tarîk û Rûn: 66)*

*Bizet nayête ser lêw û bezet naye be halimda*

*Eger çî zor le mêj şalle le dût dexşêm weke saye*

*(Tarîk û Rûn: 61)*

*Gerçî bo xoy xiraye çalî gor*

*Şiwênewarî be nîrxî mawe le gor*

*(Tarîk û Rûn: 65)*

*Çilone keyfet rehmanî qazî*

*Dexoy êstaş kebabî cergî qazî*

*(Tarîk û Rûn: 70)*

*Awrî awrî le dill berdabû*

*Nazî werhemî pê helêna bû*

*(Tarîk û Rûn: 104)*

Mirov dikare bêje Hêmin di nava helbestvanên klasîk ên Kurdî de pêşengê nû yê klasîkan e. Tiştê Hêmin di helbesta klasîk a Kurdî de kirî, berî kêma dihat dîtin. Lê ligel Hêmin bû awayek taybet a wî, ew jî tevlihevkirina naveroka dildarî û siyasî bi hev re li ser rûpelekê. Beşek zêde ya xezelên nazik ên Hêmin bi awayekî evîndarî destpê dikin, lê di naverokê de behsa xem û êşên welatê xwe (Kil.. Kim. Yadgarî Şîrin). Yan jî berevajî ji naverokê siyasî vedigere ser naverokê dildarî.

*Serwî azadîş lebar û dillkeş û berze bellam*

*Giyaneke min şet û şeyday lar û lencey ew qedem*

*(Tarîq û Rûn: 62)*

Piştî Hêmin eger ew rewş berê hebe jî, bi awayek lihevkerinê bû. Lê ev ligel Hêmin awayê wî bû. Ligel vê yekê jî hestê xerîbiyê di helbestên Hêmin de bi awayek êşkere derdikeve. Eger mirov ligel hevalê wî Mamosta Hejar berhev bike, di rastiya xwe de temenê penaberbûna Hejar gelek ji penaberbûna Hêmin zêdetir e. Lê xemên Hêmin ên ji bo nîştîman beşek zêde ya honandiyên Hêmin girtiye di nava xwe de.

*Êste bo çarî xemim goşeyî meyxaneye cêm*

*Min ke rojê demewîst mîlletekem bê xem kem*

\*\*\*

*Rû le her layê dekem nameye bom*

*Nabînim cêjwan û kewne lanî xom*

Ji xwe eger em bixwazin di vî warî de mînakekê bênin, divê beşeke herî zêde ya honandiyên Hêmin li vir binivîsin. Yek ji taybetmendiyan din ên helbestên Hêmin, rûyê naveroka wî ji her tiştî tejiye.

*Heta komtir debê piştîm pitir helldekişê minî rop*

### *Îtir destim be dawênî kiçî em şare ranaga*

Hêmin li vir behsa dû serdemên cûda dike. Behsa temenê xwe dike. Hinek kol û xem li vir kom bûne. Hêmin li vir bi rûyê (riwalet) behsa pîratiya xwe dike, lê tiştê rast di vî alî de behsa dû serdemên cûda û pêdiviyên serdema xwe dike.

Lê mirov li vir dibîne ku Hêmin tiştê naziktir dixê ber çavan, ew jî guhertina gewde ya ligel demê ye. Dema mirov temaşê bike, Hêmin balê dikişîne ser wê yekê ku ligel derbasbûna demê piştqov û kûr dibe. Kurbûna gewde û bilindbûna keç û meçan demkiye, tevî ku pîr dibin û keçên nû jî ji dayîk dibin û mezin dibin. Ew li karwan de bi cî dimînin. Li aliyekî din jî modelên nû yên cilûbergan derdikevin û ev bi xwe jî yek ji prensîbên jiyan û demê ye.

### 3.3 Aştîxwazî

Hêmin gelek ji neteweya xwe hez dikir û xwestiya ligel vê yekê jî kîna (riq) wî ji ti neteweyeke din neçe. Hêmin tenê ji dûr ranewestiyaye, temaşeyî jiyan û xebata gel bike yan ji bo gel helbestan bêje. Hêmin ew yek pejirandiye ku erkê helbesta helbestvanê gelek ku zilm û zordariyek mezin lê hatî kirin, lihevda û xistina di nava vehûnandinan de ne tenê xweza û ciwaniye. Ji ber ku helbestvan li pişt mirovahiyê ye. Miroveke hestê wî/wê nazike û zû tevger dike. Çawa helbest tê wateya rastiya vê ciwaniyê, li hemberî nexweşî û bêpariya gelê xwe bê alî be. Hêmin bi hemû hêza xwe û bi rêya helbestê di nava meydana xebatê de kar kiriye û li dijî bêdadiyê rawestiya ye. Hêmin ji despêkê ve helbestvanê gel bû.

*Ger çî min le zîncîr û tenaf û diraw û bend bakim niye*

*Let letim ken bim kujin hêştê elêm kurdim emin*

Helbestvanê gel endamekî çalak ê Komeleya J.K. ya li sala 1942'an hatî damezirandin bû. Bi xwe wiha dibêje; "Komeleya J.K. guhertinek mezin ligel min çêkir. Şev û roj di fikra min de bû. Ew jî rizgarkirina neteweya min bû." Di dema Komara Kurdistanê ya li Mihabadê de rolekî diyar hebû, dengê dildarî, helbest û nivîskarê navdar ê komarê bû. Hêmin timî weke helbestvanê gel maye. Evrazî û nişîviyên jiyan û xebata gel di helbestên wî de bi ciwanî diyar bûn.

*Ruley Kurdim fêrî hewraz û lîjim / Ez zarokê Kurdim fêrî evraz û nişîviyan bûme*

*Ta zur birûm ziyatir areq birîjim / Heta zêdet biçim û zêdetir xwihdanê birijînim*

*Kurtir debî rîgay dûr û dirêjim / Rêya min a dûr û dirêj kurtir dibe*

*Derûm berew aso, berew asoy rûn / Ezê ber bi asoyê ve biçim, ber bi asoyek zelal*

*Derûm derûm ta dirûkî rizgar bûn / Ezê biçim heta rizgar bûnê*

### 3.3.1 Dengvedana Ramana Netewî Kurdayetiyê di Helbestên Hêmin de

Şerê yekemîn ê cîhanê (1914-18) şerekî cîhangir ê ne rewa bû. Armanca dewletên deshilatdar ên wê demê dagirkirin, bidestxistina serwetê gelan û parvekirina di navbera wan de bû. Piştî şer jî, "Nakokiyên wê demê her parçeyekî Kurdistanê xist di nava rewşeke nû de.<sup>64</sup> Li Rojhilatê Kurdistanê bindestiya Îranê jî, siyaseta tunekirina Kurdan bi rêya zordariyê ya di dema rejîma Rezaxanê Pehlewî ve bi awayekî bi tûndî berdewam kir. Ziman, çand, cilûberg û hemû merasîmekî civaka Kurdewarî hatin qedexekirin. Vêca her ev zilm û çewisandina neteweyî; "Bû sedemê raperînekî fikrî di nava zana, rewşenbîr û rûspiyên Kurd ên di Melbenda Mûkiryân de.<sup>65</sup> Ji ber vê yekê herku diçû fikra netewî ber bi pêş ve diçû. Di dema serhildina Şoreşa Ararat a di navenda salên 30'î de, desteyek ji van zana û rewşenbîrên Mûkiryân derketin. Komelek ji bo piştgirîkirina wê şoreşê ava kirin. Mele Ehmedê Fewzî rêbertiya vê komeleyê dikir.<sup>66</sup> Hem mamosta û hem jî welatperwer bû, ev jî ligel Hêmin bû diyarek ji bo fikir û ramanên netewî.

Sazî û dezgehên dewletê piştî şerê cîhanê yê düyemîn (1939-45) li Mûkiryân ji ber rewşê hilweşiya û ji nav çû. Di wan şert û mercan de û li hemberî projeya Kurdan, şiddeta Reza Şada projeya yekemîn a ji bo bijavtina fikra netewî û nasyonalîsta Kurdî li cihê rêxistinek siyasî de ji dayîk bû. Di despêka salên 1940'an de, Komeleya Azadîxwazên Kurd<sup>67</sup> û piştî jî 16.08.1942'an Komeleya Jiyanewey Kurd (J.K.) li Mihabadê hat damezirandin. Hêmin di rêzên yekemîn ên endamên wan rêxistinên de bû. Di vê demê de fikra nasyonalîstî û rizgarîxwaziya Kurd-Kurdayetî di fikir û mejiyê Hêmin de xwîn germ dibe. Komeleya J.K. bû kanî û çavkaniya ziman û helbesta civakî. Ev yek jî bû despêka vejandina fikra Kurdayetî ya di

<sup>64</sup> - Emîrî Hesên Pur , *Jiyan û Be Serhatî Ebdul Rehman Zebîhî* , Capa 1 , 1999 , R20.

<sup>65</sup> -Hemin , *Sereta Bo Pekenî Geda* , Paserok , Caoal , Caphane Sidiyan , 1362 , Mehabad , R82.

<sup>66</sup> -Mujteba Berzuiy , *Ewzai Siysî Eran* , R282.

<sup>67</sup> -Ibrahîm Ehmed , *Le Bîreweriyekanim* , J 13 , 1996 , R46.

helbestên wî de. Helbest heta kêliyên dawiyê yên jiyana wî jî bi xêr û wefa man. Lewra dema mirov çavekê li berhemên wî bigerîne, mirov wê bibîne ku meseleya Kurd bi rêya zehmetî û pir rengî de, dikeve pêşiya hemû tiştên di helbesta helbestvan de. Vê yekê jî dengvedanek asayî di raperîna tevgera neteweya Kurd de veda. Derbarê piraniya helbestvan û berhemên helbestvanên navîna vê sedeyê rast in.<sup>68</sup> Yekemîn helbesta helbestvan a hatî belavkirin, fikra netewî û Kurdayetî di nav de diyar dibe. Dema Komeleya J.K. govara Nîştîman weke organ û dezgeha xwe ya fermî belav dike, Hêmin di hêjmara 2 a vê govarê de bi helbesteke bi navê 'Kurdme-Kurdim..' beşdar dibe:

*Kurdmu daway hiqûqî paye malî xom dekem*

*Malî xome mulkî kurd, dawayî malî xom dekem*

*Mulkî Kurdistan, îrsî babû bapîrî mine*

*Îdaay heqqû mîratî helalî xom dekem*

*Îdiay heqqû mîratî hellalî xom dekem*

*Her weku baran le çawim dêtee xwarê eşkî xwên*

*Her zimanêk berjewendêkî le hallî xom dekem*

*Gerçî lay axa xeyallî xawe fikrî milliyet*

*Min le lam başe heta mawim xeyallî xom dekem*

*Min ledes bêgane qet nakem şikayet ey refîq*

*Ger şikayet kem le çengî mam û xallî xom dekem*

*Nasîha be pêm billê fikrî mehalle fikrî to*

*Nishetim nawê emin fikrî mehallî xom dekem*

*Rojî Şêxim dît û pêm got hetbê hîsî milliyet*

<sup>68</sup> -Ezedin Mustefa Resul , *Naweroki Siyasi û Komelayeti Ciroki Kurdi* , G.Karwan , J 19 , Hewler , 1984 , R15.

*Pêy gotim min çîm lewane dawê, siwallî xom dekem*

*Min îtir mahu to şallî ecnebî nakem leber*

*Ranku ço xey xom le bûzuy rengî şallî xom dekem*

*Çîdîke zehmet le bo mindallî xelkî nakêşim*

*Ilm û zanist û huner fêrî minalî xom dekem*

*Çawdêrî rojî xoşî cêjnî serbestîm emin*

*Ger mudara wa degell em rojî tallî xom dekem*

Li vir helbestvan li gor têgihiştina xwe ya wê serdemê, tiştê jê tê behsa nasnameya neteweya xwe dike, li beramberî meseleya bînpêkirina maf, dagirkirina ax, talankirin û wêrankirina mal û milkê welatîyan de hevdeng e. Diyare 'Fikra Milliyet' di wê demê de hêmayeke ji bo fikir û baweriyekî pêşketî. Ligel helbestvan cihê serbilindiyê ye. Nefret li wan kesan dike, yên ku timî di xema berjewendiyên xwe yên taybet de ne, li hewara rewş û karûbarên birayên xwe neçin. Helbestvan ji ber berdewambûn û pêkûtiya li ser vê baweriyê û bi rêya vê armancê, li benda rojên xweş û cejna serbestiyê ye. Stem û çewisandina neteweyî bi dewle serê siyaseta nijadperestî ya rejîma Reza Şahê Pehlewî ya li Kurdistana Îranê çend barbarane bû, armanca wê kurkirina çand û ferhengên neteweyên Îran û tunekirina nasnameya wan a li ser şanoya siyasî bû. Ev hemû bihaneyên siyasî yên li serdemê Atatürk de û di heman demê de ligel vê ya ji bo welatîyên Kurdistana Bakûr hatine kirin; zêdetirî 70 sale gelê Kurd li wê herêmê dinalêne. Kûl û xemên derûniya helbestvan di van şert û mercên "Dijwar de her ew yek bû helbestvan rast û rewan mamele ligel dil û derûnê (pîskolojî) xwe bike.<sup>69</sup> û bêje:

*Gerçî tûşî renceroiyê û hesretê û derdimê emin*

*Qet le dest em çerxe siple nabezim merdimê emin*

Herçendî di wan rojan de Hêmin şêxzadeyekî bêpirsgirêk û paqij bû, lê xema çî dixwe! Eger gelê wî rastî ked, derd û hesretê be... Lewra ez li vir ne Hêmin im! Ez

<sup>69</sup> -Seiyd Smaylî Huseînî, *Wîw Wejî Bilawnekrawe Le Gel Hemin*, G. Gizing, J 23, Swed, 1999, R37.

gelê Kurd im.<sup>70</sup> Piştire; "Ev zêdetirî 30 salane bi hezaran xebatkarên Kurd bi hev re ligel helbestvan Hêmin dikin hewar û vê yekê dibêjin."<sup>71</sup>

*Aşiqî çawî kejal û gerdinî pir xal nîm*

*Aşiqî kêw û telan û benden û berdim emin*

*Ger le birsan û li ber bê bergî îmro req helêm*

*Nukerî bêgane nakem ta Leser herdim emin*

*Min lez zincîr û tenaf û dar û berd bakim niye*

*Let letim ken, binkujin, hêşa delêm kurdim emin*

*(Tariq û Rûn, R. 49)*

Ev çend hevokane ketin ser zimanê şoreşgerên Kurd, zarokên li dibistanan û ciwanên sergerm ên li her aliyên Kurdistanê. Ev helbest bû cihê welatperweriyê û rabûna li hemberî zordariyê.<sup>72</sup> Diyare armanca Hêmin ji Kurdbûnê, ne tenê wateya wê ya etîkiye; belkî armanca wî wateyek nasyonalist-siyasî ya li hemberî siyaseta netewperestî (Pan Îranîzim) derdikeve nîşan dide.<sup>73</sup>

Helbestvan li cihekê pêşbînî (texmînî) û rabirdûya zilma li hemberî Kurdan hatî kirin eşkere dike û heta digihe wê yekê ku dewletên li derdora me jî (Seed Abad) ji bo dorpêçkirina meseleyên neteweya Kurd li vê navçeyê anîn holê:

*Le mêj bû heqqî Kurd dexûra be firro*

*Le mêj bû Kurd bû deykird şîn û ro ro*

*Le meydanî şeqênî dujminî da*

*Serî serdarî Kurdî bû wekû go*

*Be dewrî laşî nîwe giyanî ewda*

<sup>70</sup> -Hemin , *Cepke Gul Cepke Nergiz* , R129.

<sup>71</sup> -Ebdul Rehman Qasim Lo , *Saîrî Gel* , Tarîk U Run , R 9.

<sup>72</sup> - Kerîmî Hisamî , *Hemin Şaîrî Nawdarî Kurd* , Sercawê Pêşw , R136.

<sup>73</sup> - S.C.Heris , *Rewfî Serheldanî Sîrî Siyasî U Komelaiyetî Le Mukiryar* , Beşî Dwem , R34.



*Hezar gorg û çeşel deykird milumo*

*Deyan best bo kutanî merc û peyman*

*Henawî lêy dehat bo çirûk û boso*

*Kurî Kurdî le xwênî xoy degewzê*

*Kiçî Kurdî serî kird bû we ejno*

*Ewey sûkayetî bû kirdî pêman*

*Nedekra kes billê bo wadekey bo?*

*(Tarîk û Rûn, R. 65)*

Gelê Kurd ê li Kurdistana Îranê ji despêka navîna sedsala 20'an ve ji ber hemû nexweşî, hejarî, nexwendekarî û paşketinan dinalêne. Fikra netewî jî ji wê demê ve dixûliqê ku dema gelek hest bi rastiya paşketin û çewisandina rastî wî hatî bike. Li ser vê yekê re zarokên wî gelî behsa rewşa xwe bikin û li rêyêke çareseriyê bigerin. Bê nava meydana kar, hewldan û çalakiyên ji bo gihîştina armancên xwe yên pîroz. Xebata Komeleya J.K. her ev yek bû Kurdan ji xewa xefletê rake. Gel pêşbixê û ji bo rêya rizgariyê bişopînin. Peyama helbestvan jî di vê çarçoveyê de bû:

*Le xûrabî xewê da dujminî pêdare Kurde giyan*

*Heleste lem xewe, îmroke cengey kare Kurd giyan*

*(G / Nîştîman-4)*

Helbestvan di hevdîtinên keç û kurd de, ji bo hişyarbûnê bang li ciwanên Kurd dike:

*Kake giyan lawî Kurdî şox û şeng / Keko cano lawê Kurdo şox û şeng*

*Ta kengê debê wabê hest û deng / Heta kengê tû wê wiha bî, bê hest û deng*

*Dîlî, jêr destî, esîrî, ta key? / Dîlî, bindestî, esîrî, heta kengê?*

*Rûtî, nedarî, feqîrî, ta key? / Rûtî, hejarî, feqîrî, heta kengê?*

*Le jêr zîncîr û kota denalî / Di bin zîncîr û destgirtinê de (kota) de dinalî?*

*Meger dêwaney, şêti, ewdalî / Ma tu derwêşî, dîn û evdalî?*

*Tê fikre xelkê hemû azade / Fikrê hemû kesê azad e*

*Her to xemankî hemû kes şade / Her to wisayî her kes şad e*

*Têkoşe bo xot taku serbest bî / Ji bo xwe têbikuje, ji bo serbest bî*

*Eybe le bo to, dîl û jêr dest bî / Şerme ji te re, dîl û bindest bî*

*(Tarîk û Rûn, R. 50)*

Hêmin di gotarên xwe yên di wan rojan de dinivîsand jî behsa heman tiştan dikiir, daxwazê ji ciwanên gelê xwe dike û dibêje; "Xwe nas bike!" Heskiriya min xwe nas bike, bizane tû kiyî, dîrokê bixwîne û fêm bike ji çi regezekêyî...

Ezîzê min tû Kurdî, tû ji neteweyek paqijî. Tû ji regezekî paqijî. Bapîrên te yên despêkê, tû her li ser vê xaka ku jêre dibêjin 'Kurdistan' û niha tû di nav de dijiyî. Her parçeyek di destê aliyekê de ye û bi vî awayî me jiyan kiriye. Lê jiyanek çawa? weke te dîl û bindestê cîranan bûn? Ne bi xwedê ew serbest û serbixwe bûn û azad jiyan kirin. Rihê min, Kurdê hêja bi gotina birayê xwe bike, ji xewa nefêhmiyê rabe û hinekê li rewşa xwe binêre. Were ser hişê xwe û bi hemû hêza xwe bike hawar: Ez jî mirov im, mafê min ê jiyanê heye. Ez dixwazim weke xelkê azad û serbest bijîm. Ez serxwebûnê dixwazim û min mafên xwe yên rewa divêt. Ez ji dîl û bindestiya cîranan bêzar bûm û dixwazim rizgar bibim"<sup>74</sup> Piştî şikestina şoreşa Şêx Seîdê Pîran, dadgehek bi navê 'Mahkameya Îstiqlal' cezayê darvekirinê li rêberên vê şoreşê Şêx Seîd, Şêx Ebdûlqadir û Dr. Fûad... birî.

Hêmin ji ber vê bûyera dilgiran û piştî çend salan, ji Mûkiryane vê bîranîna nexweş bibîrtîne:

*Min le ser lutkey bilindî kêwî heq dawa dekem*

*Tûş biparêwe cenabaî Şêx li ser rûy tatewe*

*Belkî ruhmêk bika pêman xûdawendî rehîm*

<sup>74</sup> -Hemin , *Xot Binase* , G-Nistîman , J2 , Xezelwerî 1322 , R39.

*Çî dîke jêr dest nebîn dîsan weserman xatewe*

*Hêmna pêt wanebê Yezdanî bê hawal û ferd*

*Keyferî em zullm û zore, bê hîsab nadatewe*

*(Çepkî Gull Çepkî Nêrgiz, R. 62)*

Tevî ku temenê Komeleya J.K. (1942-25) kurt bû, lê bi tekoşîn û xebata xwe karî heta astekê hestê kurdayetiyê di nava gel de zindî bike. Heta bigihe wê astê ku bikare li parçeyên din ên Kurdistanê jî beş û baskên xwe veke.<sup>75</sup> Mirovên zana, xwendekar û welatparêzên Kurd li derdora ala xwe kom bibin. Di vî warî de çarenivîsa şer bi têkşikandin, şikestina eniya Nazîzim, faşîzim û serketina eniya azadîxwazan yekalî (zelal) bû. Êdî tevgera rizgarîxwaz a Kurd jî derbasî qonaxekî nû bû. Bû tevgera girseyî ya şoreşgerî, hemû çîn û komên Kurdî li derdora ala Kurdî kom bûn. Bername û armanca xebata siyasî û şoreşgerî xistin tevgerê: Ew jî rizgariya ax û azadiya mirovê Kurd bû. Herwiha zimanê helbestên Hêmin, qonaxa rijandina rondikan, deste û rawestandina ji bo rewşa Kurdan, bi cî dihêle; di warê zanistperwerî û rabûna ji xewa xefletê, ji bo astekî bilind hawar dike. Ji bo meydana xebat, tekoşîn û berxwedanê, li vir di nava peyv, hevok û ramanên wî de hest bi nefesek germ û bi agir ya helbestvan tê kirin:

*Lawî Kurdî lehemû lawe weku şêrî jîyan / Lawên Kurd di hemû aliyan de weke şêr  
jîyan kirine*

*Dête meydan û dellê, min demewê mafî jîyan / Tê meydanê û dibêje, ez mafê xwe yê  
jîyanê dixwazim*

*(Tarîk û Rûn, R. 82)*

Herwiha di 'Awatî Berz-Hêviya Bilind' de wiha dibêje:

*Roj be roj roj qayîmtire, mehkemtire, birwayeke*

*Dem be dem çaktir debê, baştir debê, akarî Kurd*

*Bê û çan derwate pêş û rêge debrê bo hedef*

---

<sup>75</sup> -Celîl Gadanî, R21.

*Zor le salan rûntire ew sale ke efkarî Kurd*

*Kurd be zindî bo nebû ba dujminîş*

*Ranewestabê le tallan û biro û kuştari Kurd*

*Ew le azar û şikencey qet nebû xafil, bellam*

*Kurdî kirdote smate hezrebew azarî Kurd*

*Sed hezar bergêrrewew babête ser rê, axrî*

*Her degate menzillî awat û xoşî barî Kurd*

*Maftî Kurdî her debê bistêndrê bistêndrê*

*Dujminî Kurd têgeyîştûwe nakrê başarî Kurd*

*Wa gizingî da beyanî ciwanî azadî beşer*

*Rojî rûnake, nemawe zullmetî şewgarî Kurd*

*(Tarîk û Rûn, R. 123)*

Demekê dewleta Şah ji bo xwe derbaskirina ji pêşveçûna tevgera Kurdî xwe wisa dida nîşan dan ku bê cûdahî temaşeyî welatîyên Kurd ên xwediyê heman xwîne û hevregezên xwe dike. Rejîmên din jî her yekê bi awayekê din ji bo Kurdan tiştekan dianîn pêş. Helbestvan ji bo perdeyê li ser rastiyan van îdiayan rake, wiha dibêje:

*Le mêjû fêre Kurdî pakî laşer*

*Berîngarî, fîdakarî, dilêrî*

*Eto her qatilî zarok û çûkî*

*Bedîl û pîr û bê enwa dewêrî*

*Hîsabî karî xot ger baş dezanî*

*Le maftî ême boçî xot debwêrî*

*Eger ballî humaş bê sêberî to*

*Ke mafê Kurd nedey na çîte jêrî*

*Edalet ger hebê pêwîste her kes*

*Le malî xoy bikar xoy çawedêrî*

*(Paşe Rok, R. 208)*

Heta tekoşîna gel zêdetir pêşve diçû û heta şoreşa Kurdî pêngavekê nêzîktirî asoyê (ufuk) dibû. Herkû diçû zilm û zordariya dijminan jî zêdetir dibû. “Li aliyekê hêdî-hêdî hestê neteweyî di nava Kurdan de xortir dibû û li aliyekî din jî roj bi roj zordariya netewî ji aliyê rayedarên wan welatan ve tundtir dibû.<sup>76</sup> Helbestvan awirekê li Hacî Qadirê ku bingehê fikra şoreş û raperîne dariştî digêrîne, eniya wê xebata giran û bixwîn berdewam dike:

*Le Kurdistan gelêk şoriş bepa bûn*

*Kurdî Kurdî begij bêgane daçûn*

*Le mêj salle dirrêjê areq û xwên*

*Bellam daxî giranim hêştâ le kwên*

*Ew êstaş derde Kurd nekra illacî*

*Ew êstaş Kurdî kwêle mawe hacî*

*Gelî Kurdî nebû hêştâ necatî*

*Bexwênî lawekan sûre welatî*

*Ewêstaş dujminî lasar û bedefer*

*Dekujê Kurdî bê tawan û laşer*

*Ew êstaş her demanken tîrebaran*

*Denexşênin bexwên kollanî şaran*

---

<sup>76</sup> -Ebdul Rehman Qasim Lo , *Kurdistan U Kurd* , W-Ebdulla Hesên Zade , Binkeî Pêşewa , 1973 , R87.

*Ew êstaş pir pirn zîndan le lawan*

*Bexeyrî wey ke Kurdin niyane tawan*

*(Tarîk û Rûn, R. 216)*

Diyare Kurdbûn bi xwe ligel dijmin û dagirkeran weke tawan (sûc) tê dîtin. Vêca her li ser girtin, êşkişandin (azardan) û kuştina zarokên azadîxwaz ranewestan. Belkî fikra nexşe û pîlanên helandinê (tunekirin) jî kirine. Despêkê bi haşatîkirina bi hebûn û têkdana nasnameya wan weke neteweyekê. Lewra Hêmin bi hawar vê pîlanê şermezar dike:

*Şîwey min şînî Kurdî bê beşe*

*Ew gelek haşa deken lêy û heşe*

*(Naley Cûdayî, R. 19)*

Helbestvan çavdêriya pêşketinên mirovatiyê dike û ligel rewşa awarte ya gelê xwe berhev dike:

*Mang û mêrêxî depêwî însan*

*Min Kurd zînde be çalim takey?*

*Çawerêy tîşkî hetawî hîwam*

*Nerewê hewr û gewallim ta key?*

*(Paşerok, R. 210)*

Kurdî jî mil bi milê welatîyên Îranê yên rabûne ser niqûmkirina rejîma Pehlewî paşnakeve, lê rejîma nû jî çavê xwe ji daxwazên gel re digire. Herwiha wan cûdaxwazî û serûbinkirinê gunehbar dike. Helbestvan jî bêdeng nabe:

*Kurdîş bedşarî xebat bû*

*Roley rojî karesat bû*

*Lawî giyan fîday giyanfîda*

*Azayane şehîdî da*

*êsta dellê xwênî geşim*

*Bo şorş riştûwe kiwa beşim*

*Dijî zordarî bûm hewram*

*Her demewê mafî rewam*

*Demewê bigem benyaz*

*Nawim menê ciyawazî xwaz*

(Paşerok, R. 216)

### 3.3.2 Helbesta Nîştîmanî

Kurdistan welatek nîv koloniye. Ligel vê yekê jî rasterast ji aliyê hêzên emperyalîst ên cîhanê ve nehatiye dagir kirin. Lê ji ber welatên dagirker û biyanî ku timî piştgiriya wan hêzan dikirin, nerasterast, bi rêya derbeyan û bi zorê hatine birêve birin. Beşa Rojhilat a vî welatî jî wê demê ve ketin di bin nîrê îmeretoriya Îranê de. Bi berdewamî bi hêza leşkerî hatiye dorpeç kirin û serweriya xaka wê hatiye binpêkirin. Ji hemû maf û azadiyên xwe yê siyasî hatiye bêpar hiştin. Di warê aborî de timî di nava hejarî û paşketinê de bû. Rûniştvanên wê ji serwet û qezencên welatê xwe hatine bêpar hiştin. Ziman, wêje, ferheng û çanda neteweya wan li wan hatiye qedexekirin.

Gelê Kurd li her parçeyeke welatê xwe gelek şoreş û raperînên bixwîn destpêkirine. Milê xwe dane ber xebatek giran, dest ji serwerî û serxwebûna xaka xwe bernedane. Tevgera nîştîmanê Kurdan li Kurdistana Îranê di despêka şerê cîhanê yê dûyemî, bi pêkhateya semîner û komeleyên siyasî û civakî, derbasî qonaxekî nû bûne. Bi ragihandina Komara Demokrata a Kurdistanê ya li ser parçeyeke xaka xwe, gihişt gimikê (Zîrve, lûtke). Azadî û rizgariya nîştîmanê Kurdan weke armanceke herî li pêş, di armanca Komeleya J.K. û di hêjmara yekemîn a govara Nîştîman de bi başî behsa wê hatiye kirin “Komeleya J.K. bi hemû hêz û karîna xwe tekoşîn meşand, heta kelemê dîlî û bindestiya ketî stoyê neteweya Kurd paqij bike. Ji bo ji vê Kurdistana nihaya parçe parçebûyî, Kurdistanek mezin û rêkûpêk berhembêne. Ji bo

hemû Kurdek bi serbestî di nav de bijî.<sup>77</sup> Hêminê helbestvan û endamê çalak (aktîv) ê komeleyê, ji despêkê ve mejî û ramana wan ser vê armancê bû. Hestê rizgarî û serfiraziya nîştîmanî ligel wan gûr bû û weke bilbila sermest bû. Rizgariya Kurdistanê wan dibe sîrûda li ser zimanê wan:

*Min ke bêdengim ew êsta çawe norî hel dekem*

*Hel ke bom hellkewt enca baskmî lê hell dekem*

*Zor be omêdî Xûdaw lew xake pakey derdekem*

*Dujmine bêgane axiv, çon degel pakey derdekem*

*Dujmine bêgane axir, çon degel wî hell dekem*

*Nayellim tarîkî çîdke willatim dagrê*

*Xwa meded kar bê çiray zanistî têda hell dekem*

*Diwê şewê daykî weten (Hêmin) le xew da pêy gotim*

*Rolle kirdarit hîsabe genkê goftar hel dekem*<sup>78</sup>

Despêka sala 1945'an komeleyek bi navê Daykî Nîştîman-Dayîka Nîştîman dadimezirînî û pêşkêş dikin. Navdar jî dibin. (Dayîk bi awayê jinek dîl sembola nîştîmanê, sergirtî, dest û pê girtî tê nîşandayîn. Zarokên wê ji qehran dikin hewar û davêjin ser dijmin. Bi seriyê şîr û xencerê benê (werîs) di destê dayîka xwe ya dîl û bindest qût dikin û ji dîlîtiyê rizgar dikin. Ev şanogerî gelek li ser hest û ramanên xelkê de bû, çar mehan hat pêşkêş kirin. Heta rûniştvanên gund û bajarokên derdora Mihabadê jî ji bo dîtina vê şanoyê, bi rojan berê xwe didan bajêr.<sup>79</sup> Ev dibe çavkaniya îlhamek ji bo helbestvan, lêkolînek di navbera wî û Dayîka Nîştîman de çêdibe. Di bersiva pirsê helbestvan de wiha dibêje:

*Gotî nazanê rolley hêç nezanim*

*Emin kêr? Rolle daykî nîştîmanim*

<sup>77</sup> - Kovara Nîştîman , *Amancî Ême* , J1 , Pusperî 1322 , R2-3.

<sup>78</sup> -Hemin , *Heldekem* , G-Kurdistan , J2 , 21 Disemberî 1945 , R17.

<sup>79</sup> -Kerîmî Hisamî , *Komarî Dimokratî Kurdistan* , R54.



*Le tawî êweye wa mat û girjim*  
*Le swêyê ewe desûtêm û debirjim*  
*Debînim ewe damaw û hejaran*  
*Kiz û xembar û zar û lêw bebaran*  
*Minîş boye perêşan û peşêwim*  
*Debînî barî xem nîştîwe le lêwim?*  
*Nexoşin ewe, boye min nexweşim*  
*Esîrin ewe, bo reş depoşim*

*(Tarîk û Rûn, R. 84)*

Piştire Dayîka Nîştîman dibe mijara gotinê û paldana zarokan a bi vî awayî:

*Ta bekey ewe weha bê hoşin*  
*Kar biken hewll biden têbikoşin*  
*Şûreyî û a'are lebo ewe ewend pest bin*  
*Eybe wa qurbeser û derbeder û jêr dest bin*  
*Nenge zor nenge kewa gêj û hurru sermest bin*  
*Rêk kewin ta zûwe karêkî biken serbest bin*  
*Kurde axir bese ew bende giye*  
*Merg zor xoştire lew zindegiye*<sup>80</sup>

---

<sup>80</sup>- Hemin , *Xewnim Dit* , Kovara Nîstîman , J7-8-9 , R22.

### 3.3.3 Xem û Nasorî û Soza Derûn Gilî û Soza Xerîbiyê:

Xerîbî tê wateya dûrketin, qûtbûna ji mal û xizmên xwe. Cûdabûna ji xweşî, hest û heskirinên ku piraniya caran mirov hest pê nake ku ji ber dinalêne. Ji dûr ji bo kes, xizim, welat, yar û heskiriyên xwe dişewite. Hêmin ji wê rojê ve xem û nexweşiyên gelê xwe xistiye piştî xwe. Di bin derbeya karesat û serpêhatiyên de hewl daye, ketiye di bin nexweşî, xem û êşan de û vê yekê jî bandorekî mezin li ser çêkiriye. Helbestvan li dersînorkirinê ji bo hevdiîtina ligel dost û heskiriyên xwe, dixwaze vegere gel wan û xwe bavêje himbêza wan. Bi vî awayî dilê helbestvan dişewite û xerîbî serî hildide.<sup>81</sup> Hêmin di helbestên xwe de zêdetir behsa xem û nexweşiyên jiyana kiryê û di kêliyên dawiyê yê jiyana wî de weke rêzeçîrokên trajedîk li pey hev tên:

*Laperey jînim hemû heldedeytewe têyda niye / Tû hemû rûpelên jiyana min vekî, di ti  
ji wan de nîne*

*Basî firmêsk û henase û şiwên û matem nebê / Behsa rondik, bêhdan, cih û şînî nebe*

*(Tarîk û Rûn, R. 132)*

Li sala 1947'an bihara wî lê dibe nexweşî û koçka hêvî û daxwazên wî hildiweşin. Serê xwe radike û tê vî aliyê din ê sînor. Wê demê cara yekemîn û bi yekcarî jiyana wî temenê wî dibe 'Penaberbûnek berdewam'.<sup>82</sup>

*Çi xoşe îşq û sermestî çî xoşe / Çend xweşe îşq û sermestî çend xweşe*

*Çî xoşe jîn be serbestî, çî xoşe / Çend xweşe jiyana bi serbestî, çend xweşe*

*(Tarîk û Rûn, R. 112)*

Dûrî welat û bi bîranîna gûla sor û hiştina aramiyê de wiha dibêje:

*Minîş ey bulbulî şehda wekû tom*

*Weha dûrim le hêlane û gollî xom*

*Minîş wek to lekîsim çû gullî sûr*

<sup>81</sup> -Muhemed Ferîq Hesên, *Hêmin U Bonî Xerîbî*, Kovara Beiyân, J65, 1980, R14.

<sup>82</sup> -Dilsad Meriwanî, *Awarebun U Xezelek*, Kovara Rojî Kurdistan, J5, 1973, R42.

*Minîş hêllanekem lê kirawe xapûr*  
*Minîş babir delley ber gêje lûlekem*  
*Demêk lew qulke, tawêk lew çilûkem*  
*Le amêzê germ bê beş kirawim*  
*Weke to tûşî rojî reş kirawim*  
*Jiyam pîrr le renc derd û daxe*  
*Ewe gîrsawmewe lew kêw û şaxe*

*(Tarîk û Rûn, R. 113)*

Piştî şikestinê bê hêvî bû û bi vê yekê jî qerebû (tezmînat) nabe. Piştî salekê helbestvan vedigere hêlîna sar û sir, vegera ji penaberiyê destgirtiyê bi xwe re têne.<sup>83</sup>

*Qet le dinya da nebû bêcge le naxoşî beşim*  
*Mat û damaw û peşêw û bêkes û çare reşim*  
*Ser demêk awere bûm û maweyêkîş des beser*  
*Ne dî rûy asûdeyî, her tuşî gêrew qerqêşim*

*(Tarîk û Rûn, R. 115)*

Dema helbestvan ji yar û hevalên xwe qût dibe, dibe hevdem û hevsozê perwaneyê, dema ew hildipire; dikeve nava rewşeke romantik de.

*Min û laşey pepûle manewe û bes*  
*Şewî dûrî, şeşîş tiwawe le kora*

*(Tarîk û Rûn, R. 121)*

Dema parçeyek “Parçeyek ji helbesta ‘Mû Qût Nakim’ dixwîne, digihe wê baweriyê ku dû aliyên wê hene. Ya yekemîn mirov dibêje qey ji heskirineke xwe re

<sup>83</sup> - Kerîm Husamî, *Pem Waîe Başî Bo Neçwe*, R-Hawkarî, J240, 1-11-1974.

gotiye ku winda kiriye û di dilê wî de bû da. Tevî ku dema mirov zêdetir dikeve nava kûrahiya helbestê, mirov têdigihe ku behsa bîranîna hevalekê dike û gelek jê qût bûye.<sup>84</sup> Tû bi her çavekê temaşe bikî, nemiriya helbestvan di nav de heye:

*Qerar bû bêy legel xot Şadî Bêni*

*Nehatî ger çî pêt da bûm belênî*

*Le naw Kurd dad nebû peyman şikandin*

*Le kiwêy fêrî bûyî gollim peyman şikênî*

\*\*\*

*Eger çî royî qet naçê le yadim*

*Dekem yadit, beyadî towe şadim*

*Ke barget bo hewar têk na ezîzim*

*Şika estûndekî tawillî miradim*

*(Tarîk û Rûn, R. 129)*

Ew dem ligel helbestvan ne tifaq û yekgirtî bû, timî Ferhadkuj (Ferhat dikuşt) bû, derd, xem û nexweşî jê dibariya:

*Rojgarî siple bo min boseyekî nayewe*

*Nem dî her tîrêkî dye hawê berew sînem nebê*

*Zencî dûrî dilberim bo kuştinî min kafî ye*

*Ger le dinya da emin hîç meynetî dîkem nebê*

*(Tarîk û Rûn, R. 132)*

*Xem û derdî zemanê pîrî kirdim, wişk û bê zewqim*

*Ke şaîr wişk û bê şor bû, lenaw xelkî debê laçê*

<sup>84</sup> - Muhemed Ferîq Hesên , *Hemin U Bonî Xeribî* , Kovara Beiyân , J65 , Ab1980 .

*Le goşey bêkesî da êstewa dillteng û xembarim*

*Niye bakim eger halim be carêkî bequr daçê*

*(Tarîk û Rûn, R. 135)*

Hinek caran xerîbî, bêkesî û têkçûna derûniyê (pîskolojî) rewşeke wijdaniye. Helbestvan li derdora xwe hest bi xerîbiyê dike û bêzariyê nîşan dide:

*Le mallî xom dekem bonî xerîbî*

*Ke bêzarim le her çêkî hemane*

*Ey xoşim dewîst wek giyanî şîrin*

*TEmaşey bo te miştêy naw hemane*

*Leber to çarenûsî şûm û bedfer*

*Ey qet lêy nedem teplî emane*

*(Tarîk û Rûn, R. 156)*

Helbestvan di dema penaberî û dûriya welat de, ji bo xêzan û heskiriyan xwe dişewite. Bi awayê bêmiradî û bêparbûnê bi awayê nameyekê yan jî bangekê pêşkêş dike:

*Bellê sextet, yekcar sextet / Belê girane, gelek girane*

*Dûrî le jin, namiradî / Dûriya ji jin, bêmiradî*

*(Tarîk û Rûn, R. 173)*

Ey ew kesey detperistim û lêm winî / Ey ew kesê min hawara xwe digihandê û li min windayî

*To xuda nî, tû xoşewîstî minî / Tû ne Xwedayî, tû heskiriya minî*

*Le asman nî tawêt ranega destim / Tû ne li asîmanî heta negihî destêmin*

*Le qaf nî kalley asinit bo helbestim / Tû ne li Qafî, ez pêlava hêsin ji te re çêkim*

*(Tarîk û Rûnî, R. 184)*

Ev dûrî û derbederî (sîrgûnî), ger ji aliyê helbestvan bi xwe ve jî hatibe hîlbijartin, lê bi xem û bi êşe. Wijdana helbestvan dihejîne, xweşî û şadî lê tarî dibe.

*Lew demey da giwê hell dexten bo tarî*

*Lew demey da 'Mamlê' dellê qetarê*

*Yadim biken, yadî minî dûr willat*

*Yadî minî rêbwarî rêgay xebat*

*Yadî minî bê beş le xoşî û şadî*

*Yadî minî sewda serî azadî*

*(Tarîk û Rûn, R. 207)*

Hêmin di awêneya helbesta teji soz, xerîbî û serhatiyên teji derbederî û kûrîtiya Hacî Koyî de, jîyan û serpêhatiyên xwe dibîne. Lewra bi vî awayî guftûgo ligel dike:

*Ew êstaş gorr xerîb zorin weku to*

*Ew êstaş bê nesib zorin weku to*

*Ew êstaş bê kew dûre weten hen*

*Ew êstaş şairî pîr û reben hene*

*(Tarîk û Rûn, R. 216)*

Bi heman awayî berê xwe dide Baba Tahîrê Hemedanî û wiha dibêje:

*Babe Tahîr! Minîş dellêm weke to*

*(Ax le dest dîde, way le çengî dill)*

*Kê dezanê beşe û le min çi deka*

*Ew xeyale peşêw û alozem*

*Kê dezanê ke çim be ser dênê*

*Ew dille pir bilêse û sozim*

*(Tarîk û Rûn, R. 219)*

Em li xerîbiya helbestvan, hest bi xerîbiya netewe û niştîman dîkin ku kêra bêdadiyê dilê xelkê parçe parçe kiriye. Ango xerîbî ne tenê dûrketina ji xakê ye, belkî bêhêvîbûn û şikestina hêviyan jî, binpêkirina daxwaz û hêviyên helbestvan e:

*Awarem û dûre weten*

*Bê temall û selt û reben*

*Serim wirrew giyanim dêşê*

*Kes niya nazim bikêşê*

*Çim kirdewe bo wam beser hat?*

*Bo çî tere bûm le willat?*

*Bo hêllanem lê şêwawe?*

*Ew hemû rêgem pêwawe?*

*Bo le xoşî dûre beşim?*

*Bo ewende çare reşim?*

*(Tarîk û Rûn, R. 226)*

Hêmin di şevên cûda û di rojên penaberiye de timî destê wî li ser milê wî û kûr bibû, lê gelo ma kesek hebû derd û xemên wî hilgire?:

*Nexweş û derde dar û dill birîndarim, perstarêk*

*Be hallî em dille pirjan û pir ajare ranaga*

*Debê bûlbûl le min fêr bê xezelxwênî, bellam çîbkem*

*Giriftarim, çîkem bew gull û gullzare ranaga*

*(Tarîk û Rûn, R. 228)*

Naley Cûdayî, destana xem, derd û êşên helbestvane. Xemname ye. “Rewşa jiyana mirovek hejar û çewisandî, zilmlêkirî û para wî hatî xwarin. Li wir helbestvan gihiştîye pileya şewitînê û dike hawar. Hawara gihiştina çavkaniyan bi awayek yeksanî û bi rizgarî.<sup>85</sup> Helbestvan li wir xem û derdên xwe dijmirê:

*Ew kesey neyçêştûwe derdî jiyân*

*Ew kesey nedîwe êş û birk û jan*

*Ew kesey nekra nîşaney tîrî xem*

*Şanî danexza le bin barî sîtem*

*Ew kesey hênde nebû zûwêr û zigâr*

*Wa nekewte ber çepokî rojgar*

*Ew kesey neyharî berdaşî zeman*

*Ew kesey (Zîrrey negeyye asman)*

*Ew kesey dûrî ezîzanî nedî*

*Tîr û taney bê temîzanî nedî*

*Tozî bed bextî le ser şanî nenîşt*

*Lêy negîra dew û pişt û çîwar tenîşt*

(Taley Cûdayî, R. 13)

Hevokên vê honandiyê ji bo kizîna dûkêla bêhna dilê mirovekê lê bilind dibe, lêqewmayî (Kesê bûyerek hatî ser) û barê xemên wî bikûle, bajarê dîrokî yê bîranînên wî pê ava bike. Di bin her şikestineke xwe de tekoşîn kiriye, di her sûcekê de dilopek heramî û bêwefayiyek kirandiyê. Vî welatî weke biheştê binav dike, ji bilî wêraniya gund û bajarên, dersînoriya zarokên wê, darvekirina Pêşewa û rêberên wan... Çi xweşiyek bi xwe ve dîtîye? Ji bo kirandina vê dûkelê, di singê her kurdek û

<sup>85</sup> -Yunîs Rezaîy , *Hêmin Şaîrêk Le Meîdanî Sutan U Hermanda* , Kongire Bizurgdaşt , R789.



her kesek ku mirov be de ye. Hêmin ji wan kesan bû xwediyê van hestane, ev hest di rih û xwîna wî de hatibûn bi cih kirin: <sup>86</sup>

*Ew kesey asûde û xoş ray biward,*

*Qet xemî yexsîr û koyllanî nexward,*

*Yek le mallî çawerêyî bû bêtewe,*

*Derkî nîw malêlî lê bikrêtewe,*

*Xerim rewênek giwê bidate razî ew,*

*Nazenînek bê bikêşê nazî ew,*

*Heybê hêz û gurd û tîn tû gurr,*

*Rojgarî reş nebê, bextî mukur,*

*(Naley Cudayî, R. 15)*

Awayê derbideriya helbestvan bi şeweyê 'Ney' derbas kir. Xemên helbestvan deryayeke û ew bi xwe di nav de deryavanekî westiyayî û çewisandiye:

*Nabê qet nalley cudayî bê eser*

*Ca çi ney bîka çî piyawî derbeder*

*Boye nallem têkellî ney kirdûwe*

*Şîwenêkim pêye, ney neykirdûwe*

*Lêm gerrê ba derbirim sozî derûn*

*Lêm gerrê ba helwerênim eşkî rûn*

*Derdî dûrî derdî dûrî kuştîmî*

*Derdî û şiyarî û sebûrî kuştîmî*

*(Nalley Cudayî, R. 18)*

---

<sup>86</sup> -Reiûf Bêgerd , Çepke Gul Çepkê Nêrgiz , *Hêminî Şaiîr U Mirov* , Pêşekî , R18.

Diyare helbest xem û hestên derûnê mirove, mixabin hemû jiyana wî bi xeman tejtî bû. Lewra bi xwe dibe helbestvanê xem û berhemên wî jî dibin ferhenga wan hestan. Beşt seyem

#### 3.4 Xem û Rondik

Me di rûpelên pêş de giliyê xûrbet û nasoriyên derûnê helbestvanê xwe dît, xem û rijandina rondikên helbestvan ligel nexweştî, êş û azarên gelê xwe û çarenivîsa nîştîmanê xwe hevdigirin. Ango xem awayekî giştî digire nava xwe. Di vê beşê de xem û rondikên helbestvan taybet û kesîne. Di encama bextreştî û bêhêviya di dilê helbestvan de ketin ser hev. Me got penaberî û xerîbî jî hinek caran dibin rewşek wijdanî. Helbestvan hest bi xerîbiyê dike û êşeke kûr di derûniya wî de peyda dibe, bêyî rastî dûrî û derbederiyê bibe. Lewra ev dû corên hemû û taybet di meseleya xem, rondik û xerîbiyê de, hinek caran di helbest û vehûnandiyên helbestvan de derdikevin û mirov nikare di navbera wan de sînorekê destnîşan bike.

Me despêkê hewl da ku bi pênuşê di xema xemên giştî yên helbestvan kesek xirab nîşan bidin, li vir berê xwe bidin aliyê din ê nava xem û rondikên helbestvan, hinek mînakên di vehûnandiyên de destnîşan bikî. Hêmin dil paqij û sade bû, eger miorv temaşe bike bi zelalî ev yek pê ve diyar bû. Xwediyê hestekî nazike û pêşiya karesatan nagire. Bûyer di demaran de kar dîkin.<sup>87</sup> Karesat ji dilê helbestvan dihejêne, derûnê wî ber bi bêhêvîbûnê ve dibe, helbestvan tê terkemirov kirin (tecrît) û dibe koviyê xemên xwe:

*Qet le dinya da nebû bêcge le naxoştî beşim*

*Mat û damaw û peşêw û bêkes û çarereşim*

*Kuştimî û şeş xanî omêdî lemin girtin xerîf*

*More heldawêm û bêhûde be hîway duşemim*

*Nabînî zerde le ser lêwî kesê lem şareda*

*Ger xem û derdî dillî xomyan beserda dabeşim*

*(Tarîk û Rûn, R. 115)*

---

<sup>87</sup> -Muhemed Ferîq Hesên, R14.

Ev vehûnandiya 'Rondikên Geş-Firmêskî Geş' heta gotina dawiyê, ji çend nîgar (nexş) û tabloyên reş ê bêhêvî, bêhnvedana sarî û bêhêviyê pêktê.<sup>88</sup> Dema şev û aramî jê hildigire, hewara xwe digihîne girî û rondikan dibarîne, ji bo kûl û xemên xwe derxîne û derûniya wî aram bibe:

*Kollim hesldestê ew care leberderdim denalênim / Xemên min derdikevin û vê carê ji ber êşan dinalênim*

*Heta awirî dillim dekûjêtewe, esrîn debarênim / Heya awirên dilê min dikûje, rondikan dibarênim*

*Şewane ger nekem ew şîwen û nalîn û giryane / Eger ez bi şevan nekim nalîn û girîn*

*Desûtênê wicûdim agirî em cerge biryane / Wicûdê min dişewite, agirê van cerg birane*

*(Tarîk û Ronî, R. 116)*

Heta jiyana û cîhan ligel wî dibe 'Kavila Xeman' û dixwaze ji vê yekê derbas bibe. Hewara xwe digihîne ewrên asîman û dixwaze vî karî jêre bikin:

*Bim bere nêzîk asoy ciwan û sûr / Min bibe nêzî asoyê ciwan û sûr*

*Necatim bide le kawillî xeman / Min ji kaviîlê xeman rizgar bike*

*(Tarîk û Rûn, R. 118)*

Li hemberî listika cefakariyê jî, deshilata helbestvan her xem û giriye. Dema diqêre, êş ji derûna wî dibare û ji xeman rondikên xwînê dibarin:

*Ezîzîm bo çî torawî le xora?*

*Çi qewmawe? Dillî to bo çî gora?*

*Eto wazû le bîrt kirdim emma*

*Feramoşit nekem şerte le gora*

*Le çawim dê bexor firmêskî xwênîn*

---

<sup>88</sup> -Kakeî Felah , *Le Pena Hecekewe* , Xişkeîek , R-Hawkarî , J246 , 13-12-1974.

*Keçî em gome xwêne helneçora*

*(Tarîk û Rûn, R. 121)*

Rûpelên jiyana xem, rondik û hestê helbestvan bi dewle serê (saye) vê yekê diyar bûye:

*Nîme awallî le goşey bê kesî da xem bebê*

*Çake ew lêreş wefay her mawe, sayey kem nebê*

*Laperey jînim hemûy helldeytewe têyda niye*

*Basî firmêsk û henase û şîwen û matem nebê*

*Şadî carêkî behîwayî nehatote dillim*

*Renge xelwetxaneyî xem şîwênî namehrem nebê*

*(Tarîk û Rûn, R. 132)*

Helbestvan di tenêtiyê de di nava rondik û girêya derûn, şev li ber dibin roj:

*Lenaw awrîng û awinga şewim radebrê bê hemdem*

*Bellê şewgarî tenyayî bebê firmêsk û xem nabî*

*(Tarîk û Rûn, R. 218)*

Hinek caran helbest û hûner dibin ramanê rût û hest û sozên xwedî; ligel cûdahiya fikir û dîtinan jî nabe îtiraf bi vê rastiyê bê kirin ku hest û soz, hêvênê her karekî hûneriye. Ev hest û soz hinek caran ligel Hêmin ewqas çir û girtî dibin ku hûnera wî dibe neynika (awêneya) derûnekî teji xem û bêhêvî. Lewra ew gotina derbarê helbestvan de, raste vehûnandî dibin awêneyê derûnî yên teji şikestin, karesat û derbirîna (gûzarişt, teebîr) li rewşa perîşaniya xwe dike.<sup>89</sup> Di vehûnandiya 'Êvara Payîz' de wêneyê gelek bixem derdikeve:

*Pelle hewrêkî çillkine*

<sup>89</sup> - Fetah Emîrî , *Pîsoz* , Cepkê Gul Cepkê Nêrgiz , R200 .

*Girtî sûçêkî asman*

*Gellawî zerdî darêk werî*

*Ziryan birdî berew neman*

\*\*\*

*Hewa bûlêlle, awlêlle*

*Gull sîs bûwe, gella zerde*

*Tenanet rengî gorawe*

*Em dîwar û dar û berde*

\*\*\*

*Çawim le asman birrî*

*Dilim hêndey dîke gîra*

*Gellêk bîrwerî konim*

*Le pîrr hatnewe bebîra*

\*\*\*

*Ax dîsan debê rabwêrim*

*Ke jûrêkî sar û sirda!*

*Degel azar deste milan bim*

*TA beyan le niwênî şirra*

\*\*\*

*Derrom, detirsim, delerzim*

*Le pelamarî motey şew*

*Dad ledes em dilley bexem!*

*Way le des em çawey bê xew!*

\*\*\*

*Derrin ta ser pêkewe nê*

*Degel zam û derd û êşim*

*Derrom ta şewêkî payîz*

*Min şew nixunî bikêşim*

\*\*\*

*Dûr qaqayekim giwê lê bû*

*Detgut gullem pêwe denê*

*Çon bê êwarey pazîş*

*Ewa heye pêkenê'*

*(Nalley Cudayî, R.31)*

Helbestvan dûr, penaber, derbider, di odeyeke sar, req û nexweş de, pêşîra xwe daniye ser ijniyê (çok) xwe. Roj nîne xemek nebe mêvan û negirî. Ti demê şik nabe girêyên kurr ên derûnî jêre vebin. Nexweşiyên ew ji xewnên kesk û sor bêpar hiştiye. Hemû bîranînên wî tal (tehl) û bi dehan çîrokên diltezîn li ser derûniya wî peyda bûne.<sup>90</sup> Di wê navberê de û li derdorê bi awayekî tekoşîn, aheng û ritmê ji xem, tarîti, tam û dûkelê wergirtiye. Ev yek di kûrahiya dilê helbestvan de tê bihîstin û 'Sazî Nasaz' bi vî awayî behs dike:

*Bilbilî ball şikawî wextî gullim*

*Her şepollan deda dillî le kollim*

*Mûxî bê agirî şewî yeldam*

<sup>90</sup> -Seîid Swan , *Hemîn , Saiîrî Xemu Xawen Helwêst* , Kovara Awêne , J21-22 , 1374 , R18 .

*Çawerêy çarenûsî napeydam*

*Kêllî gorrî şehêdî gumnawim*

*Take darî kirûzê bê awim*

*Defterî şîrî şairî rûtim*

*Şemî ser gorr û darî tabûtim*

*Kunî gîrawî kone şimşalim*

*Xewnî aloz û xatîrey tallim*

*Jîlle moy agirî beyananim*

*Bawkî firmêskim û korrî janim*

*(Nalley Cudayî, R. 40)*

Helbestvan gelek xemgîn dibe, weke mûmê xwe dixwe û nikare fikir û hestên xwe kontrol bike. Ji hebûna xwe jî bi guman dibe:

*Çon detwanim beto billêm min çîm?!*

*Xom gumanim heye ke hem yanîm?!*

*(Nalley Cudayî, R. 41)*

Dorpêçkirina helbestvan dibe hewara bêhêvîbûnê, lewra destgirtî dimîne. Tevî ku hemû carekê ji xewan şiyar dibe, Hêminê hişyar û Hêminê helbestvan ji niqûmbûnê rizgar dike.

*Ewende derde dar û bê peristam ke pêm waye:*

*Le serkêkî temen hellnagirê taze şemêkî tir*

*Gelêkim rojgarî talla û şîrîn rabwar, axo*

*Merg mewda deda bbibînim serdemêkî tir!*

Hêmin ji ber dilnazikî, paqij û bêgerd bû, lê bûyer û karesat, ew werimandiye.  
Niha zengê dilê wî girtiye, bûye cihê xem û karesatan:

*Min çiriyekem hemû sûçî çemenî pîrr kirdbû*

*Êste nay le gerum bêcge le nalley xemgîn*

*Min ke bo dînê goll hêllî sinorim deperand*

*Her le ser heq gutnê rûte kiram xanenişîn*

*Têperê hênde benaxoşî jînî dirêj*

*Xozge sedd xozge bewaney kem û asûde dejîn*

*(Çepkê Gull Çepkê Nêrgiz, R. 102)*

Helbestvan piştî hîqe hîqekek xem û rondikan, wiha têne ziman:

*Piştî bêhnek bi xem û bi rondik, helbestvan wiha dibêje:*

*Bargeyan têkewe pêçaw berrê bûn yaran*

*Ledinê wa betenê paşî ewan min çi bikem?*

*Jîn min êste weke xorî demî zerdeperre*

*Pêma nema tîm û gur û hêz û tewan min çi bikem*

*(Çepkê Gull Çepkê Nêrgiz, R. 104)*

3.5 Şîn û Şîngerî:

Şînim gelek gêrawe, şadîm kem dîwe / Min gelek şînî gêraye, min kêma şadî  
dîtiye

*Xoşî dellên heye, bellam nem dîwe / Dibêjin xweşî heye, lê min ne dîtiye*

*(Tarîk û Rûn, R. 230)*

Hêmin di bîranînên xwe yêna dawiyê de ev çend hevok nivîsandiye:

Mirovim:



Jiyan bi min gelek xweş e:

Bi min xweşe li bajarekî avakirî, li cadeyek pak û paqij, ligel heskiriyên xwe bim. Bi min xweşe li odeyekî germ û gûrr, li ser nivîneke germ pal bidim... Ez dixwazim temaşeyî sema û şahiya nadaran bikim... Ez dixwazim semaya (balle) herî ciwan û opereya herî baş bibînim, senfoniya herî bilind hebe... Ez naxwazim derbider û bêçare bim, li çiya û giran bigerim, li şikeft û niwalan bixizikim, li ser berê hişk birazim, nanê hişk bixwim, ava germ û sûr vexwim. Bi min ne xweşe, xwîn û rondik li ber çavên min bigerin... Lê:

Çi bikim, ez Kurd im

Kole me..<sup>91</sup>

Bi vê rewşê jî Hêmin stranan bi reng, bêhna deşt û çiyayan, kezî û sê benigê keçên Kurdan, bejin û bala di tavê de girtiye. Lê bi xwe gotina Kurdayetî û koletî, tal (tehl) û sûr, evrazî û nişîviyên jiyanê, germ û sariya rojgar (demê) kar kiriye. Her rojê tarmayiyek (Tiştêk bi tirs û neyê dîtin) sor bikeve ber çavan, her kêliyê êşek, qehremanek, pêşewayek û Pêşmergeyek li te bibe xwarina cenawir. Sûtemeniya cîhanek deshilatim, bi vî rengî jiyan dibe têkelawek şadî û xem, xweşî û nexweşî, bi rengê asoya erxewanî rengdar dibe. Helbestvan xemgîne, dengê nalîn û hawarê jê tê:

*Derzî ajin bû dillim le siwêy şehîdanî nemir*

*Bes niye, mewdam biden toskallî teskînim dewê*

*(Paşerok, R. 218)*

Hêmin di govara 'Nîştîman' de wiha dinivîsîne: "Ev helbesta jêr çend dilop û rondikên ku min di şîna şehîdên rêya serxwebûna Kurd de riştine, hemû jî xwîn germ û xwîn sar bi xwendina helbestan, bêyî îxtiyar rondikan dirêjîne. Tif û naletê li vê dadgeha menhuse dike ku tîrêja hêviya Kurdan kuştî û serxwebûna Kurdistanê paşde xistî. Bê sûc û tawan, fermana hilawistina birêz Şêx Ebdûlqadir û hevalên wî da..."<sup>92</sup>

*Diwê şewê giryam heta roj pêt billêm boçî bira*

<sup>91</sup> -Hemin , *Le Kwê Bo Kwê* , Tarik Ê Rûn , R45.

<sup>92</sup> -Hêmin , *Gencîneî Edebiyat* , Kovara Nîstîman , J2 , 1322 , R13

*Mehkemey menhûsî îstiqlal webîrim hatewe*

*Rêzyan bestbû le pêş çawî minagiştî hemû*

*Em şehîdaney ke xinkawin besed awatewe*

*Pak be kifnêkî le xwêna şetil û lêwêkî bebar*

*PAk berengêk û qiyafêkî perryû matewe*

*Hat giwêem lêkra deyangut ême kujrayîn bê xeta*

*Mîletî Kurd ta bekengî tolleman nakatewe....<sup>93</sup>*

Helbest û vehûnandiyên helbestvan, tomara dîroka tekoşîna gelê Kurde.  
Helbestvan bi van çend hevokan, behsa dayîka şehîdên şoreşa Agirî dike.

*Ey daykîş şehîdî Kurdî / Ey dayîka şehîdên Kurdî*

*To weku çiyay Agirî / Tû weke çiyayî Agirî*

*Leber tewjim û baw tofan / Ji ber nexweşî û tofanê*

*Sext û req û bêdagirî / Giran û req û pêdagirî*

*Le ast em dax û derdane / Li asta van dax û derdan*

*Behîmet û xoragirî / Bihewl û berxwedêrî*

*(Paşerok, R. 211)*

*Ey daykî şehîdî Kurdî*

*To weku çiyay Agrî*

*Le ber tewjim û ba tofan*

*Sex û req û bê dagirî*

---

<sup>93</sup> -Çavkaniya Berî , R 21 .

*Le ast em dax û derdane*

*Behîmet û xoragîrî*

*(Paşerok, R. 211)*

Li befranbara 1962, ‘Gêjelûlek be sam û tundî xezan’ pê dike, Mihabada aram û Hêmin dihejîne. Pelçimên çend gulên nazdar ên li bajêr hidiwerîne, taziyekek çêdibe, helbestvan weke berdevkê wî gelî li cihê mirina wan kesan şînê digêre:

*Herweha destî bê bezey teqdîr*

*Nayellê çûk û gewre ciwan û pîr*

*Taze lawan le xwên degewzênê*

*Cergî daykî hejar debirjênê*

*Zebrî tundî zemanî bed kirdar*

*Şarî kirdîne şarî pîrr azar*

*Herçî dey bînî des be ejnoye*

*Le hemû laweşîn û roroye*

*(Tarîk û Rûn, R. 140)*

Dema nûçeya wefata Goranê helbestvan (1914-1962) belav dibe, welatîyên Mûkuryan, tevayî navçeyên Soran, Goran û Botan.. radibin ser xwe. Ji bo vê çirayê digirîn. Hêmin di şîniya Goran de kirasê xemê ji bo hemû şar û gundên Kurdistanê dibire:

*Ca çillon dil bexem nebîn, negrîn*

*Ca çillon korri şîni bo negrîn*

*Şairêkî bû benirx û bê wêne*

*Bîrî roşin bû, çeşnî awêne*

*Şairêk bû be cerg û hellkewtû*

*Pêşrewî gell bû nek legell kewtû*

*Pêşrewî gel bû nek legell kewtû*

*(Tarîk û Rûn, R. 153)*

Li salên 1967-68'an dijmin li herdu aliyên dest bi kuştina azadîxwazên Rojhilatê Kurdistanê dike û bi dehan kesayetiyên şehîd dixê. Mihabadê xwe bi ewrê reş ê şîne girêda, ew herêm dibe şanoya karesata dîroka Kurdan herî diltezîn. "Dayîkên dilşewitî û bêhn sar, li koçe û kolanan rondikên hesretê dibarînin. Bêhna xwînê ji dar û dîwaran dihat. Keyfxweşî li ser lêvên ti kesekê diyar nedibû... Gelek kesan ji ber êş û xeman, mal û jiyana xwe bi cî dihiştin û berê xwe didin Kurdistanê li aliyê din. Yek ji wan jî mamosta Hêmin bû. Pêwîst bû dûrî çavên dijminan, li şîna ciwanên gelê xwe yê hatine kuştin de şîna bibûya... Piştî çend mehan ev helbest tevayî koçe û kolanan bajar û gundan belav bû, ji zarekê derbasî zarekî din bû.<sup>94</sup>

*Bo şehîdêkî ke gewzîwe le nêw xwên degrîm*

*Bo hewallêkî ke çûbê ser û bê şîwên degrîm*

*Bo kurrêkî nebezîwî ke le senger da mird*

*Nek be ser şorrî û bê şermî le ser niwên, degrîm*

*Gencî Kurdî wekû gencîne le herdî xistin*

*Dujminim, takû nezanim hemû le kiwên, degrîm*

*Şore jin ser be qur û gewre kişîş mil bekuyn*

*Ta bimênê serî be qurr û milî bekwîn degrîm*

*Bo wellatêkî be fermêsk û be xwîn dêrabê*

*Min ke seyranî der û deştê dekem, xwên degrîm*

*(Tarîk û Rûn, R. 163)*

---

<sup>94</sup> - Herîs , *Hêmin U Min* , R23 .

Dema helbestvanek helbestekê ji bo Pêşmergeyek, ji bo şehîdekê û ji bo Pêşewayekî rêya azadiyê dinivîsîne, ew helbest ji bo wî Pêşmerge û Pêşewayî di tomarên dîrokê de dibe belge nameyek.<sup>95</sup> Çarçira di fikrê Hêmin de bibû Çil Çira û ma dikarî bi ti awayî paşgûh bixe. Di vehûnandiya 'Şev û Şeytan - Şew û Şeytan' de şîneka mezin a hunermend ji bo Pêşwayê şehîd digire:

*Le dewrûberî Çiwarçira*

*Hezaran ser le qurinra*

*Kam nazdarî şox û ciwane*

*Day lexim likî kolwane*

*Leçawî kîjî mil bekiwên*

*Bexurr dehat firmêskî xwên*

*Şorelaw hate korê şîn*

*Şorrellaw hate korr<sup>^</sup>e şîn*

*Ewîş soranî kirdim şîn*

*Ba termîşî bixrête gil*

*Çon yadî derdeçê le dill?*

(Tarîk û Rûn, R. 182)

Karwanê Xebat, destana qehremanekê ye ku di rêya azadiyê de canê xwe feda kiriye. Xal bi xala vê vehûnandiyê, nexş û tabloyên zincîra vê destanê ya bi serê penûsa hibrê, Hêmin ê xebatkarê heval û hevsengerê wî hatiye nexşandin. Nalîn û giriyeke bîdeng û bêrondin, her wêneyek rastiyeke jiyanê îspat dike. Lewra ya baş ewe mirov navê wê bike, Xinerêja Şehîd, ji ber ku şehadet nameya bêmirinê ye, ne şîngirtinê:

*Dîsan xwênî qaremanêk / Dîsa xwîna qehremanekê*

<sup>95</sup> - Mela Bextiyar , *Le Xizmet Edebda* , Capa1 , Suleîmanî , 1988 , R88 .

*Nexşandî rêgey rizgarî / Nexşandiye rêya rizgarî*

*Dîsan laperêkî reştir / Dîsa rûpelekî reştir*

*Kewte ser mêjûy zordarî / Kete ser dîroka zordarî*

\*\*\*

*Diwa nîgay biryelay aso*

*Bemollleq rawesta çawî*

*Şineba`y şew hat estirî*

*Wek pencey ciwanêk ciwanawî*

*(Tarîk û Rûn, R. 197)*

Li gulana sala 1975'an cezayê darvekirinê li komê ciwanên Kurd hat birîn û piştê hatin şehîd kirin. Pêşenga wan jî şêre jineke keçek rû sûr û nemir a dîroka neteweya me ya bi navê Leyla Qasim bû, Hêmin jî nameyek di salvegera vê de wiha dibêje:

*Hemîşe derd debînim derd debînim*

*Diroy dijmin dehoy namerd dibînim*

*Meger zerdayî naken çawakanim*

*Ke rengî new beharî zerd debînim*

*Be sozey ba keskillî dill geşawe*

*Derûn pir soz û firmêskim xunawe*

*Le diwî leyla be waweyla û şîwen*

*Derrom û pollî şîn gêrim bedwaw...<sup>96</sup>*

---

<sup>96</sup> -Hemin , *Beharî Zerd* , Kovara Sirwe , J1 , 1342 , R89.

Raste dema mirov temaşeyî her dîwaneke helbestan a navçeya Mukiryana bike, mirov dibîne beşek giring şîngeriye. Ev jî rengdana jiyan û rewşa gelê me ye. Ligel vê yekê ev dîtin li ser helbest û berhemên Hêmin jî wiha ye. Lê ligel vê yekê jî di helbestên wî de tenê behsa şîna û şîngiriyê nayê kirin, belkî ew tiştên ew vedigêre ji rastiye hatine wergirtin.<sup>97</sup> Behsa rastiya mirovan a ji bo berxwedan û serkeftinê dike. Di helbesta ‘Rewez Wird Nabê’ de wiha dibêje:

*Zewî êstaş le rût helldê bidey sûrr*

*Ne rûxay asmanî pişt kûrr*

*Ke hallî zarman awa debînin*

*Ke mallî zallman awa debînin*

*Ke cergî kawekanî çak debînin*

*Ke cergî kîjekan pîrr çak debînin*

*Ke korri şîna beharî sûr debînin*

*(Emînî) na emîn meemûr debînin*

*Ke somayî çe çaw bawkan birrawe*

*Berokî pîre daykan da dirrawe*

*Binarî lêj û nahemwarî Hellgord*

*Debînin bote deştî Kerbelay Kurd*

*Benaheq xwênî têkoşer derrêjin*

*Şehîdî bê serûbê şiwên denêjin*

*(Paşerok, R. 206)*

Di baxçeyê helbestvanan de şîna perperûkê timî ji bo mûmê ye, ya bilbilê timî ji bo pijkojê ye; lê şîna Hêmin timî ji bo zarokên şehîd ên gelê xwe ye:

---

<sup>97</sup> -Hûsên Elî Sanuf , R23.

*Em çawaney firmêskyan rişt*

*Bo Kurdêkî dujmin deykuşt*

*Em çawane dagîrsawin*

*Hênd le şîngayan giryawin*

*(Paşerok, R. 203)*

Helbestvan kul û xemên xwe di nava hevokên vehûnandî de nîşan dide û dibêje:

*Min keşîn gêrrî hemû sûre gullî perrperr bûm*

*Renge her dirkî perru lêre bika bo min şîn*

*(Çepkê Gull Çepkê Nêgiz, R. 12)*

Hêmin bi xwe şîngir (Kesê şînê digire) û şopdarê şehîdên nemir bû, lewra naxwaze dema xatir ji vê dinyayê xwest; şîna wî were gêrandin:

*Derzî ajin bû dilim le siwêy şehîdanî nemir*

*Bes niye, mewdam bide, tozkallî teskînim dewê*

*Kîj û kurr bigrin le dewrî gorrî Hêmin reşbellek*

*Min ke şîngêrrî şehîdanim le kuy şînim dewê*

*(Paşerok, R. 220)*

Lewra em dibînin ku defter û dîwanên helbestên Hêmin bûn çavkanî û tomara şîngirî û zindîhiştina şehîdên karwanê azadîxwaza gelê me, ji despêkê heta niha.

Wek mangî cêjin lêyan derwanî

Pêyan helldegut beste u goranî

(Tarîk Û Rûn: 103)

Tişbiye Muçmel .



## ENCAM

Di dawiyê de dikarim pûxteya naveroka teza (behsa) xwe di çend xalên jêr de kom bikim:

1- Di despêka tezê de ji me re zelal bûye ku zanista civakî xwediyê giringiyek mezine, di kîjan demê de û li ser destê kê serî hildabe .

2- Em ghiştin wê encamê ku rewşa civakî bandorek mezin li ser nivîskar heye. Lewra gelek giringî dayeyê û bi berdewamî di xema civakê de ye.

3- Xemxorî û lihewarçûna helbestvan a ji bo daxwazên civakê wê yekê derdixe holê ku helbestvan çend bi gel û neteweya xwe ve girêdaye û kurê neteweya xwe ye.

4- Fikra civakî di berhemê helbestên Hêmin de xwediyê xemilîn û pêşketinekê bû. Di despêkê de bi awayek kevin û texlîdkirina helbestvanên berî xwe destpê kir, piştî qalibên cîhanî dît, bîrdoziya roj û serdemê wergirtiye.

5- Aliyek din ê helbesta siyasî ya Kurdî ligel Hêmin derbirîna fikra civakî di nav de hene. Bi vî karî jî helbestvan corek ji fikra civakî ya nasik û derbirîne pêşkêşî cîhana helbesta nû ya Kurdî kiriye. Ligel Hêmin bûye yek ji rûyê diyar ê helbestên civakî.

6- Diyardeyên civakî yên jiyana civaka Kurdewarî aliyekî din ê rengîn yê mijarên helbest û vehûnandiyên helbestvan pêkaniye ku ji awa û armancên cûr be cûr pêk tê. Ew jî; mijara cotyaran, jinan, hişyarkirina civakê, zanistperwerî, rexne, pendên civakî, aştîxwazî, êş û xemên xerîbî û derbideriyê ....

Helbestvan ji bo diyaxistin û danîna pendên civakî, hewara xwe gihandine çîrokên helbestvan. Ji bo derbirîna hest û soza derûnî ya di warê helbesta dildarî, ciwanî û aramiyê de. Ji ciwanî û mergê şehîdan û heskirina şîngêriyê gotiye. Ji bo aramiya mejî û fênîkiya derûnî, gelek caran helbestên henegî gotiye .

Di dawiyê de pêwîste wê rastiye bêtîn ku Hêmin mirovek realîst, helbestvanek rastbêj û liberçavan bû. Ezmûn û ceribandînen wêjeya xwe ji jiyana û dîrokek teji nexweşi, îşkence û êşên neteweya xwe wergirtiye. Gelek hêvî û baweriya wî bi siberoja gelê wî hebû.



Çavkanî  
Kurdî

- Brus Kuhîn(2010), *Seretaîek Bo Komelnasî*, Wergêr-Hemin Serîf.
- Dr. Marûf Xeznedar, *Karîgerî Bîrî Neteweyî le Geşesendîni Kurte Çîrokî Kurdî*
- Emîrî Hesên Pur(1999), *Jiyan û Be Serhatî Ebdul Rehman Zebîhî*, Capa1.
- Fetah Emîrî, *Pîsoz*, Cepkê Gul Cepkê Nêrgiz.
- Hejar(1988), *Bo Kurdistan*, Çapa Çaremîn, Swêd .
- Hêmin(2014), *Cepke Gul Cepke Nergiz*, Soran.
- Hêmin, *Le Kwê Bo Kwê*, Tarîk û Rûn, Mehabad: Seiidiyan.
- Hêmin(2003), Muhemed Emîn, *Bargeî Yaran– Sercemî Sîrî Hêmin- Nalley Cudayî*, Hewlêr.
- Hêmin(1362), *Sereta Bo Pekenîni Geda, Paşerok, Caoa1*, Caphane Sidiyan.
- Hêriş(1992), *Hêmin U Min*, Çapa Yekem, Swêd.
- Hûsên Elî Sanuf.
- Ibrahîm Ehmed(1996), *Le Bîreweriyekanim*, j13.
- Kerîmî Hisamî(1987), *Yadî Hêmin*, Le Blawkirawekanî(Serdemî Niwê), Swêd.
- Kiwêstanî Cemal Selam(1996), *Srwt Le Sîrî Nwêy Kurdî Da*, Nameî Zanko, Zankoî Selahedîn, Kolejî Adab.
- Ebdûllah Ezîz Xalid(1999), *Kurdistanîraq* (Pêşekî). Çapa Yekem: Çapxaneyaya Zankoy Selahedîn, Hewlêr.
- Mela Bextiyar(1988), *Le Xizmet Edebda*, Capa1, Suleîmanî.
- Menu Çehir Muhsinî(2007), *Komelnasî Giştî*, Bergî Yekem, Terceme, Muslih Erwanî, Çapî Dw, Kurdistan.
- Reiûf Bêgerd, Çepke Gul Cepkê Nêrgiz, *Hêminî Şaiîr û Mirov*.
- Resûl(1985), *Daxistanî Min*, Çapxaneyaya El Hewadis, Bexdad.
- S.C.Herîs, *Rewtî Serheldanî Sîrî Siyasî û Komelaiyetî le Mukiryân*, Beşî Dwem.
- Yunîs Rezaîy, *Hêmin Şaiîrêk le Meîdanî Sutan û Hermanda*, Kongire Bizurgdaşt.

- Yunis Rezayî. *Hêmin Şairêk le Meydanî Sûtan û Herman de*, Kengire Bizirgedaşit.

#### Kovar & Rojname & Înternet

- Burhan Şasiwar, *Hêminî Mehabadî Şaire Nawdarekey Kurdistan*, Rojnameya
- Cemal Nebez(1985), Govara Nîştîman, Navenda Çapemeniya Azad, Swêd.
- Ebdul Rehman Qasim Lo(1974), *Hêmin Saiîrî Gel*, Malperî Giyareng.
- Emîr Hesenspûr(1987), *Nameyek*, Govara Mamostayê Kurd, Hêjmar: 5/4, Zivistana.
- Ezedin Mustefa Resul, *Naweroki Siyasi û Komelayeti Ciroki Kurdi*, G.Karwan, J19. 14- Hêmin, *Erkî Netewayetî Îmroy Şair û Nûserekeman*, Rojnamey Kurdistan, Organî
- Gerdî(1973), *Trajîdiya û Corekanî Trajîkî Cîhan*, Rojî Kurdistan, J5.
- Govara Hellale, Hêjmara 1, Reşeme 1324, Çapxaneya Bokan .
- Govara Kurdistan(6'ê Dîsembere 1964), 15'ê Sermayeza 1324,
- Hawkarî(31.05.1975), Hêjmar: 220.
- Hemin(1342), *Beharî Zerd*, Kovara Sirwe, J1.
- Hêmin(1322), *Gencîneê Edebiyat*, Kovara Nîstîman, J2.
- Hêmin(1977), *Ezmûnî Şairim*, Paşkoy Rojnamey Iraq, Hêjmar10, Bexda.
- Hêriş(: 30.08.2000), *Nameyekî Taybetî*, Swê.
- Hesênî Danîşqer (Hêwir), *Le Yadî Çiwardemîn Salî Koçî Diwayî Hêmênê Şair De*.
- Huner Ê Edeb, Hêjmar:28, 05.06.1997.
- Kakeê Felah(13-12-1974), *Le Pena Hecekewe*, Xişkeêk, R-Hawkarî, J246.
- Kemal Mistefa Marûf, *Siyaset Le Hunrawey Niwê da*, Govara Nûserî Niwê, Gorava.
- Komîtey Navendî Hdk(1974), Desember.
- Mihemed Ferîq Hisên, *Hêmin û Bunî Xerîbî, Beşa Yekemîn*, Govara Beyan, Hêjmar

- Mistefa Merufî(1998), *Yadêk Le Mamosta Hêmin*, Rojnameya Kurdistan, Hêjmar, 258.
- Muhemed Ferîq Hesên(Ab1980), *Hemin U Bonî Xeribî*, Kovara Beiyân, J65.
- Mujteba Berzuyî(1984), *Ewzai Siysê Eran*, Hewler.
- Osman Îbrahîm Ranyeyî, *Yadêk Le Bîrewerî Mamosta Hêmin*, Roj. Birayetî Paşgoy
- Rojnameya Birayetî(21.04.2000), Paşgoya Edeb û Hûner, Hêjmar:173.
- Rojnameya Kurdistan(1946), Hêjmara 20, 8'ê Remeşiyê.
- Seîd Swan(1374), *Hemin, Saiîrî Xemu Xawen Helwêst*, Kovara Awêne, J21-22.
- Seiyd Smaylî Huseînî, *wtw wejî Bilawnekrawe Le Gel Hemin*, G.Gizing,J23 Siwêd.
- Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Liqê Hewlêr,Hêjmara 2:Adara 1998.

#### Biyanî

- Adurnw Tenudurw Digiran, *Der Amedî Ber Camîie Sunasê Edebiyat*, We-Mehemed Ceifer Puînde, Tehran-1377, Neqîş Cîhan.
- Alexandder, *Victorîa Cl, Socîology of Arts*. Crane, Dîana1992, The Production Of Cuit,2003.
- Binton, *Felsefe Ilum Ictimaiy-* Biniyadhaî Felsefî Tefekîr Ictmai, We-Sehnaz Musema Perist, Mehmed Mutehid, Tehran, 1384.
- Dîwanî Sîv El-Qidat, *Girdewkoyî, Qazî Ehmedî*.
- Elî Ekber Turabî(1384), *Camia Şnasê û Edebiyat, Şair Nu, Hunerîder Peywend Batekamil Ectimaî*, Tebrêz.
- Elî Ekberturabî(1341),*Camia Şnasê û Heyat Ectimaî Ensan*, Nesir Danişkedey Edebiyat Tewrêz.
- Firaw(1388), Eblahan Zima: *Siîr Dir Trajedyaya Wilyam Şekspîr*, Werger: Helen Ewliya Niya, Esfehan: Firda.
- Fray, Nurtrup(1945 (1324 Hicrî).), *Tehlîl Neqil*, Tercume, Salih His3enî, Tehran: Nîlofer, 1377.
- Hejar, *Allekok*, Çapxaney Tewrêz.
- Kondra(1380), *Cehalet*, Werger, Ariş Hicarî, Tehran: Karwan, Mîlan.

Mehabad.

- Parkîns(1375), *Lukaç û Camie Şanasî Edebiyat*, Werger: Hale Lacurdî, Fisiiname-Erxinun, Jimare: 9-10.
- Parkînsun(1375), *Fesilnameya Erxinûn*, Werger: Hale Lacurdî, Locak û Camie Şinasî Edebiyat, Jimare 9 û 20, Cî.
- Ramîn Elî(1389), *Mubaî Camîe Şûnasî Hinir*, Capa Didw, Entişarat Niya, Tehran.
- Riterz Corc(1377), *Nezeriye Hay Camîe Sunasî Der Dewran Muasir (Ba Efzwden Dw Fesil Saze ) We-Muhsin Silasî*, Entisarar Elmî Danisgahî, Tehran.
- Semîsa, Sîrûs, *Sebik Şunasî Esir*, Capî Hewtem– Enyişarat Firdews, Tehran, 1376.
- Şêx Xezelî, Hejar, *Allekok*, Çapxaneyaya Tewrêz, 1945 1324'ê Hicrî.
- Unis Dîlin(1386) *Ferhenga Miqedemat Îstilahat Riwangawîlakanî*, Werger:Mehdî Parsa û Mehdî Refîee, Tehran: Gam Nû.